


berbang

Kovara Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê



**Adresên komelên endam yên
Federasyona Komelên Kurdistanê Li Swêdê**

-
- 1- Komela Kurd li Östersundê.**
Box: 7059
831 07 Östersund
- 2- Komela Kurd li Alftayê.**
c/o N. Haco
Parersv. 15 A
564 01 Alfta
- 3- Komela Kurd li Salayê.**
c/o Amed Serdan
Johannesberg. 1, 2tr.
- 4- Komela Kurdistan li Uppsalayê.**
Box: 250 28
750 25 Uppsala
- 5- Komela Kurd li Sandvikenê.**
c/o B. Batte
Konsulg. 14 K
811 33 Sandviken
- 6- Komela Kurd li Lindesberg:**
Köpmang.10
711 00 Lindesberg
- 7- Komela kurd li Västeråsê.**
Box: 1369
720 13 Västerås
- 8- Komela kulturî li Örebroyê.**
Box: 537
701 50 Örebro
- 9- Komela Kurd li Eskilstunayê.**
Box: 595
633 53 Eskilstuna
- 10- Komela Kulturî Kurd li Katrineholmê.**
Nyhemsgatan 40
640 51 Katrineholm.
- 11- Komela Kurd li Norrköpingê:**
Torsg. 19
603 63 Norrköping
- 12- Komela Kulturî Kurdistan li Göteborgê**
Box: 2263
403 14 Göteborg
- 13- Komela Kulturî Kurd li Trollhättanê**
Box: 6043
461 06 Trollhättan
- 14- Komela Kultura Kurd li Falköpingê**
Box: 227
512 02 Falköping
- 15- Komela Kurd li Linköpingê:**
Hospitalgr. 3
584 27 Linköping
- 16- Komela Kurd li Jönköpingê.**
c/o Bibani Juma
Tornfalksg. 12
552 69 Jönköping
- 17- Komela Kurd li Başûra Swêdê**
Box: 2114
220 02 Lund
- 18- Komela Kurd li Umeåyê.**
Box: 2116
900 02 Umeå
- 19- Komela Kurd li Sundsvallê.**
c/o F. Nozhadzade
Söndagsv. 198
86300 Sundsbruk
- 20- Komela kulturî kurdistan li Hudiksvälê.**
Stormyrav.13
824 00 Hudiksvall
- 21- Komela Kurd li Bollnasê.**
Box: 320
821 01 Bollnäs
- 22- Komela Kurd li Söderhamnê.**
c/o Tayfor Patai
Tallv. 24 C
826 00 Söderhamn
- 23- Komela Kurdistan li Spångayê.**
Box: 4118
163 04 Spånga
- 24- Komela Demokrat a Jinên Kurd.**
Box: 4033
163 04 Spånga
- 25- Komela Huddingeyê.**
Box: 4088
141 04 Huddinge
- 26- Komela Kurdî li Upplandsväsby.**
Box: 129
194 22 Upplandsväsby
- 27- Komela Kulturî Kurd li Järfällayê.**
Box: 2016
175 02 Järfälla
- 28- Komela Stockholmê.**
Box: 45 205
104 30 Stockholm
- 29- Komela Botkyrkayê.**
Box: 3038
145 03 Norsborg
- 30- Komela Kulturî Kurd li Nynäshamn.**
c/o A. Kakamami
Odinsv. 5B
149 33 Nyneshamn
- Yekîtiya Ciwanên Kurd Li Swêdê**
Box: 45 205
104 30 Stockholm

BERBANG

Organ för Kurdiska Riksförbundet
Organa Federasyona Komelên Kurdistanê
li Swêdê

Ansvarigutgivare/Berpirsiyar
N. Kirîv

Redaktion/Redaksiyon
A. Tigrîs, Aso Germîyanî, Cemşîd
Heyderî, L. Cengîn, Hesenê Metê,
Mahfûz Mayî, M. Alî K., Rohat,
Temo Zêrîn

Amadekarê beşê zazakî
H. Diljen

Sättning och Layout
Bavê Rojbîn, C. Heyderî, N. Kirîv

Adress:
Box 45 205
104 30 Stockholm/Sweden

Telefon: 08/668 60 60

Postgiro: 64 38 80-8

Abonett/Prenumeration
Kes/Enskilda: 100 Skr/sal/år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr/år

Îlan/Anonns
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr

Redaksiyon ne berpirsiyara nivîsarên
bi îtme an nivîs û gotinên Federasyo-
nê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên
şandin, heke çap ji nebin, li xwedî
nayên vegerandin.

ISSN - 0281-5699
Sal: 9, Hejmar 4/90 (65)
Tîrmeh 1990

APEC-TRYCK & FÖRLAG

NAVEROK

Beşa kurdîya jorê	Rûpel
Pirsa pirsan, N. Kirîv	5
Di pirsan kurdî de xelesa zêf: Turkîye, M. Kîper	6
Îsmail Beşikçi: Divê Kurd bi çavên kurdî li dîrokê û li bûyeran binerin	8
Dîtin û bîranînên gerokên swedî li ser Kurdan, ROHAT	13
Pêşdeçîna ziman û rewşa weşanên kurdî li Ewropayê, Reşo Zilan	18
Axawûkê Bêdarî, Ebdulreşîb Yusif	22
Dilop (kurtçîrok), M. Alî K.	24
Çewt nivîsandina navên hinek rêxistin û weşanên Kurdan, Amed Tigrîs ..	25
Filimeke kurdî -Aso, Amed Tigrîs	26
Weşanên nû	26
Beşa dimilî (zazakî)	
Rojê ewroyênî rojê îmtihandê dosteyê, H. Diljen	27
Mintiqaada Uppsala di komîtîyê paştgirotenda Kurdan ame ronayeni, Koya Berz	29
Xezal (Şîr), Hemedê Mamekiz	30
Semînerî	30
Beşa kurdîya jêrê	
Kotayî (helbest), Ferhad Pîrbal	31
Rêgay heq, Reza Elewî	34
Nameyelêm (helbest), Bahaddîn Nûrî	35
Rengale (çîrok bo mindalan), Kakabaz	37
Du keçî Kurd û madalyay zêr, Hîwa Zendî	40
Şerekî pîs le Kurdistan da	42
Çawketinek le gel Prof. Sven Tiberg	45
Axîrzman, C. Kurdo	48
Perestroyka û Gelî Kurd, ji semînera Dr. Celîlê Celîl	53
Salek be ser şehîdkirdinî Dr. Qasemlou	55

Rastkirin

Xwendevanên hêja!

Hejmara 64'an ya Berbangê, bi çend şaşiyên ciddî gihîştibû destê we. Şaşiyên ku divê bîr rastkirin li jêr in.

Em hêvîdar in ku hûn dê li me biborin.

* Di rûpela 12'an de, navê nivîskar ya nivîsara "Çima tevgera serbixwe ya jinan pêwîst e?" bi şaşî Şermîn Hêvîdar hatiye nivîsin. Nivîsar, ya T. Berçem e.

* Di rûpela 15'an de, di serdêrê (navê nivîsarê) duyem de paşnavê Îsmail Beşikçi, bi şaşî Çeşîkçi hatiye nivîsin.

* Di rûpela 25'an de, rêza dawî ya çîroka bi navê "Li Kababxanê" ji rûpelê ketiye. Ew rêza ku diviyabû neketa ev e:

"...lê di wexta me de tiştê ha dibûn."

* Di rûpela 26'an de, serdêr û çend gotinên paragrafa 7'an jê çûne.

Serdêrê(navê) nivîsar: FRANZ KAFKA ye.

Rêzên paragrafa jêçûyîjî evin: "... Bi dû çend rojên ku di navberê re dibuhurin, rojê K gazî dadgehê dîkin. Dema K dibîne ku dadgeh li qada şeşan ya avhiyeke bikirê de ye behî dimîne. Hundirê odê ji mirovan tijî ye... wexta K li hember dadpîrs axaftina xwe ya parastinê dike, hemî mirovên di hundir de dikenin û jê re li çepikan dixin..."

XELATA BERBANGÊ

Ji bo çîrok û helbestên kurdî

Berbang, kovara Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê, pêşbirkeke ji bo çîrok û helbestên kurdî (ji hemû zaravan) li dar dixê û wê ji îsal pêve ji bo çîrok û helbestên kurdî xelat belav bike.

- * Navê xelatê, XELATA BERBANGÊ ye.
- * Hemû kurd, ên li welêt û li dervayî welêt, dikarin beşdarî vê pêşbirkê bikin.
- * Ji bo Xelata Berbangê, ji hemû zaravên kurdî, çîrok û helbestên yekem wê bên hilbijartin. Qîmeta xelatê ji bo çîrok û helbestên yekem 5000 kronê swêdî ye.
- * Hemû çîrok û helbestên heja wê wekî pirtûkekê bên weşandin.
- * Hevalên ku dixwazin di vê pêşbirkê de beşdar bibin, divê berhemên xwe heta roja 31.10.1990'î bigihînin adresa Berbangê. Berhemên ku dereng bigihê adresa Berbangê, beşdarî pêşbirkê nabin. (Ji bo tesbîtkirina tarîxa hatinê, mora postê muteber e).

Şertên (mercên) Beşdarbûnê:

- 1- Endamên juriyê nikarin beşdarî pêşbirkê (musabaqê) bibin.
- 2- Berhemên beşdar divê li tu derf nehatibin weşandin.
- 3- Şair an nivîskar divê di binê berhema xwe de navê xwe î rastîn nenivîsîne, li şûnê divê NASNAVEK binivîsîne. Bo nimûne: Şûna Mehmet Uzun, divê nasnavek wekî "Rûgeş" bête nivîsandin. Navê rastî tevî navnîşana nivîskar di zerfêke devgirtî de û li ser zerfê tenê NASNAV nivîsandî be. Ev zerfa devgirtî û Berhema nivîskar di nav zerfêke din de, divê li ser navnîşana jêrîn bête şandin.
Navnîşana Şandinê:
Xelata Berbangê
Box: 45 205
104 30 Stockholm/Sweden
- 4- Berhem li xwedî nayên veşandin.
- 5- Berhemên şandî, divê bi daqtlîlo an ji bi destxetêke wisa be ku herkes di xwendina wê de bikaribe têbighê. Berhemên şandî yê ku neyete xwendin, beşdarî musabaqê nabin.
- 6- Çîrok divê zêdetirîn 30 rûpelê daqtlîloyê (A4) bigre.
- 7- Herkes dikare hem ji bo beşê çîrok û hem ji bo beşê helbestan berhemeşî bişîne.
- 8- Xelata Musabaqê wê di roja 26.01.1991'ê de, bi şahî bê belavkirin.

Navên endamên Juriya Musabaqê:

1-Şerko Bêkes, 2-Hema Said Hesên, 3-Cemşîd Heyderî,
4-Rojen Barnas, 5-Mehmet Uzun, 6-Mahfûz Mayî
7-Malmîsanîj, 8-Mustafa Duzgun

KURSA TÎYOTROYÊ


Li Skinnskatteberg Folkhögskolan kursa Tiyatroyê ya Termîna payîzê roja 3 septembar 1990'î dest pê dike.

5-6 Kurdên ku bi zimanê sêwêdî û kurdî baş dizanin, dikarin beşdarî vê kursê bibin û deynê xwendinê (studimedel) bigrin. Kesên ku bixazin divê heta roja 15'ê Agustosê muracata xwe bişînin xwendegehê:

Ji bo pirs û agahdariyên zêde hûn dikarin ji telefonên jêrîn bipirsin.

Tel: (Roj) Steve Claeson 0222-10498

Tel: (Êvar) Saîd Kadîr 08-761 89 45



PIRSA PIRSAN

«Ku meriv bi xwe li dora xwe nezivire, dîn (ol) weke royêke sexte li dora meriv dizivire». Karl Marx

Her çiqas gotina jorîn ya ramanwerê hêja Karl Marx, li ser dîn hatibe gotin jî, ne tenê ji bo dîn, herweha ji bo baweriyên dogmatîk û îdelojîyan jî derbas dibe. Ji xwe bawerî, an teorîyên dogmatîk, an jî bi tevayî ramanên îdelojîk, ji aliyê karakterên xwe ve, ji dîn ne cûda ne.

Ez dizanim ku wekî do, îro jî gelek kesên ji me roleke pozîtîf didin îdelojîyê. Heta îro, îdelojî ji bo gelek ronakbîrên me di serê her tiştî de bû û hê jî di hemû platformên civakî û siyasî de, bingeha her tiştî ye.. Di pirsra yekîtîyê de jî, îdelojî bi serê xwe rola mestîrîn dilîze û li ber yekîtîya giştî bûye astengek. Di derheqê meselekê de ramanên cuda, bi «cîhêtiya îdelojîk» nav dibe û tesîreke sereke li ser danûsitendina ronakbîr û siyasetkaran dihêle. Hê jî «yekîtîya îdelojîk» şertê pêşîn ya yekîtîyê ye. Pîrî caran ji ber vê, hevkarîya ronakbîr û rêxistinên me pêk nayê. Dema «cîhêtiya îdelojîk» hebe, tew li ser yekîtî û hevkarîyê nabe munaqeshe çêbe.

Di derheqê tabîra «îdelojî»yê de dîtînen cuda hene. Hinek kes ji hemû teorî û ramanên civakî-cihanî re û hin kes jî ji ramanên ne ilmî yên ku li gor sistemeke ramanî tînan afirandin re, îdelojî dibêjin. Bi ya Karl Marx zanîna ne ilmî, îdelojî ye. Engels ku heval û hevkarê Marx bû, «hemû îdelojî, her yek bi serê xwe pêxapînekek (illusion) e» dibêje. Her çiqas Marx nexwestiye, dîn an îdelojîyêke nû biafirîne jî, lê dîsa, seyr e ku ramanên Marx ji aliyê hevalbendên wî, bûye «Marxîzm» an bi gotîneke dîn «îdelojîya ilmî».

Mîrov bi du rêyan raman diafirîne. Yek ji wan rêyan ew e ku mîrov li gor sistemeke ramanî (ku ew bi xwe jî îdelojî ye) li ser tiştan raman, bawerî, prensîp, teorî û dîtînen îdelojîk diafirîne. Ji bo afirandina ramanên îdelojîk, ne pêwîst e ku meriv xebateke maddî bike. Tenê pêwîst e ku mîrov serê xwe pê biêşîne. Ku mîrov serê xwe pê êşand, dikare ser piştê jî dirêj be û tiştan li gor sistemekê îzah bike û ramanan biafirîne. Rêya din jî ew e ku mîrov bi rê û metodên xas nêzî tiştêkî dibe, wî tiştî nas dike, têdigihê û bi awakî «ilmî» îfade dike. Ango wekî ku mîrov li labarotuarê li ser maddeyekî kîmyayî bixebite, lê dikole, nas dike û wisa îzah dike.

Li gor van her du rêyên afirandina ramanan, pêwendîyên raman û mîrov jî bi du awayan e. Awayek ew e ku mîrov bawerîya xwe bi ramanên îdelojîk tîne û herweha bawerî jî li mîrov hukum dike. Trajediya biyanbûna mîrov (aleination) ji vir dest pê dike. Lê bi ya din, mîrov bi şik e, her çavdêriya ramanên xwe dike û bi xwe li wan hukum dike. Ev noxe, pîrseke bingehîn ya azadiya (rizgariya) mîrov e...

Bi bawerîya îdelojîk, sosyalîstên cihanê gihiştin kûderê? Sosyalîzmên bê demokarasî û bê mafên mirovî, welatên paştamayî û bi krîzên aborî, civakên bi armanca wendabûyî

bûne rastîyên «reel».

Ew armanca «rizgariya mirov ji her cure nemirovatîyê» ku Marx bi dû ketibû, di destê tacîrên cihanê de bû xurtîrîn sîleh. Sîyasetkarên durû ên kapîtalîst ne bi şerên germ, lê bi vî sîleha xurt karîbûn li xwedîyê sîlehê xî. Loma bi awakî durû ew bûn «parêzgerê mafên mirovî» û «demokrasîyê». Ji ber çî? Bi ya min, şaşîyên «Marxîstan» fersend dan wan. «Markîst» bi destê xwe û di destpêkê de, xwe ji armanca xwe dûr xistin. Şûna ku armanca xwe bikin pusula, yek ji wan şertên bicîhanîna armancê ji xwe re kirin pusula. Û bi vî awayê hiştin ku armanca wan bibe qurbana tiştêkî (ser qisê teorîyêke) wan.

Îro, ji ber guhertînen ku li welatên sosyalîst qewimîne, rê li ber me vebûye ku em tesîra îdelojîyê bişkênin. Lê bi şertekî; divê em hişazad bin. Me tu îdelojîyek navê, ji ber ku me armancek pîroz heye. Em wê bibînin-nebînin, ji bo her kesî ku jiyaye, diji û wê bijî, armanca «civakeke bi jiyana mirovane» heye. Û tenê ew armanc, ta îro, bi tevayî li ser dîroka mirovatîyê şopa xwe hiştiye. Îro jî, sibê jî, ta li ser rûyê erdê mirov bijîn, «jiyaneke mirovane» dê her pîrozîrîn armanc be. Loma me dîn û îman navê. Me, tenê di rêya bicîhanîna vî armanca pîroz de, ji bo çareserkirina probleman, nasîn û têgihîştina wan divê û ya girîng yekîtî û xebat divê.

Ev çend salên dawîn li Ewrûpayê li ser pirsra Kurd, konferans, civîn û platform li dar dikevin. Rêxistinên me, ronakbîr û nûnerên welatê me yên ser bi rêxistinên siyasî û yên serbixwe, beşdarî van konferansan dibin. Pîraniya wan di van platformên navnetewî de, pirsra Kurd bi awayekî çewt îfade dikin û dibêjin «pîrsra Kurd ne pîrsra mafên mirovî ye, lê pîrseke siyasî ye. Herweha pîrsra Kurd bi metodên siyasî çareser dibe». Mîrov dixwaze li vir yekser ji wan bipirse; Yanê çî? Kî ji vî çî fam dike? Kes nizane ku em di civînên weha de çî dixwazin.

Herçî siyaset be, di civînên weha de beşdarbûna nûnerên gelê me bi xwe siyaset e. Munaqaşekirina pîrsra kurdî, xuyakirina pêşniyaz û daxwazên gelê me bi xwe siyaset e. Wê çaxê çî mana heye ku em bêjin pîrsra me siyasî ye, eger kes nizanibe derdê me çî ye? Çima em dê rê bidin ku psîkolojî û perspektîfa li ser pîrsra «mafên mirovî» yên ku ji aliyê «hukumdarên dinê» hatine afirandin, li me tesîr bikin û em «pîrsra mafên mirovî» piçûk bibînin?

Û pîrsra pîrsan: Ku em bi metodên siyasî, şerê çekdarî jî tê de, welatê xwe rizgar bikin û tew li ser erdê wî, Kurdîstaneke azad, yekbûyî, demokratîk û sosyalîst jî ava bikin, ma ew dê ne ji bo jiyaneke bi «mafên mirovayetiye» be?

N. Kiriv

DI PIRSA KURDÎ DE XELEKA ZEÎF: TURKÎYE

M. Kîper

Li Ewrûpê di van salên dawîn de, li ser Kurdan gelek civîn û konferans pêk tên. Welê xuya dike ku konferans wê hîn jî dom bikin. Ev jî nîşan dide ku gelê Kurd xwedîyê gelek dost, heval û dilxwazan e.

Dema ku Kurd bi organîze û xwedîyên plan û programekê bin, wê bikaribin gavên gelek muhim bavêjin. Ew wê di hemû civîn û konferansên navnetewî de bibin fonksiyoner. Lê pir mixabin heta îro Kurd di van civîn û konferansên navnetewî de pîrî caran bi tenê mêvan in. Fenomenek gelek ecêb; xwedîyê malê dibe mêvan, mêvan jî dibe xwedîyê malê. Paşê jî Kurd gilî û gazincan dikin û dibêjin; "Tevgera Kurd li derve ma, an jî li derve hiştin".

Divê tevgera Kurd ji çar parçan, li ser rewşa xwe, gelek dûr û dirêj bifikirre, xebata xwe ya derveyî welêt carek din ji nuh ve analîz bike.

Ji ber sedemên gelek eşkere, tevgera Kurd ji çar parça, nikare xebat û hêza xwe ya li hundirê welêt bike yek. Meriv dikare vê realîte fêhm bike. Lê, li derveyî welêt çi asteng, an jî sedem hene ku tevgera Kurd nikaribe di nav xwe de xebateke bi koordîne pêkbîne û bimeşîne?

Helbet asteng gelek û bê hejmar in. Meriv dikare gelek sedeman nîşan bi-

de, lê ez dibêjim, êdî bes e. Menfaeta gelê Kurd li ser hemî tiştan e. Ji bo vê daxwaza pîroz; divê hemû hêz û welatperwerên Kurd, hemû hêzên "rast" û "çep" ên Kurd, xebata xwe bi koordîne bimeşînin.

Divê ji van konferansan hinek netice bînin derxistin. Her konferans û civîn ne ku tekararê hevûdu bin, lê divê yek ji ya din pêşdetir be. Her konferans ne ku bibe konferansa grubek siyasî ya Kurdan. Divê konferansek bibe konferansa netewê Kurd. Ji bo vê jî divê hemû hêzên Kurd bi hev re konferansekê pêkbînin. Kurdîstana ku bê avakirin, wê ne ya hinek grûban be. Ew dê bibe welatê gelê Kurd. Ji ber vê rastîyê jî, divê hemû hêzên Kurd alîkarê hev bin.

Di van salên dawîn de, li dinê gelek bûyerên bingehîn pêk hatin. Sîstemên aborî û siyasî diguherin, yê jî hev dûr nêzî hev dibin û hinek jiwan dibin yek. Weha xuya dike ku Ewrûpayê "nuh" wê ava bibe. Pakta Varşova hatiye qonaxa belavbûnê û rola ku pakta NATO'yê jî heta niha dilîst, wê bê guhertin. NATO rol û fonksiyoneke nuh wê di avakirina Ewrûpayê de bilîze. Piştî ku di nav her du paktên eskerî û sîstema wan a aborî, siyasî û civakî de guhertin pêk hatin, hemû welat danustendin û têkiliyê xwe jî bi çavek nuh

ve analîz û tesbît dikin, hûmên nuh davêjin. Di vê qonaxê de gelek problemên nuh tên munaqesekirin û ji bo çareserkirina wan problema riyên nuh vedibin.

Di nav vê tevlihevîyê de, "Konferansa Ewlehî û Hevkariya Ewrûpayê (KEHE) di 5'ê meha hezîranê de li paytexta Danîmarkayê civiya. Ji bo vê civînê, wezîrê derwayî û komîsyonên 35 welatan hatin ba hev. Konferans heta 29'ê meha hezîranê dom dike.

Yek ji wan welatên ku di konferansa Danîmarkê de beşdar dibe, Turkiye ye. Di konferansê de 33 welatên Ewrûpayê, Kanada û DYA (USA) jî temsîl dibe.

Problemên ku di Konferansa Ewlehî û Hevkariya Ewrûpayê" de bînin munaqesekirin ev in:

- Li Ewrûpayê menfaetên mirovatîyê yê esasî

- Li Ewrûpayê mafên eqelîyet û karkerên penaber.

Konferansa îsal dewama konferansa par ya li Parisê ye. Di konferansa par de piştî gelek munaqesên, li ser çar welatan, Turkiye, Sovyet, Bulgaristan û Romanya biryar hatibûn stendin.

Wekî ku tê zanîn bêyî Turkiyê, di her sê welatên din de gelek bûyer û guherandin çêbûn. Turkiye jî konferansa par bi awayekî gelek hêsan xelas bû. Lê îsal bala gelek dewletan li ser Turkiyê ye.

Turkiye xwe welatek Ewrûpî dihesibîne, ji bo wê jî beşdarî gelek civîn û konferansên navnetewî dibe. Li bin gelek peymanên navnetewî îmzê serokwezîrê Turkiyê heye. Dema ku Turkiye dixwaze xwe bi Ewrûpayê re girê de, divê hemû normên li Ewrûpayê derbas dibin, qebûl bike. Turkiye daxwaz dike ku bibe endama Hevkariya Ewrûpayê (EG). Turkiye endama Konyaya Ewrûpayê ye. Di van platforman de Turkiye gelek vatîni girtiye ser xwe.

Ji ber ku Turkiye gelek peymanên navnetewî qebûl û îmza kirine, Turkiye gelek vatîni jî bi van peymanan qebûl kiriye. Eger bi tenê hurmeta Turkiye ji van peymanan re hebûya, wê hinek maf jî biketa destên Kurdan.

Divê di vê nuqtê de, em zorê bidin Turkiyê ku ew şertên peymanên ku îmeze kirine bi cih bîne.

Berî ku konferansa Danîmarkayê dest pê bike, li rojnamên Turkiyê û di nav partiyê siyasî de li ser konferansê gelek dûr û dirêj hat sekinandin. Gelek tişt hatin gotin. Lê bûyer û hedîse careke din nîşan dan ku, bi qasî ku Turkiye di van civînên navnetewî de hesabê Kurdan dike, Kurd hewqas ne bi tedarîk û xwedî plan û program in.

Serokê Partiya Sosyal Demokrat a Gelfî (SHP) Erdal İnönü, li ser mafên mirovatî û demokrasîyê rexne li hukûmeta Partiya Nîştîman (ANAP) digre û dibêje: "Dema li însana dinêrî, ne xuya ye ku kî Kurd e û kî Tirk e. Li Turkiyê problemên eqelîyeta Kurd tune."

Serokê delegasyona Tirk, Îlker Türkmen ku di dema cunta leşkerî de wezîrê derva bû, dibêje: "Li Turkiyê eqelîyetên ku bi peyman navnetewî hatine naskirin hene, wekî din problemeke weha li Turkiyê tune."

Ez bawer nakim, ku kesekî tiştê nû ji van siyasîkarên kevneperest yê Turkiyê dipa. Lê dunya-alem jî dizane ku rastiya Turkiyê ne weha ye.

Wek min li jor jî qal kir, Turkiye di vê meselê de bê argument e, nikare xwe bi serbilindî biparêze.

Di vî warî de gelek vatîni dîkevin ser milê tevgera gelê Kurd.

Ew 35 welatên ku li Danîmarkayê civiyane, di nav wan welatan bi xwe de gelek ronakbîr, nivîskar, hêzên tevgera Kurd, karker û xwendevanên Kurd dijîn. Eger xebata rizgariya gelê Kurd bi koordîne bibûya, di van welatan de gelek bûyer û xebatên hêja wê bihatana kirin. Bi hemû wezîrê derva yê van welatan re wê civîn bihata çekirin. Agahdarî û înfomasyonên gelek bi qiymet wê bigihîştana delegasyonên van 35 welatan.

Delegasyona Turkiyê, wezîrê derva yê Turkiyê Ali Bozer ê nikaribûya hewqas bi hêsanî mesela Kurd li Turkiyê inkar bikira.

Divê hemû Kurdê welatperwer jî vê bûyerê netîceyekê derxin: Di xebata

me de şaşîyek heye. Em futbolê di seha xwe de dilizîn. Em xwe bi xwe li ser pirsra Kurdî diaxifin û guhdarî dikin. Li vir guhertinek pêwîst e.

Wekî ku tê behskirin li Ewrûpayê nîv mîlyon Kurd dijîn, lê min nebihistîye ku îro li Danîmarkayê, li kuçe û kolanên Danîmarkayê 500 Kurd bi hev re meşek pêk anîye.

Hema bi tenê li Skandînavyayê 30 hezar Kurd dijîn. Bi kêmasî divê me bikaribûya 5 hezar Kurd li ber xaniyê ku tê de konferans pêk dihat, bicivanda. Divê me bikaribûya bi hezaran belavok belav bikira. Lê pir mixabin ez ditirsim gelek kurd ew civîn qet nebihîstibin jî.

Roj ew roj bû ku diviyabû me di xelesa lawaz (zeif) de li Turkiyê bixista û Turkiye li Ewrûpayê rûreş bikira. Çawa ku par Turkiyê daxwaz ji Bulgarîstanê dikir, me jî wê ji Turkiyê bikira.

Tevgera Kurd bi vê rewşa xwe ya îro ve, nikare fîrsetên dîrokî, bi awakî pozîtîf ji bo gelê Kurd bi kar bîne.

Di têkoşîna rizgariya gelan de ne tenê dînamîkên hundir, her weha yê der jî gelek rolên mezin dilizîn. Dema ku bi hezaran şoreşger û welatperwerên Kurd di bin îşkence, zor û zîlmê de têkoşîn didin û didomînin, divê li derve jî Kurd bêdeng nemînin. Alîkarî û piştgirîya gelên Ewrûpayê, alîkariya hêzên demokrat û humanîstan bistînin.

Ji bo vê jî şertek pêwîst e: Tevgera Kurd xebata xwe ya derve, bi koordîne bike. Gelê Kurd jî alî têkoşînê de ji kesî paşdetir nîne. Dema ku em bala xwe didin têkoşîna ANC li Afrîka Başûr, an jî Filistînî û organîsazyona wan PLO, em dibînin ku ew çawa bi koordîne û yekdengî xebatên siyasî û dîplomatîk li Ewrûpayê û li platformên navnetewî dimeşînin û çawa hovîti û durûtîya dijîmin bi kar tînin. Lê wexta ku em bala xwe didin rewşa Kurdan, tabloyek gelek xirab tê ber çavan; kes guhdariya kesî nake, tu dibêjî qey her hêzeke Kurd dike Kurdîstanek jî bo xwe ava bike!

Divê Kurd munaqêşe û pêşniyarên ku di platformên navnetewî de tên kirin, ji gelek nêzik taqîb bikin, hazîrî û

polîtîka xwe tesbît bikin.

Di konferansa Danîmarkayê de, wezîrê derveyî yê Sovyetê Edward Shvardnadze di axaftina xwe de ji bo eqalîyetên Ewrûpayê konferanseke taybetî pêşniyar kir. Ev pêşniyar ku bête qebûl kirin, divê Kurd bi tevayî li Ewrûpayê û bi taybetî li paytextên welatên Ewrûpayê wekî mojleyan (kurmari) bixebitin ku pirsra Kurd di konferansê de bêt munaqêşekirin. Ez ditirsim ku gelek Kurd bibêjin: "Kurd ne eqelîyet in, em konferanseke weha boykot bikin". Helbet pirsra "Kurd eqelîyetek in an jî neteweyek in?" gelek muhîme ji bo me Kurdan. Lê di konferansek navnetewî de, ji aliyê dewletan ve munaqêşa pirsra kurdî gelek muhîm e.

Di vê çarçewê de pênc dewlet, Avusturya, Macarîstan, Çekoslovakya, Îtalya û Yugoslavya bi hev re pêşniyar anîn û gotin ku divê hemû mafên eqelîyetan bînan nasîn û parastin, divê li derên ku eqelîyet di piranî ye de ne, îmkân bînan çekirin ku eqelîyet bikaribin mafê otonomîyê jî bigrin. Eqelîyetên ku di nav wan de sinor hatine kişandin, bikaribin bi azadî bi hev re têkîliyê deynin.

Romanyayê jî aliyê naverok ve pêşniyarek hîn firehtir da konferansê. Di pêşniyarê de dihat gotin ku divê li Ewrûpayê eqelîyet ji nuh ve bînan tesbît kirin. Pêşniyara Romanyayê tirs xîste dilê Turkiyê û Turkiye li hember vê pêşniyarê, Peymana Lozan parastî û got ku tenê eqelîyetên di Peymana Lozanê de hatine tesbît kirin, ji alî Turkiyê tînan nasîn. Beyî wan tu eqelîyeteke din li Turkiyê tune.

Konferansa Ewlehi û Hevkariya Ewrûpayê ya 3'em wê di navbera rojên 10'ê îlon û 4'ê oktobra 1991'ê de li Moskovayê dom bike. Ev pirsên ku min qal kirin, wê diha bînan munaqêşekirin. Divê Kurd û tevgera Kurd wek îsal ne bêhazîrî be. Divê Kurd meha Îlonê ya 1991'ê li Meydana Sor dengê xwe bilind bikin.

19 Hezîran 1990

Îsmail Beşikçi:

- DIVÊ KURD BI ÇAVÊN KURDÎ LI DÎROKÊ Û LI BÛYERAN BINÊRIN


Nivîsara li jêr, kurtiya "pêşgotina" pirtûka İsmail Beşikçi ya bi navê 'Ronakbîrek, Rêxistinek û Pîrsa Kurd' e. (Bir Aydın, Bir Örgüt ve Kürt Sorunu) Pirtûk di adara 1990'an de ji aliyê "Weşanên MELSA" ve li Tirkîyê hatiye çapkirin û ji 30 belgeyên li ser bîr û bawerî û politîka Sendikaya Nivîskarên Tirkîyê û Aziz Nesin ên li hember pîrsa kurd pêk hatiye.

İsmail Beşikçi bi navê "Çend Gotin li ser Belgeyan" pêşgotinek ji pirtûkê re nivîsiye. Ew di pêşgotina xwe de yek bi yek li ser belgeyan dipeyive, rexne li kirin û politîkaya Sendikaya Nivîskarên Tirkîyê (Türkiye Yazarlar Sendikası) û bîr û baweriyên Aziz Nesin ên li ser pîrsa kurd, digre, politîka dewleta tirk a di derheqê kurd û welatê wan de, bi gotinên sade, lê pir zelal xuya dike. Bi ya wî; ".....Dîtinên ronakbîrên tirk li ser bîngehê îdeolojîya resmî -ya ku hebûna kurd û Kurdistanê înkâr dike, ya ku "bêqanûnîya" axaftina zimanê kurdî, hebûna kultura kurdî, "bêqanûnîya" hebûna netewê kurd û welatê wî bi her kesî, bi her dezgehê daye qebûlîkirinê- ava dibin". Goti-

nên İsmail Beşikçi ên ji bo kurdan; " Eger kurd heta îro jî politîka perçe û parkirina welatê xwe tenegehiştibin, eger heta îro jî Kurdistanê tirkî, Kurdistanê Ereban, Kurdistanê Farisan hebe, û Kurdistanê Kurdan tunebe û Kurdan ev yek ji xwe re nekiribin xem, sedem kêmbûna "hestê netewî" ye, ".....Divê kurd bîkaribin bi çavên kurdî li dîrokê û li bûyeran binêrin", "... Ronakbîrên Kurd patika xwe didin hêvî û xwezîyên demokratîk ên gelê kurd. Ew nêrînen xwe li gor çepê tirk bi xîç dikin, dîtirsin ku çepê Tirk xitma 'nasyonalîstîyê' li wan xî; lewra dixwazin xwe teme çepê tirk, hetta ji wan şoreşgertir nîşan bidin" beşeke balkêş a pirtûkê ye.

Ji dîrokê û ji bûyeran ders negirtin yek ji mezintirîn kêmasîya me Kurdan e. İsmail Beşikçi jî me baştir me nas dike; ji me îlmtir, ne bi gotinên giran, an xemilandî, lê pir vekirî vê "trajedî" ya me li navçavên me dixê. Lewra berî her kesî car din û car din xwendina pirtûkên İsmail Beşikçi wezîfa ronakbîrên kurd e. Da ku em xwe; doza xwe ,dîroka xwe, kêmasiyên xwe, hetta riya têko-

İsmail BEŞİKÇİ
BİR AYDIN, BİR ÖRGÜT
ve
KÜRT SORUNU
---BELGELER---



şîna rizgarîya xwe jê fêr bibin.

"Ronakbîrek, Rêxistinek û Pîrsa Kurd" nimûna egîdî, dilsoziya parastîna rastîyê, serbilindîya aliman û şexsiyeta hêja ya İsmail Beşikçi ye. Divê bêt xwendin û li ser kûr bêt fikirin.

S. Réving

Li Tirkîyê politîka di derheqê pîrsa kurdî de, politîka dewletê ye, ne politîka hukûmetan e. Politîka leşkerê tirk û MIT'ê ye. Di nijinandin û bîchînanîna vê politîkayê de roleke daxwazên demokratîk ên gelî tune ye. Li gor vê politîkayê, divê unîversîte ji vê pîrsê dûr bin, bi gelşeke weha bilî nebin. Eger hinek bi 'serhişkî' jî bixwazin li ser meselê bipeyivin, divê ji unîversîteyan bîn dûrxistin. Divê rê li ber hewilda-

nên partîyên siyâsî ên Tirk û rêxistinên demokratîk û komelan bê girtin ku bi pîrsê mijûl nebin. Di 14-15.10.1989'an de 7 parlementerên SHP'ê (Partiya Sosyal Demokrat a Gel) li Parisê beşdarî konferansekê li ser pîrsa kurd bûn. Bi tenê ji ber vê yekê, di roja 17.10.1989'an de bi biryarên "Komîta Karger a Navendî" û "Komîsyona Disiplînê ya Navendî" ji (SHP)'ê hatin derxistin. Berî biryara derxistinê, hinek

parlementerên din û heyetên partîyê yên ji Kurdistanê bi serokê SHP Erdal İNONU re peyivîn: "Eger em van parlementerên derxin, wê parlementerên din jî ji partîyê derbiçin." Bersiva Inonu: "Ne 7, lê 57 parlementer jî derbiçin, em ji biryara xwe venagerin, ji ber ku pîrs pîrsa jîyana dewleta tirk e." Çend nûner û delegeyên bajar û qezayên Kurdistanê jî ji Inonu re gotin: "Eger em van hevalan ji partîyê derxin, di



hilibijartinan de em nikarin ji wan deveran bi navê partiya xwe parlementeran derxin". Bersiva Inonu pir zelal e: "Eger em ji wan deveran parlementerek bi tenê jî dernexin, wê biryar bê girtin, EV MESELA MILLÎ YA TIRKAN E." Gotinên li jor delîlên bi dilsozî bicihanîna polîtîka dewletê ne. Ne giring e SHP bê ser hukum, yan ne; ya giring bi biryarî bicihhatina polîtîka dewletê ye.

Bîr û hizrên ronakbîrên Tirk jî li gor vê sîyasetê bi ruh dikevin; anku ew li ser doza kurd sîyaseta xwe ne li gor daxwaz û vîyanên gel, lê li gor çarçewa polîtîka dewletê, polîtîka "Komîsyona Ewlehîya Netewî"; îdeolojîya resmî ava dikin. Li Tirkîyê îdeolojîya resmî dezgeheke pir bi tesîr e; hiş mirovan kor dike, mirovan dike kole. Û îdeolojîya resmî ya Tirk ketîye nav xwîna biçûktirîn malika tev dezgeh û teşkilatan. Îdeolojîya resmî, neteweyek bi navê Kurd, zimanek bi navê zimanê kurdî nas nake, Kurdan dike Tirk, zimanê kurdî jî dike devokeke zimanê tirkî. Kemalîzm ev bawerî bi her kesî, bi her dezgehê daye qebûlîkirinê, yan jî her

Divê Kurd bibin xwedî wê qabilîyetê ku bi çavên kurdî li bûyerên dîrokî binêrin, wek Kurdekî tehlîla meselê bikin. Bo nimûne Peymana Lozan. Ev bûyera dîrokî ji bo Kurd û Tirkan mesajên pir cihê di-de. Lozan ji bo Tirkan avakirina dewleteke nû ye, "rizgarî" ye. Lê ji bo Kurdan esaret e.

kesî û her dezgehekê bawerîya xwe bi polîtîka dewletê anîye.

Dezgehên wek MIT û polîsê Tirk jî alîyê îdeolojî û huqûqî ve weha difikirin. Lê di jîyanê de mesele tişteki din e; Mit jî, polîs jî li ser Kurd û Kurdistanê dipeyivin, qala zimanê kurdî dikin. Ev dezgeh pir baş dizanin ku kurd jî, Kurdistan jî, zimanê kurdî jî rastîyek e. Belê her roj, bîst û çar sa'etan ji bo nehêlana wan, ji bo şûstina mejîyê mi-

rov û dezgehan, plan û projeyan rêz dikin. Li alîyekî hebûna kurdan, hebûna Kurdistanê û zimanê kurdî înkâr dikin, li alîyekî din belge û delîlên li ser hebûna wan ji holê radikin.

Aziz Nesin di sala 1978'an de kesên ku qala hebûna Kurdan dikir, kesên ku digot: "Divê zilma li ser zimanê kurdî û kultura kurdî bê rakirin", bi "casûstîya îngilîz" gunehbar dikir. (Belge 4, 23) Lê wî bixwe di sala 1987'an de got ku: "Kurd hene, mafên wan hene, divê Kurd bigihin mafên xwe". Ev guhertin çawa çêbû? Du tişt hene: Aziz Nesin van gotina li Londonê, di civînekê de, piştî axaftina parlementerê Partiya Karker a Îngilîz Jeremy Cornby dibêje, ya rast mecbûr dibe û dibêje. (Belge 8) Êdî dozê xwe daye pêş, demokratên rojava, dezgehên demokratîk ên rojava jî nêzîk bi meselê eleqedar dibin. Di rewşeke weha de nivîskarên Tirk ên wek Aziz Nesin jî xwe mecbûr dibînin ku tiştina bibêjin. Ev yek xuya dike ku tesîra derve li ser ronakbîrên Tirk pir e. Dînamîkên derve, gotin û çalakîyên gel, hukûmet, an dezgeh û çapemenîyên ewrûpî û yên din ka çawa tesîrê li

hukûmeta Tirk dikin, weha tesîrê li ronakbîrên Tirk jî dikin. Ez dixwazim tiştêkî bibêjim: di navbera ronakbîrên Tirk û Kurd de têkilî nayên danan. Ronakbîrên Tirk, eger kesên Kurd huwîyeta xwe, anku kurdbûna xwe înkâr bikin, deriyê pêwendîyan jê re vedikin. Wek nimûna Tahsin Saraç. Lê Kurdên ku li kurdbûna xwe xwedî derdikevin, ji aliyê ronakbîrên tirk ve bi awayên cûr bi cûr tîrî gûnehkar kirin. Her weha ronakbîrên kurd dikarin bi ronakbîrên rojavayî re pêwendîyan girêbidin. Di encama van pêwendîyan de, ronakbîrên rojava mesela Kurd baştir nas dikin, beşdarî civîn û konferansên li ser Kurdan dibin, li platformên cihê li ser doza Kurd dipeyivin. Gotinên wan tesîrê li ronakbîrên tirk jî dike. Êdî ronakbîrên tirk jî mecbûr dibin ku tiştina bibêjin. Anku Kurd, bi riya demokratên ewrûpî dikarin tesîrê li nivîskarên tirk bikin.

Her çiqas Aziz Nesin hebûna kurdan û mafên wan nas dike jî, lê dûv re dibêje: "Bila Kurd hişê xwe bînin serê xwe, Kurdistan serbixwe nabe". "Kurdistan serbixwe ne di salihê Tirkîyê û ne jî di salihê kurdan de ye." Û van gotinên xwe gelek caran dubare dike. Ev jî her alî ve zîhnîyeta kolonyalistî ye. Li gor vê zîhnîyeta kolonyalist, bi tenê kolonyalist dizanin ka çi tişt di salihê kurdan de ye û çi tişt ne di salihê wan de ye. Eger tiştêkî pêwîst be, wê kolonyalist bidin, divê welatê kolonî daxwaza tiştêkî zêde neke.

Li gor vê zîhnîyeta kolonyalist, di sala 1978'an de qala Kurdan kirin, gotinên: "Kurd hene, zimanê kurdî heye", "Zordarî li ser kultura kurdî heye, divê 'TYS' (Sendikaya Nivîskarên Tirk) li dijî yekê derkeve" ne di menfeata Kurdan de ye. Îro qala hebûna Kurdan kirin, di salihê Kurdan de ye. Lê qala serxwebûna Kurdistanê kirin jî bo kurdan ne baş e. Kesên wek Aziz Nesin qet pêwîst nabînin ku rexne li polîtîka dewleta xwe bigrin. Ji salên 1920'an û vir de perçekirin û parkirina Kurdistanê ne xema wan e. Ew jî bo başîya kurdan du-sê galgalan dike, lê, ji bo gûnehkar kirina wan jî di nav keftelefte de ye. Aziz Nesin dibêje: "Qetlîama ermenîyan bi destê kurd û tirkan hat kirin". Dema qetlîama ermenîyan, tirk dewlet

bûn, dewletek îdare dikirin. Lê Kurdistan kolonîyeke wê dewletê bû. Aziz Nesin çawa van her du kategorîyan têxe rêzekê. Tê zanîn ku tev welatên împeryalist û kolonyalist jî bo çespanandin û qayîmkirina zordestîya xwe, gelên li jêr destê xwe bi destên hev didin kuştin. Xwe wek tagir û dostê aliyekî nişan didin, aliyê din jî holê radikin. Paşê

Bi kurdî axaftina Kurdan tiştêkî pir spehî ye. Ji navero-ka gotinan zêdetir, bi biryarîya axaftina bi kurdî giring e. "Bi tenê ji bo carekê" jî be, divê Kurd xwe ji vê bi biryarîyê nedin paş.

diçin ser aliyê 'tagir û dost'. Ev taktîka "parçe kirin - îdare kirin" a polîtîka împeryalizm û kolonyalizmê ye. Helbet ev nayê wê manayê ku di qetlîama ermenîyan de rola "çînên serdest ên kurd" bê jî bîr bikin.

...

Babetekî din heye. Divê ciddî û bê tirs li ser bê rawestan: Nêrîna li ser bûyerên dîrokî. Bûyerên dîrokî yên cûr bi cûr jî bo Kurdan û Tirkan tiştên cihê îfade dikin. Divê kurd bibin xwedî wê qabilîyetê ku bi çavên kurdî li bûyerên dîrokî binêrin, wek Kurdekî tehlîla meselê bikin. Bo nimûne Peymana Lozan. Ev bûyera dîrokî jî bo Kurd û Tirkan mesajên pir cihê dide. Lozan jî bo Tirkan avakirina dewleteke nû ye, "rizgarî" ye. Lê jî bo Kurdan esaret e, peymana perçekirina Kurdistanê, garantîya beşkirina gelê kurd û welatê wî ye. Kurd nikarin bi çavê Tirkan li Mustafa Kemal Atatürk binêrin, wek Tirkan wî helsenînin. Mustafa Kemal Atatürk jî bo Tirkan rizgarkirek e, serokek e ku dixwaze civaka Tirk bigihîne qonaxa medenîyeta hevçax. Ji bo kurdan, Mustafa Kemal împeryalist e, kolonyalist e, tuxumperest e; Kurdistan bûye qada qetlîamên dema wî. Ew bi hevkarîya îngilîz û frensîyan beşdarî perçekirin û parkirina Kurdistanê bûye.

Şerê yewnan û tirkan jî aliyê van her

du netewan ve pir cida tê nivîsandin û gotin. Tê zanîn ku dîroka şerên ermen û Tirkan jî pir cida hatiye nivîsandin. Tiştên ji aliyê Îran û Îraqê ve, li ser şerê Îran û Îraqê tîrî gotin jî hev nagrin. Divê Kurd jî li ser bûyerên dîrokî xwedî nêrînekê, xwedî helsenînekê bin. Divê Kurd wek Erebb, yan Faris, yan Tirkan li meselên dîrokî nenêrin. Divê Kurd bikarin bi çavên kurdî li bûyeran binêrin.

Di mesela Aziz Nesin de jî rewş weha ye. Aziz Nesin ne mecbûr e ku doza Kurd biparêze. Li ba gelê bindest cigirtin an negirtin meseleyeke exlaqî ye. Mirov nikare rexne li Aziz Nesin bigre, ji ber ku ew li rex gelê bindest cih nagre. Lê divê çewtîya bîr û bawerîyên wî bê eşkere kirin. Aziz Nesin di 80 salîya xwe de jî bo tirkan 80 pirtûk nivîsandine û jî bo wan nivîskarekî heja ye. Lê jî bo kurdan kesekî tuxumperest e, kolonyalist e. Kesên wek Aziz Nesin jî giringtirîn xelekên polîtîka kolonyalizma tirk in ku li Kurdistanê tê ajotin. Ew ne mecbûr e hez ji kurdan bike, yan doza wan biparêze. Lê kurd mecbûr in



Bergê pêşîn ya pirtûkeke sosyolog İsmail Beşikçi yê ku li dadgehê jî bi serbilindî ramanên xwe diparêze û dibêje: "Rewşa Kurdistanê ji kolonîyên klasîk jî xirabtir e."

bigihin wê qonaxê ku bi berçavkên Aziz Nesin bo nimûne li Mustefa Kemal, li Şêx Se'îd, yan li Qetlîama Ermenîyan, yan li Seddam Huseyîn nenêrin. Kurdên ku nekarin ji kesên wek Aziz Nesin cihêtir li bûyer, an li şexsiyetên dîrokî binêrin, ji koletiyê rizgar nabin. Di belge 12'an de munaqeseyeke ente-

Çapemenîya kemalist bixwe dibêje: "Geliyê Zilan heta qirikê pirî term e" (Rojnama Cumhuriyet. 16 Tîrmeh 1930). Tevî vê jî Kurd, Geliyê Zilan nizanin, ji qirkirina Dersimê bê ageh in, haya wan ji qetlîama Geliyê Sefo nîne. Lê terora Îsraîlê ya li Sabra û Şatlayê heta niqta herî biçûk jî pir baş dizanin. Sedema bê agehiya Kurdan ji dîroka wan, dîroka xwe ji xwe re derd nekirin, kêmbûna "hestê netewî" ye.

resant di navbera kurdekî û Aziz Nesin de heye. Yê kurd bi zimanê kurdî pirsîyarek ji Aziz Nesin dike û dixwaze pirsîyara wî bo zimanê tirkî bê wergerandin. Di dema munaqeseyan de, Aziz Nesin dizane yê Kurd ji Tirkîyê hatiye û dibêje: "Tu ji Tirkîyê hatiyî, lêxa tu bi tirkî dizanî. Lê çima pirsîyara xwe bi tirkî napirsî?" "Tu heqaretê li min dikî, ji ber ku tu bi min re bi tirkî napeyivî". Bi kurdî axaftina kurdan tiştekî pir spehî ye. Ji naveroka gotinan zêdetir, bi biryarîya axaftina bi kurdî giringe. "Bi tenê ji bo carekê" jî be, divê kurd xwe ji vê bi biryarîyê nedin paş. (1) Helbet hinek sedem hene ku îro kurd weke tirkan, bi çavê tirkan li bûyeran dinêrin. Înkara hebûna kurdan, zordestiya li ser wan, û asimilasyona ziman û kulturê wan û bi darê zorê hînkirina zimanê tirkî, belavkirina kultura tirkî hinek sedemên serekî ne. Anku Kurd hatine mecbûrkirin ku wek Tirkan bifikirin, wek wan rabin û rûnin

û li meselan binêrin. Tesîra îdeolojiya resmî li ser kurdan pir e; 70 sal in bi musirî û bi biryarî, tev îmkaniyetên dewletê tîn bikaranîn. Bê guman wê ev îdeoloji û propaganda tesîra xwe li Kurdan bike. Lê divê Kurd xwe ji toz û gemara vê îdeolojiyê bişûn. Jixwe salên dawîyê jî şahidên kêmbûna tesîra wê ne.

...
Kurdek bi zimanê kurdî pirsek ji Aziz Nesin dike û dixwaze pirsîyara wî ji bo Aziz Nesin bo zimanê tirkî bê wergerandin. Aziz Nesin li ser vê yekê dibêje ku: "Wî heqaret li min dikir." "Bi tirkî jî dizanî, lê dîsa jî bi kurdî dipirsî, bê siyanetî dikir." (Belge 12) Divê kurd îbreta ji van gotinan bigrin. Helbet Tirk bi Kurdan re bi kurdî napeyivin, ev ne pir giring e. Qet Tirkek jî bi vê pêwîstiyê nahese; ger wek memûr, muwazif, bo nimûne biçê Sêrtê, yan Mêrdînê, yan Colemêrgê, yan Dîyarbekirê. Lê ev 70 sal in zimanê kurdî qedexeyê, hebûna gelê Kurd tê înkare kirin. Ma ev jî bo Kurdan ne rûreşî ye? Helbet ev berî her kesî problema Kurdan e. Divê berî ku Kurd rexne li kesên wek Aziz Nesin bigrin, dîroka xwe bizanin û lê xwedî derkevin. Divê ew bizanin bûyeran ji bo Kurdan çi anîne û çi birine.

...
Kurd û tevgerên kurdî ji aliyê demokrat û sosyalistên tirk ve bi "nasyonalistî", "neteweperestî" yê tîn gunehbar kirin. Ev dîtineke çewt e. Di tevgera kurdî de aliyê giran ne neteweperestî ye, vajîya vê; kêmbûna his û hestê netewî ye. Bo nimûne ev 70 sal in li Tirkîyê hebûna wan tê înkare kirin. Kurd biçûk tîn dîtî, her kes ji wan re dibêje: "jixwe hûn tune". Gotinên weha diviyabû jî bo netewekî heqareta herî mezin biwa. Bi bawerîya min, eger navê welatê neteweyekî neyê gotin, hûwiyeta wî neyê gotin, mezintirîn heqaret li wî neteweyî tê kirin. Kes nikare heqareteke weha li neteweyekî xwedî hestê millî bike.

Li Geliyê Zilan (1930), li Dersimê (1937, 1938), li Geliyê Sefo (1934) qetlîamên mezin bûne. Çapemenîya kemalist bixwe dibêje: "Geliyê Zilan heta qirikê pirî term e" (Rojnama Cumhuriyet. 16 Tîrmeh 1930). Tevî vê jî kurd Geliyê Zilan nizanin, ji qirkirina Der-

simê bê ageh in, haya wan ji qetlîama Geliyê Sefo nîne. Lê terora Îsraîlê ya li Sabra û Şatlayê heta niqta herî biçûk jî pir baş dizanin. Sedema bê agehiya Kurdan ji dîroka wan, dîroka xwe ji xwe re derd nekirin, kêmbûna "hestê netewî" ye. Heta îro jî kesê ku di salihê Kurdan de peyivî, bo nimûne kesê ku gotî: "Divê zordariya li ser zimanê kurdî rabibe", xitma casûstiya îngilîz, hevalbendîya împeryalizm xwariye. Lê belê împeryalizma îngilîz hêza serekî ye ku Kurdistana perçe kiriye, par kiriye. Împeryalizma îngilîz bi hevkarîya kemalist û qiralên ereban, bi hevkarîya şahên Îranê Kurdistana perçe kiriye. Jixwe ji ber vê yekê Kurdistaneke Îranê heye, Kurdistaneke Îraqê heye, Kurdistaneke Sûriyê heye, Kurdistaneke Tirkîyê heye. Lê Kurdistaneke Kurdan tune. Kêmbûna "hestê netewî" ê Kurdan sedem e ku Kurd nikarin vî babetî binin rojevê, nikarin civaka xwe û civakên cîran bidin ber hev, nikarin di vî warî de bigihin qonaxekê. Eger Kurd heta îro jî politîka perçe û parkirina welatê xwe tenegehiştîbin, eger heta îro jî Kurdistaneke Ereba, Faris û

Eger Kurd heta îro jî politîka perçe û parkirina welatê xwe tenegehiştîbin, eger heta îro jî Kurdistaneke Ereba, Faris û Tirkan hebe, lê Kurdistana Kurdan tune û Kurdan ev yek ji xwe re nekiribin xem, sedem kêmbûna "hestê netewî" ye.

Tirkan hebe, lê Kurdistana Kurdan tune û Kurdan ev yek ji xwe re nekiribin xem, sedem kêmbûna "hestê netewî" ye. Ku li rojhilata Navîn Kurd ne civakeke biçûk in. Hejmara wan ji 30 milyon derbas dibe. Li Tirkîyê li ser 20 milyon e. Îro li cihanê welat hene ku nifûsa wan 300.000 e, 400.000 e. Hetta nifûsa hinek welatan jî 10.000'an jî kêmtir e. Li Yekîtiya Milleta nûnerên wan hene. Ala wan pêl

dide. Eger heta niha ji Kurd li Tirkîyê, li Rojhilata Navîn, li cihanê statuya kolektîva xwe fam nekiribin, sedem kêmbûna "hestê netewî" ye. Ev tişt xuya dikin ku kurd civakeke bê bîr û bê hiş (hafiza, bellek) in, ronakbîrên Kurd ronakbîrên bê hiş in. Civakên ku hest û hisên netewî rihên xwe kûr bernedabin jêr, civakên bê hiş in.

...
Me gotibû ku li ser mesela Kurd, bîr û bawerîyên ronakbîrên Tirk ne li gor daxwazên demokratîk ên gelê Kurd, lê li ser bingehê vîyana hinek "alîyên hesas" ava dibin. Rewşa ronakbîrên Kurd jî ne cihê ye. Ew ji patika xwe didin hêvî û xwezîyên demokratîk ên gelê Kurd. Ronakbîrên Kurd nêrinên xwe pitir li gor çepê Tirk bi xîç dixin. Ew ditirsin ku çepê Tirk xitma "nasyonalistîyê, ne-

Kurd û tevgerên kurdî ji aliyê demokrat û sosyalistên Tirk ve bi "nasyonalistî", "neteweperestî" yê tên gunehbar kirin. Ev dîtineke çewt e. Di tevgera kurdî de aliyê giran ne neteweperestî ye, vajîya vê; kêmbûna his û hestê netewî ye.

şoreşgerîyê" li wan xîn. Lewra dixwazin xwe qasî çepê Tirk, hetta ji wan şoreşgertir xuya bikin. Lê divê bêyî ku xwe ji rexneyên xelkê bidin paş; Kurd, civaka kurdî û Kurdistanê têbigihin. Paşê tê zanîn ku çepê Tirk di bin tesîra kemalîzmê de ye. Kemalîzm jî bi hevkarîya împeryalîzma îngilîz û frensî, Kurdistan perçe kiriye. Û ji ber vê yekê jî divê aliyê rexnegir kurd bin. Mezintirîn serketina îdeolojîya resmî ya Tirk ew e ku "bêqanûnbûna" mesela Kurd, bi her kesî daye qebûl kirin. Ji aliyê Aziz Nesin ve bêqanûnbûna gotinên: "Zordarî li ser ziman û kultura kurdî heye", serketina herî mezin a îdeolojîya resmî ya tirk e.

...
Kurd nikarin têkoşîna xwe bi qanûnan bi sînor bikin. Divê bingehê xebata

Qanûn dikarin zimanê mirovan qedexe bikin, dibe ku li ser vê yekê qanûnên bingehîn ji hebin, lê ew hîç ne meşrû ne. Divê Kurd bigihin wê qonaxê; bo nimûne axaftina bi kurdî mafekî normal e, mafekî herî esasî ye. Ji bo axaftina kurdî divê ji çî meqaman izin neyê xwestin. Divê Kurd vî mafê xwe bixwe bikarbînin. Îro ev kirineke şoreşgerî ye jî. Lê daxwaza izina ji partîyên sîyasî yên Tirk, ji çapemenîya Tirk, yan ji dewlete Tirk çewt e, serçemandin e.

wan li ser meşrûbûnê bilind bibe. Înkara Kurdan, înkara zimanê kurdî dibe ku ji aliyê Aziz Nesin ve "qanûn" be, lê ev yek çî cara ne meşrû ye. Înkara hebûna gelekî 30 milyonî ne meşrû ye. Qanûn dikarin zimanê mirovan qedexe bikin, dibe ku li ser vê yekê qanûnên bingehîn ji hebin, lê ew hîç ne meşrû ne. Divê kurd bigihin wê qonaxê; bo nimûne axaftina bi kurdî mafekî normal e, mafekî herî esasî ye. Ji bo axaftina kurdî divê ji çî meqaman izin neyê xwestin. Divê Kurd vî mafê xwe bixwe bikarbînin. Îro ev kirineke şoreşgerî ye jî. Lê daxwaza izina ji partîyên sîyasî yên tirk, ji çapemenîya Tirk, yan ji dewlete Tirk çewt e, serçemandin e. Gotina: "Fîlan qanûnê rakin, daku em bikarin bi kurdî bipeyivin" pir çewt e. Divê Kurd fam bikin ku ev mafê wan e û divê bi kurdî bipeyivin.

...
Mesela Kurd li Tirkîyê, mesela herî giring e. Ronakbîrên tirk êdî nikarin li bin vî barî bijîn. Li platformên demokratîk ên Ewrûpayê ronakbîrên Tirk her tim pêrgî mesela Kurd tînin û dikevin tengavîyan. Belgeyên 23, 24, 28, 29 delîlên vê yekê ne. Ronakbîrên Tirk nikarin xwedîbûna kolonîyê û ronakbîrbûnê bi hev re bimeşînin. Ew nikarin berpirsiyarîya cîneyetên li kolonîya wan û bi navê kamûranîya gelê Tirk tînin kirin, hilgirin. Divê ronakbîrên Tirk alîkarî û piştgirîya rizgarbûna kolonîyê bikin. Lê heta ku polîtîka durû ya dewleta Tirk neyê eşkere kirin, mirov nikare piştgirîya gelê kolonî bike. Dewleta Tirk her sal di 23'ê nîsanê de tev zarokên cihanê dawetî Tirkîyê dike. (2) Pesnê xwe didin û dibêjin: "Li cihanê yekem welatê ku cejnêk diyarî

zarokan kiriye, em in." Şahîyên vê cejnê heftîyêkê didomin. Lê her ew dewlet e ku her roj li Kurdistanê zarokên Kurd qir dike, bab, dayîk, xuşk û bira her tim li pêş çavên zarokan tînin tazî kirin, xiş-xişandin. Di bin qontaxên tivingên leşkerê Tirk de axîn û feryadên zarokên Kurd, digihin esmanan.

Divê ronakbîrên tirk ji vê kolonîyê rizgar bibin. Piştgirîya rizgarîya Kurdistanê bikin. Ta ku ronakbîrên Tirk li dijî polîtîkaya dewleta xwe ranewestin, rastîya kolonîya dewleta xwe eşkere nekin, wê di bin barê hebûna kolonîya xwe de biperçiqin. Tevî ku Kurdistan ne kolonî ye jî, netewê Kurd ne neteweyekî kolonî ye jî.

Eger çewtîyek hatibe kirin, divê sedîsed bê rastkirin. Eger çewtîyek hatibe kirin û bê veşartin, berdewam kirin, wê çewtîyên nû bizên. Lê îro tev çewtî di demeke kin de tînin eşkere kirin. Kurdistan ne Kurdistanê berê ye.

Nîşe:

1) *Ev munaqesê, li Elmanya rojava di civînekê de çêbûbû. Rêveberîya civînê û hinek guhdarên tirk tedaxula munaqesê kirin. Dawiyê xwediyê pirsîyarê got: "Ji bo carekê bi tenê ez ji prensîba xwe ya bi kurdî axaftinê dihêlim" û pirsîyara xwe bi tirkî pirsî. (S.R.)*

2) *Di 23'ê nîsana 1920'an de parlamentoya Cumhuriyeta Tirkîyê hat vekirin. Bi vê helkeftinê M. Kemal Atatürk roja 23'ê nîsanê wek cejn diyarî zarokên tirk kir. Ji wê salê û vir de, her sal 23'ê nîsanê li Tirkîyê wek cejna zarokan tê pirozkirin.*


Ji tirkî wergerandin: S. RÊVING

DÎTIN Û BÎRANÎNÊN GEROKÊN SWÊDÎ LI SER KURDAN

ROHAT

Di dawîya sedsala nozdehan û despêka sedsalîya bîstan de baldarî û guhdariya Swêdîyan li ser Rohilatê û welatên vê navçê her çûye zêdetir bûye. Gelek mîsyoner, gerok, zabit, rohilatnas, karmend û kesên mayîn di navbera van salan de berê xwe dane rohilatê, bi taybetî Rohilata Nêzîk û Rohilata Navîn, di dawîyê de van kesana dîtin, tecrube, serpêhatî û bîranînên xwe di gernameyên cure-cure de berev kirine. Ji vana beşek jî li Kurdistanê û li welatên ku Kurdistan zevt kirine, mayine. Li ser mîsyonerên Swêdî berî çend meha lêkolînek dîrokî di kovara Bergeh de bi zimanê

Gerokên Swêdî yê herê pêşîn, di sedsala 16-18'an de çûne, derketine welatên Osmanî û Îranî, wek Bengt Oxenstierna, Truls Kåhre, Edward Gyldenstolpe, Nils Matson Köping, Johan Otter... Ji vana yê herî pêşîn Beng Oxenstierna hê di sala 1616'an de dest bi gera xwe ya rohilatê kiriye. Li Îstebol, Konya, Şam, Baxdat û Îsfehanê geriyaye, di şerê dijî Tirkan de, li bal hêzên Şah Abbasê Mezin cih girtiye. Li ser vî gerokê nav û deng lêkolîneke gelek fireh bi destê Sven Hedîn, bi navê "Gerok Beng" hat amade kirin. Di vê lêkolîne de, salên ku Kurdistan di navbera Tirkan û Îraniyan de cara



Pirtûka Johan Otter ya ku di sala 1748'an de li Parisê hatiye çapkirin.



Kurdê 80 salî Selman Petto (Sven Hedîn)

Tirkî hat weşandin. Di vê lêkolîne de bi taybetî çalakîyên çend mîsyonerên Swêdî, pêwendîyên wan û Kurdan, dîtinên wan hatine berpêş kirin(1). Di nav van mîsyoneran de, nemaze N.F. Højjer, W. Sarwe, E. J. Larsson, L. E. Högberg, Maria Anholm, Alma Johansson, Elin Sundvall û Olga Moberg gelek tiştine balkêş nivîsîne.

Di vê lêkolîna xwe de em dixwazin ji der mîsyoneran, tenê li ser çend gerokên mayîn, dîtin û çalakîyên wan bisekinin.

pêşîn hatiye dabeş kirin, baş tê analîz kirin. Kurd çawa di navbera du agiran de mane? Gerokên mayîn yê Ewropê çawa ji Kurdistanê derbaz bûne, li ser Kurdan çi gotine? Di derheqa van pirsan de zanîyarîyên balkêş di vê pirtûkê de hene. Ji aliyê din, tebîyet û geografiya Kurdistanê jî tê nasîn(2).

Gelek caran zabitên Swêdî di nav ordiyên Îranê û Osmanî de kar kirine û pêwendîyên leşkerî pêk anîne. Ji vana yek jî

Karl Peter Von Heidenstam e. Vî zabitê Swêdî di navbera salên 1815-1817'an de, di ordîya Îranê de cih girtiye, di şkandin û fetisandina serhildaneke Kurdan de, ew jî beşdar bûye. Ji aliyê din de ew di gernama xwe de li ser Kurdan, jîyîna wan, zordestiyên li ser wan, li ser jinên Kurd dîtînen xwe jî yek-yek dibêje.

Heidenstam, derheqa êrişên ordiyên Îranê li dijî Kurdan, di vê gernama xwe de dibêje ku: "Ew hertim li hemberî hukmetê serî hildidin, bi serhildanê ve tevayî, ew bi hev re derbazî navçeyên Tirkîyê dibin. Paşayên Tirk yên hêla Wanê û Qersê wan dixapînin wekî ewê anagorî Îranê kêmîr bacê ji wan bistînin. Abbas Mirza -kurê şah yê ku ev navçe bin destura wî de ye, vê carê leşkerên xwe li ser wan de dişîne ku ew veşerin, lê belê ev yeka gelek zehmet e û gelek şer derdikevin. Ez bi xwe carekê ji van şeran yekî de beşdar bûm, ku gelek tehlike ne ji bo zabitan yên ku kurd bi taybetî hesreta kuştina wan in". (3)



Uppställning till dansen.

Rêzbûn ji bo govendê (Sven Hedîn)

Derheqa vê beşdarbûna Heidenstam li dijî Kurd zêde zanîyarî di gernama wî de tune ne. Lê belê ew, di rapora xwe ya ku li mînistir Palîn re şandîye, dût û dirêj li ser vî şerî disekine. Ew di vê rapora xwe de dide kîvşê ku, li dijî Kurdan ordîke ji çar alayan pêkhatî, şer kirîye, di vî şerî de 1300 Kurd hatin kuştin an jî birîndar kirin. Serokê wan Îssan Axa tê girtin, serdarê ordiyê dixwaze serê wî jê bike, angorî agahdarîyên Heidenstam, zabitê Ingiliz yê ku wek Heidenstam di vî şerî de cih girtiye, dibe asteng, vê yekê nahêle. (4).

Etnolog û arkelog Prof. T. J. Arne, di xebateke xwe de dide kîvşê ku ev sefera li dijî Kurdan, çend beşên romana James Morier ya bi navê "Hecî Baba Ji Isfahanê" tîne bîra mirovan. (5)

Prof. T. J. Arne ji bo xebatên etnografî û arkeologî çûye Kurdistanê, Tirkîyê û welatên Rohilata Nêzîk, di vî warî de lêkolînen hêja pêk anîye. Li hêla Ruhayê û Bîrecîkê maye.

Ew romana ku Arne navê wê dide, ango Hecî Baba Ji Isfahanê, di sala 1824'an de ji aliyê nivîskarê Ingiliz James Morier de hatîye nivîsîn, salekê şûnde jî bi zimanê Swêdî

çap dibe. Romaneke mayîn ya James Morier ya ku nivîskar tê de qala Kurdan jî dike, di sala 1836'an de dîsa bi Swêdî bi navê "Eyşo, an jî Keça Bedew li Qersê" tê weşandin.

Beşa herî girîngtirîn ya ku vê sefera li dijî Kurdan tîne bîra mirovan, beşa bi navê "Çîroka li ser Zeyno, Kurdeke Kole" ye (Historien om Zeenab, en kurdisk slavkvinna). Zeyno keça serokeşîrekî Kurd e. Bavê wê sîyarekî bi nav û deng e, mîrxasîya xwe ve tê nasîn. Di vê beşa romanê de, Zeyno qala fend û fêl, dek û dolabên Ereban, Tirkan û bi taybetî xayîntî û canbazîya Farisan dike. Dema malbata wê ji Tirkîyê derbazî Îranê dibe, bavê wê bi destê Farisan tê kuştin û ew bi xwe jî dibe kole. (6)

Bi rastî jî, ew şerê ku Heidenstam qalê dike, gelek nêzî bûyerên vê romanê ye.

Gerokê Swêdî yê herî navdar Sven Hedîn, di dawîya sedsalîya 19'an û di destpêka sedsalîya 20'an de li gelek welatên Asyayê gerîya, di dawiyê de li ser Asyayê gername-



Dansen börjar.

Govend dest pê dike (Sven Hedîn)

yên mezin nivîsî. Hedîn, her wusan jî, gelek herêmên (dever) Kurdistanê gerîya, di nav Kurdan de lêkolînen etnografîk û geografîk pêk anî.

Hedîn, di sala 1885'an de dest bi gereke mezin kir, çû derkete Îranê. Dîtînen xwe yên vê gerê di sala 1887'an de wek pirtûkekê çap kir. Di dawîya vê pirtûka xwe de Hedîn li ser Kurdên Îranê zanîyarîyên kurt dide, koka Kurdan, kal-bavên wan wek "Jêderxistinoket etnografîk" bi nav dike. Di beşeke vê xebata xwe de, Hedîn dût û dirêj li ser mîtologîya cejna Newrozê disekine. Angorî Fîrdevsî û berhema wî ya bi nav û deng Şehname peydabûn û belavbûna Kurdan li ser rûyê dinyayê çawa pêk hatîye? Di vê beşê de, Hedîn dixwaze xwe bighîne bersîvekê. (7)

Sven Hedîn, di gerek xwe ya mayin de, di ser bajarê Trabzonê re diçe bajarên Erzurum û Bazîdê, ji wir jî lê dixê diçe Hindîstanê. Hedîn, di vê gera xwe de di nav Kurdistanê Tirkîyê re derbaz dibe, van navçan "Deverên bê emniyet" bi nav dike. Hedîn, paşê li ser mîlîsên Hamîdîyê disekine. Sven Hedîn ji bo ku xwe ji êrişên Kurdan biparêze, ji walîyê

Erzurimê parêzkaran hevî dike, walî Nazim Paşa 6 kesan dide bal wî. Sven Hedîn ji Erzurimê derdikeve, paşê tê Bazîdê. Angorî zanîyariyên wî, di wê demê de, li Bazîdê 300 malbatên Kurd û 250 malbatên Ermenî diman.

Di cîhekî de Sven Hedîn dîyar dike ku, dema ew diçe bajarê Tebrîzê, ew çend nişanên bîranînê li ser deriyên bajêr dibîne, ew dibêje ku ev nişanan ji salên ku Kurdan bi pêşengîya Şeyh Ubeydullah 1882'an de êrîşî Tebrîzê kirin û Urmîye zevt kirin, ji wê demê mane. (8)

Sven Hedîn di sala 1916'an de li ser Îstambul û Halebê re diçe Iraqê. Ew di vê gera xwe de ji nav deverên Kurdîstana Başûr, heremên Mêrdîn û Nisêbînê re derbas dibe. Hedîn dema tê bajarên Baxdad û Mûsilê, li vira rastî gelek Kurdan tê. Hedîn pirtûka xwe ya ku li ser vê gera xwe nivîsîye, tê de gelek suretên ciwan ji bajarê Mûsilê hene. Ev suretana ji şahîyeke listik û dansên Kurdên bajarê Mûsilê hatine kişandin. Çawa ew dide kîvşê 50 kes, jin mêr tevî van dansa bûne.



Kvinnorna deltaga i dansen.

Jin tevî govendê dibin (Sven Hedîn)

Hedîn dibêje ku, Kurdan wusan dilîst, "Rûyê Kurdan di nav xudanê de mabû" (Svetten lackade från Kurdernas ansikten). Ji Iraqê dema Hedîn vedigere Helebê, ew di nav Mêrdînê re derbas dibe û Mêrdînê dide nasîn. Dema ew vedigere, di gundekî de, li ber hin xaniyan, xolikan rastî jinên Kurd tê, ew dibîne wekî jineke salbihurî bi girî û qîjîna xwe ve erd û ezman tevlihev kiriye, ew paşê fêr dibe ku kurê wê ji bo şer birine leşkeriyê. (9)

Sven Hedîn bi xwe di warê xetkêşî û wêneçêkirinê de hunermendekî bi nav û deng bûye. Wêneyên wî yên bi navê "Listikvana Kurd ji Baxdayê" û "Kurdê 80 salî Selman Petto" bi rastî gelek ciwan in.

Gerok û rojnamevan Alexis Kuylenstierna di navbera salên 1894-1902'an de li gelek welatên Rohilatê gerîya. Ew ji aliyê din de bûye nûçegihanê rojname Swêdî Dagens Nyheter (Nûçeyên Rojê). Di navbera salên 1895-1898 li Tirkîyê maye, gelek nûçe li ser bûyerên ku di van salan de pêkhatî, gîhandîye Swêdê, bi taybetî li ser jenosîta Ermenîyan, nebaşbûna pêwendiyên Kurdan û Ermenîyan û derheqa

alayên Hamîdiyê. Ew li bajarê Maraşê bûye şahîdê qirkirin û kokanîna Ermenîyan, di pirtûka xwe ya bi navê "Gerên min li Rohilatê" Alexis Kuylenstierna dûr û dirêj li ser van bûyeran disekine. (10)

Alayên Hamîdiyê çawa tê zanîn ji Kurdan pêk hatibûn, bi taybetî li dijî Ermenîyan ji aliyê hukmetê de dihatin seferber kirin. Ji bo vê yekê jî gelek serokeşîrên Kurd ji aliyê dewleta Osmanî de hatibûn xapandin. Yek ji wana jî Îbrahîm Paşa bû, li dorberê Wiranşehrê xistibû bin bandura xwe. Alexis Kuylenstierna, dema ji Mûsilê vedigere û dixwaze here qonaxa Îbrahîm Paşa, wî ziyaret bike. Ew di pirtûka xwe ya bi navê "Di Nav Tirkan û Ereban de Macera", bi navê "Kurdên Îbrahîm Paşa" wek beşeke bi serê xwe qala vî serokeşîrê Kurd dike. Ew heta diçe qonaxa Îbrahîm Paşa rastî gelek diwariyan tê, di dawiyê de dibe mêvanê wî, bi hevra dixwin, vedixwin û sohbet dikin. Kuylenstierna çawa dide kîvşê, malbata Îbrahîm Paşa bi xulaman ve tevayî ji 50



Bild 80. Diarbekir.

Dîyarbekir (Ludvik Nordström)

kesî pêk hatîye. Di pirtûkê de çawa tê xuyanê, hem nivîskar, hem jî Îbrahîm Paşa her çiqas ji hev re rûşîrînî nişan dabin jî, baweriyên xwe bi hev neanîne.

Alexis Kuylenstierna dîsa di vê pirtûka xwe de qala bûyerê gelek balkêş dike. Ew çawa dide kîvşê di navbera Kayserî û Yozgatê de, Kurdan bi pêşengîya Îsmail Paşa li dijî hêzên hukmetê dest bi şerekî kirine. Hukmet biryar digre wekî koka van Kurdan bîne, vê tehlukê bertaraf bike. Mehemed Emin Paşa bi çar tabûr leşker û çar topên çîya ve êrîşê dibe ser mirovên Îsmail Paşa. Kurd bi mêrxasî berxwe didin. Di dawiyê de, hêzên hukmetê zora Kurdan dibin. Dema ev şer diqede Alexis Kuylenstierna bi Mehemed Emin Paşa ve diçe Kayseriyê. (11)

Êrîşên Alayên Hamîdiyê li dijî Ermenîyan bala gerokên Swêdî zêde kişandîye ser xwe. Bindestî û nebaşîya rewşa Kurdan di bin sîya vê tabloya xirab, di plana duemîn de maye. Van gerokan, Alayên Hamîdiyê û Kurd wek neteweyekî tevlihev kirine. Carl Ramberg di beşeke pirtûka xwe ya bi navê "Lawên Pêxember" de, li ser hin bûyerên li hêla



Kurdiskt kavalleri.

Suvariyên Kurd (Phlip von Schwerin)

Adanê disekine. Ramberg, di vê beşê de cih dide dîtîna û baweriyên jîneka Alman ku, êrişên Kurdan li dijî Ermenîyan bi çavên xwe ve dîtîye (12). Tenê beşeke Kurdan (Alayên Hamîdiyê yên ku ji Kurdan pêk hatine) tevî van bûyeran bûne. Ev siyaseta dewleta Tirkîyê bûye, ne siyaseta netewê Kurd. Ji ber vê yekê jî, gerokên Swêdî ne dewleta Tirkîyê, netewê Kurd hildane li hemberî xwe. Vê kêmasiya înforsiyonê di wê demê de navê Kurdan gelek xirab derxistîye. Lê belê baweriyên hemû gerokên Swêdî di vî warî de ne wek hev in. Alma Johansson ya ku bi salan li bajarê Mûşê maye, di kîşê ku dema bûyerên li dijî Ermenîyan li Mûşê dest pê kirin, Kurdan kuştina jin, zarokên Ermanî qebûl nekirin, vê carê Tirkan bi xwe ev yeka birin serî (13).


Dema Şerê Balkanê dest pê dîke, di navbera Swêdê û Dewleta Osmanî de hatin-çûyîneke mezin peyda dibe. Di vê şerî de gelek zabît û rojnamevanên Swêdî cih digrin. Bi taybetî di vî şerî de beşdarbûna Kurdan li dijî serhildanên welatên Balkan, gelek bala Swêdiyan kişandiye.

Philip Von Schwerin bi navê rojnama Nya Dagligt Allehandan wek nûçegihanê şerê diçe Îstambulê. Di bîranînên xwe de ew qala leşkerên Kurd yên ku bi hespên xwe ve hatine Îstambulê, dîke. Ew dide kîşê, rojekê 1000 suvariyên Kurd di mevziyên Hademköyü re derbaz bûne, bi kincên xwe ve tesîreke biyanî (exotisk) li ser mirovan dihiştin.

Di pirtûka Phlip von Schwerin de, çend wêneyên van hêzên leşkerî yên Kurd jî cih girtine. (14)

Li ser Şerê Balkanê zanîyarîyên fireh wusan jî mirov, di bîranînên ateseyê leşkerî yê Swêdî W. Unander de dibîne. Di pirtûka wî de tê xuyanî ku hevaltîya wî Phlip von Schwerin hebûye. W. Unander berî çûyîna xwe li Îstambulê, dide kîşê, ku di mala Şerîf Paşa de ya ku di Linnegatan bûye, civînek li ser pêwendiyên Swêdê û Osmanîyan çêbûye. W. Unander, di beşeke pirtûka xwe de diyar dîke ku ew hêzên kurd yên ku hukmetê anîne Îstambulê, wek hêzên alîkar û cîgir dikarin bên hesabandin. Di pirtûka W. Unander de jî wêneyekî van leşkerên Kurd cih girtîye. (15)

Dema gilî hatiye ser wênekîşiyê, lazim e mirov bêje ku, di



Kurdiskt kavalleri inkallat till Konstantinopel säsom reserv under kriget.

Di wextê şer de suvariyên Kurd wekî çekdarên ihtiyadî tînin Îstambulê (W. Unander)

vî warî de wênekêşê Swêdî P. W. Berggren wêneyên gelek ciwan û hêja li Tirkîyê kişandine, wêneyên wî di gelek gernameyan Swêdî de cih girtine. Berggren ji bo wêneyên dorberê Riya Hesin ya Baxdadê bîkşîne, berpirsîyarên vê projê wek wênekêş wî dikin kar. Derheqa riyên hesin li Kurdistanê, di sala 1927'an de projê ji aliyê firmayên Swêdî û Danmarkî despê dîke, ev projê 8 salan dajo. Ev projê ji xeta çemê Filyoz û Fevzîpaşa-Diyarbakirê pêk hatiye. Li ser vê projê di sala 1937'an de pirtûkeke projeyên teknîkî bi zîmanê Frensî û Danmarkî çap bûye. (16)

Di derheqa vê riya hesin de zanyarî û danasînên fireh ji bo xwendevanên Swêdî ji aliyê nivîskar Ludvik Nordström de tê amadekirin. Bi însiyatîfa berpirsîyarê balyozxana Swêdî G. O. Wallenberg, Ludvik Nordström diçe Anadolîyê, li dorberê vê riya hesin, lêgerînan pêk tîne, bi navê "Swêda Cihanî" pirtûkekê dinivîse, di vê xebata xwe de li ser rewşa Tirkîyê agahdarîyên dirokî û civakî pêşkêş dîke. Di kerîkî pirtûka xwe de Nordström ji bo serhildana Şêx Seîd tiştine neçê dibêje, vê serhildanê angorê "Zihniyeta Ewrûpî" ya ku bi pêşengîya M. Kemal Atatürk de dest pê kiriye, wek "Zihniyeteke Asyayî" dibîne, vê serhildana Kurdan bi çend serhildanên Swêdî yên ku, di dewra Gustaf Vasa de pêk hatine, rûberî hev dîke, wek serhildana "Dackfejð" û "Klockuppror". Çawa tê xuyanî Nordström di derheqa serhildana Kurdan de bîngê etnîk zêde giring nedîtîye, tenê xêra Tirkîyê daye ber çavan. Bo vê yekê jî Atatürk wek "Gustav Vasayê Tirkîyê" bi nav dîke (17).

Dirêjkirina riya hesin heta Diyarbakirê, piştî şikandina serhildana Şêx Seîd wek armanceke stratejîk ji aliyê hukmeta Tirkîyê ve hatiye qebûlkirin. 70 km'yên dawîn ya riya Diyarbakirê bi destê tirkan tê çekirinê. Wusan tê xuyanê Swêdî û Danîmarkîyan nexwestine ku di navçeyên ku Kurd têde zêde ne, kar bikin. Ev navçan "Deverên bê emniyet" hesab kirine.

Swêdiyek di sala 1930'an de raporeke li ser van karên xwe ji Swêdê re dişîne û li ser hin dijarîyan li van deveran disekine. Di derheqa axa Kurdistanê de, di vê raporê de

ifadeke balkêş cih girtiye, tê gotin ku: "Gundên Kurdan yê nîvîskar wêk hêlînên dûmeqeskan li ser kendalan darda dibin".

Ji aliyê din çend rohilatnas, zanayên Swêdî û nivîskar ji çûne Kurdistanê wek gerokan li wira mane, lêkolînên zanistî pêk anîne. Yek ji wana Johan Otter e. Otter ji bajarê Lundê bi rê dikeve, diçe Parîsê. Paşê dibe rohilatnasekî navdar. Ji bo bazirganiya Fransayê li rohilatê ji nû ve jîndar bike û zimanên xwe yê rohilatê pêşta bibe, diçe welatên Rohilatê. Piştî wê gera xwe Johan Otter bi navê "Gera li Tirkîyê û Îranê" xebateke ji du cilda pêkhatî wek 415 + 338 rûpel amade dike. Ev xebata di sala 1748'an de li Parîsê tê weşandin. Di dema xwe de, zaniyarîyên li ser Kurdan û Kurdistanê yê here giranbiha û balkêş di wê xebata Johan Otter de cih digrin. Ew di sala 1734'an de vedigere Fransê. Bi taybetî di cildê duwemîn, di navbera rûpelên 224-330'an de li ser Kurdistanê agahdariyên gelek hêja cih girtine. (18) Bi rastî ev gernama bi serê xwe hêjayî lêkolîneke mayin e.

Zanayekî Swêdî ku zêde serê xwe li ser geografya Kurdistanê eşandiye, John Frödin e. Di sala 1927'an de biryar digre ku here Kurdistana Tirkîyê, lê belê hukmeta Tirkîyê ji ber serhildana Şêx Seîd çûyina biyaniyan li Kurdistanê qedexe dike, bi vî tehrî John Frödin wê gera xwe bi şûnde dixê. Ew sê sala divedîne (hewl dide) wekî here Kurdistanê. Di destpêka sala 1930'an de destûr jê re derdikeve ku here Kurdistanê. Dema ew tê Enqerê, wê carê dibihîse Kurdan li cihêkî mayin ango li Araratê serî hildane, hemû planên wî tevlihev dibin, jê re dibêjin pêwîst e tu ji çemê Firat zêde neçî. John ji bo wê gera xwe, ew bi wezîrê karê hundir Şükrî Kaya Bey û mufettişê giştî li Dîyarbekirê Îbrahîm Talî ve pêwendîyan datîne, lê belê karên wî naçin sêrî(18). John Frödin piştî 5 salan, di sala 1936'an de, êdî dikare here Kurdistanê. Paşê, li ser Kurdistanê 3 namilkan amade dike, bi swêdî (20) û fransî diweşîne (21).

Nivîskarê Swêdî Birger Mörner, di destpêka sedsaliya bîstan de diçe Îstebolê digere, li wira rastî nebaşîya rewşa hemmalên Kurd tê, ji aliyê din govendeke wan bi çavê xwe ve dibîne (22).

Hebûn, hêz û berxwedana Kurdan wek faktorekî dînamîk zêde bala gerokên Swêdî nekişandîye ser xwe. Wana zêdetir bi berçavkên Tirkîyê, Iraq û Îranê ve rewşa Kurdan nêhêrîye. Rütger Essén di gernama xwe de di pêwendîyên Rohilata Nêzîk de Kurdan ji bo Tirkîyê, Îran Iraq û Sûriyê wek "Elementekî Nerehetîyê" (ett besvärligt element) dibîne. Paşê ew Kurdan bi vî tehrî bi nav dike: "Yekemîn ew rêbir in, duemîn ew şivanê bizin û miyan in, sêmem ew leşkerê kirêkirî ne, wekî din tiştêk nînin (23)." Gerokeke mayin Elly Jannes bi çavêkî din ve li dînamîkên wê nerehetîya Kurdan dinêre û dibêje ku, heta Kurd dewleta xwe saz nekin, bêguman çiyayên Kurdistanê dê bibin "navendeke nerehetîyê" (ett orosentrum), ji aliyê din Elly Jannes di gernama xwe de li ser Kurden Yezîdî agahdariyên fireh dide(24).

Sven Auren yê ku di sala 1934'an de çûye Tirkîyê, di beşeke pirtûka xwe de, li ser mirina Zaro Axa disekine. Zaro Axa di sala 1774'an de hatiye dinê û di 157 salîya xwe de miriye. Zaro Axa li Bîtîlîsê hatiye dinê û tevî 6 şeran bûye, li

dinyayê mirovê herî kal ew bûye, çawa nivîskar dide kîvêşê sê gurçikên wî hebûne (25).

Angorî sedsaliyên kevn, di sedsaliya bîstan de hejmara gerokên Swêdî ên ku çûne Kurdistanê bêşik zêdetir bûne. Lê belê dîtî, bawerî û ramanên "gerokên kevn" û "gerokên nû" bi taybetî di warê Kurdistan û Kurdan de ji hev cuda ne. Gerokên kevn zêdetir li ser Kurdistanê erd, sînor, çiya, rûbar û tiştên geografîk sekinîne. Yê ku zêdetir li ser rewşa Kurdan nivîsîne, gerokên nû ne. Gerokeke nû ya ku di rîya gerokên kevn de meşîyaye û li ser kurdan agahdariyên zêde, fireh cara pêşîn raberî xwendevanên Swêdî kiriye, Barbro Karabuda ye. Ew di sala 1959'an de çûye nav Kurden Tirkîyê, ew wê gera xwe "Li bal Kurdan" bi nav dike(26). Di sala 1960'an de Barbro Karabuda bi navê "Li Aliyê Rohilata Firatê - Li Welatê Kurdan", cara pêşîn wek pirtûk xebateke fireh li ser Kurdan bi Swêdî amade dike (27). Ev pirtûka Karabuda ji gernameke zêdetir, wek xebateke dîrokî û civakî, bi tehrekî zanistî hatiye nivîsandin. Bi rastî jî xebateke gelek kêrhatî ye. Bi Swêdî li ser Kurdan belavkirina înfomasîyonê, bi xebatên wê geroka nû ve di van salan de gihîştê merhaleke nû.

Çavkanî:

- 1) Rohat, Çalakîyên Pêşîn Yê Yekîtîya Mîsyonerên Swêdî Di Nav Kurdan de, Bergeh, hejmar 3, 1990.
- 2) Sven Hedin, Resare-Bengt, Stockholm, 1921.
- 3) C.P Von Heidenstam, Några Underrättelser Samlade Under Resa ifrån Turkiet till Persien, Uppsala 1825, rûpel 57.
- 4) T. J. Arne, Svenskarna och Österlandet, Stockholm 1952, rûp. 121
- 5) T, J, Arne, rûp.122
- 6) James Morier, Haji Baba från İspahan, andra delen, Stockholm, 1825, rûp. 1-28
- 7) Sven Hedin, Genom Persien, Mesopotamien och Kaukasien, Stockholm, 1887, rûp. 308.
- 8) Sven Hedin, Öfver Land till Indien, genom Persien, Seistan och Belurjistan, Stockholm, 1910, rûp. 165.
- 9) Sven Hedin, Bagdad, Babylon, Ninive, Stockholm, 1917, rûp 786.
- 10) Alexis Kuylenstierna, Mina Resor i Orienten, Stockholm, 1900, rûp. 25.
- 11) Alexis Kuylenstierna, Turkar och Araber, Stockholm, 1912, rûp. 83.
- 12) Carl Ramberg, Profetens Söner, Göteborg, 1912, rûp. 111.
- 13) Alma Johansson, Ett Folk i Landsflykt, Stockholm, 1930, rûp 37.
- 14) Philip von Schwerin, I Fält med Turkarna, Minnen från Balkankriget, Stockholm, 1913
- 15) W. Unander, På Profyllda Uppdrag i Österled, Malmö, 1947. rûp. 179.
- 16) Construction des linges de chemins de fer Irmak-Filyoz(et) Fevzi Paşa-Diyarbakir, 1937, Göteborg, Copenhagen.
- 17) Ludvik Nordström, Världs-Sverige, Stockholm, 1928, rûp. 202.
- 18) Johan Otter, Voyage en Turquie et en Perse, Paris, 1748.
- 19) John Frödin, En Resa genom Turkiet 1930, Uppsala, 1931.
- 20) John Frödin, En Resa genom Östra Turkiet, Uppsala, 1936. John Frödin, Turkiska Armenien och Kurdistan, Uppsala, 1948.
- 21) John Frödin, La Morphologie de la Turquie sud-est, Uppsala, 1937.
- 22) Birger Mörner, Under Halfmånen, Stockholm 1906, rûp. 79.
- 23) Rütger Essén, Bakom Asiens Portar, Stockholm, 1931, rûp. 170.
- 24) Elly Jannes, Österlandet, Stockholm, 1949, rûp. 177.
- 25) Sven Aurén, Kemal Slår Näven i Bordet, Stockholm, 1934, rûp.143.
- 26) Barbro Karabuda, Turkiet Mitt Andra Hemland, Stockholm, 1959, rûp. 182
- 27) Barbro Karabuda, Öster om Eufrat- I Kurdernas Land, Stockholm, 1960.

PÊŞDEÇÛNA ZIMAN Û REWŞA WEŞANÊN KURDÎ LI EWROPAYÊ

REŞO ZÎLAN

saz dike. Piştî ku Tirkan bi serektiya Mustefa Kemalê gorbigoz alfabe ya xwe guhart, ku Tirk jê re "şoreşa tîpan" dibêjin, ew naçar ma ku hin tiştan di alfabe ya xwe de biguherîne. Xebata wî û her weha bi dû re hatina mîrê me Kamûran Bedirxan bo Ewropayê di warê pêşvebirina zaravayê kurmançî de dikarin wek gavên pêşîn bihêne hesab kirin.

Mîrov dikare bibêje, ku li Ewropayê daketina zaravayê kurmançî bo saheya nivîsandinê, li ser rûpelan, li ser kaxezên spî di salên 1960-î de dest pê dike. Wek hûn jî dizanin, cara pêşîn di dawiya salên 50-î de li Ewropayê komeleyek bi navê "Komeleya Xwendekarên Kurd li Ewropayê" hate danîn. Vê komelê di sala 1963-an de kovareke saranser bi zaravayê kurmançî derêxist, ku navê wê HÊVIYA WELÊT bû. Piştî mirov dibîne ku nivîsandina bi zaravayê kurmançî, wek meşa kêzikê be jî, hêdî hêdî peşde diçe. Ez ê piştî nav û nimûneyên hin kovarên ku berê derketine pêşkêşî we bikim. Helbet nikarim bi dûr û dirêjahî li ser tiştina behs bikim.

Pêşveçûna zimanê kurdî, zaravayê kurmançî, ta kêrt û pileyêke bilind bi hatina Kurdên xwendekar û ronakbîr ve jî girêdayî ye. Ew Kurdên ji ber ho û sebebên xwendinê, ji ber sebebên siyasî û yên din, naçar bûne ku dev ji welatê xwe berdin. Bi vî awayî bûne mişextî li Ewropayê. Bi wan hêmanan ve nivîsandina zaravayê kurmançî potansiyeleke nû werdigire. Mîrov dikare vê koça han ya mişextbûnê li ser çend periyodan parve bike. Ew periyod jî teqabulî wan salan dike, ku li welatê me zêrandin, zordestî û derbederî xurtir bûne. Bo nimûne, di sala 1971-ê û herweha di sala 1981-ê de li Tirkiyê cûnteyê faşîst hat ser hukum. Ev herdu bûyer bûn sebeb, ku Kurdên kurmançî wê zaza, tof bi tof, kom bi kom terka welatê xwe bidin, û derkevin derveyê welatê. Di nav wan de hêmanên ku xwedî qabîliyeta nivîsandinê bûn û zaravayên xwe baş dizanibûn, dest pê kirin û di rojname û kovarên cihê cihê de nivîsandin. Wan tevî kurdî, bi zimanên din jî nivîsandine. Di vê navê de îro pêşveçûna kovar û rojnameyên kurdî dibîne û helbet ev jî dibe sebeb, ku zaravayê kurmançî bi xurtî têkeve nivîsandinê û pêşdetir biçe.

Xwişk û birayên hêja, Mêvanên giranbiha, Berî pêşkêşkirina babeta axaftina xwe, dixwazim bidim zanîn, ku serperêstiya civînê ji min dixwaze ku ez axaftina xwe kurt bibirim. Pêwîst e bibêjim, ku berê hevalên karbidest yên Federasiyonê karek spartibûn min. Li gor wê diviya min li ser babeta pêşveçûna zimanê kurdî, zaravayê kurmançî, li Ewropayê gotarek bixwanda. Lê piştî wê, babeteke din jî spartine min. Ew jî li ser weşanên (kovar, rojname, pirtûk û hwd) kurdî yên bi zaravayê kurmançî li Ewropayê bû. Her wekî xuya ye, ji bo min jî dijwar e, ku ez bikaribim van herdu babetên pîralî û berfireh di maweyêke çend deqîqeyî de biqedînim. Lê dîsan jî ez ê hewl bidim, da ku gotara xwe dirêj nekim.

Ez wilo dibînim ku pêwîstiyê gelekî mezin jî bo nasîna xebata ku di warê pêşveçûna zimanê kurdî de, zaravayê kurmançî, li Ewropayê hatiye kirin, heye. Ji ber ku hevalên me yên ku bi taybetî di van salên dawî de, piştî destpêkirina êrişên hov yên li ser Kurdistanê, destpêkirina şerê xwînawî ya di navbera Îran û Îraqê de û her weha piştî hatina cûnteya faşîst li Tirkiyê naçar mane ku dev ji welatê berdin. Ji wan bi hezaran, bi deh hezaran kes bê war mane û derbeder bûne. Gelek jî wan îro li Ewropayê cîwar bûne. Wilo xuya dike û ez bi xwe jî wisan bawer dikim, ku agehî û zanyariyên wan li ser xebata di warê ziman de li Ewropayê hatiye kirin gelekî kêr in. Dil dixwest ku mirov di vî warê de agehî û zanyariyêke dîr û dirêj bide wan hevalan. Lê her wekî ku diyar e, ez ê nikaribim wekî ku min hizir û plan kiribû, bi vî karî rabim. Lê dîsan jî pêwîst dibînim, ku ez

bi xetên giştî jî be, behsa hin tiştan bikim.

Gava ku mirov bixwaze behsa pêşveçûna zimanê kurdî bike, çî zaravayên kurdî dibin bila bibin, helbet divê mirov pêşî navên hin kurdîzanên ewropî, yên ku berî me bi zimanê kurdî mijûl bûne û yên ku ji me re hin destûr û awayên gramatîka kurdî danîne, bîne zimên. Herwekî ne bes ji bo me Kurdan ev tişt weha qewimiye, lê ji bo hin miletên din jî wilo bûye. Bo nimûne, gramatîka herî tîkûz ya zimanê erebî jî aliyê yekî Fars de hatiye danîn. Ji bo me Kurdan jî gramatîka zimanê me, awa û destûrên zimanê me cara pêşîn jî aliyê biyaniyan de hatine danîn û tesbît kirin. Ji wan, bê guman gotina navê Garzonî û hinekên din yên ku gelekî nas in; wek F.Müller, A. Socin, F. Justî û bi dû re çî di warê gramatîkî de be û çî jî di warê edebiyat, destnivîsar, diyalektoloji, leksikoloji û h.w.d. de be, anîna ser ziman navên wek A.Leloq, O.Man, Hedenek, Hugo û R.Lescot gelekî pêwîst e. Em di gelek waran de, ta kêrt û pileyêke berz, deyndarê van mirovên han yên kurdîzanên gelekî hêja ne.

Ji bo nasîna pêşveçûna zimanê kurdî, zaravayê kurmançî, divê mirov vegere ta salên piştî şerê cihanê yê yekemîn. Ev yek helbet bi danîna pîrsa alfabe ya kurdî ve girêdayî ye. Hatina bi taybetî mîrê me, rehmêtî Celadet Bedirxan bo Ewropayê bû despêka hizirkirina danîna alfabe ya latînî jî bo zimanê kurdî. Her çend ew vê fikrê, gava ku hîn li Kurdistanê bû, ji peyayê navdar Noel werdigire jî, lê ew cara pêşîn li Ewropayê jî bo rehmêtî pêşde diçe. Ew wê hizir û xebata xwe berfirehtir dike, hin awa û destûran jî bo nivîsandinê datîne. Hin tîpan jî bo wê

Niha dixwazim pir bi kurtebirî çêla rojname û kovarên ku ta niha li Ewropayê hatine weşandin, bikim. Ji ber tunebûna keysê, min divê bi tenê ji we re behsa navên wan bikim. Ji kîjan salê heya kîjan salê û çend hejmar derketine, wan bibêjim. Çêtir dibînim ku mirov derketina rojname û kovarên kurdî li ser 3 periyodan parve bike:

I) Periyoda 1960-70-yê

II) Periyoda 1970-80-yê

III) Periyoda ji 1980-yê û bi vir de.

ROJNAME - KOVAR

1960 - 1970

Hêviya Welêt, (kurdî), 1963-65, 3 Hejmar

Çiya, (kurdî), 1965-70, 8 Hejmar

Çagri, (kurdî, tirkî), 1966-, 1 Hej. Îlon

1970 -1980

Ronahî, (kurdî-tirkî), 1971 - 78, 24 Hejmar

Rabûn, (kurdî-tirkî), 1975-1, 2 Hejmar

Brûsk, (kurdî-tirkî), 1977 - 78, 6 Hejmar

Azadî, (kurdî), 1978 - 79, 9 hejmar

Stêrka Sor, (kurdî-tirkî-swêdî), 1977-79, 9 Hejmar

Rêya Rast, (kurdî), 1977 - 81, 15 Hejmar

Şoresgêr (kurdî-erebî), 1978, 1 Hejmar

Dengê Komelê, (kurdî-erebî), 1978, 1 Hejmar

Pêşrew, (kurdî-erebî), 1972, 1 Hejmar

Roja Kurdistan (kurdî), 1979 - 80 2 Hej.

Pale, (kurdî-tirkî), 1978 - 81, 9 Hejmar

Rizgariya Kurdistan (kurdî-tirkî), 1979 - 82, 19 Hejmar

Ji 1980'î û bi vir de

Dengê Komkar (kurdî-tirkî), 1979 -, 112 Hejmar

Roja Nû (kurdî,tirkî), 1978-83, (43 Hej).1983, (kurdî 65 hej).

Armanc (kurdî-tirkî), 1979-86, (62 hej).1986, (kurdî 86 hej).,

Berbang (kurdî), 1982, 53 Hejmar

D.Yekîtîyê (kurdî-tirkî), 1983, 8 Hejmar

Têkoşer (kurdî-tirkî-fransî-flemanî), 1979, 42 Hejmar

Kurdistan Press (kurdî-tirkî), 1986, 55 Hejmar

Çarçira (kurdî), 1986, 3, Hejmar

Hêvî, kurdî)1983, 6 Hejmar

Kurmancî (kurdî), 1987, 3 Hejmar

Berhem (kurdî-tirkî)1988, 3 Hejmar

Hêviya Gel (kurdî-tirkî), 1986, 20 Hej.

Dengê Welat (kurdî-tirkî), 1988, 1 Hej.

Berxwedan (kurdî-tirkî), 1982 68 Hej.

Rewşen (kurdî), 1988, 2 Hejmar

Rizgariya Welat (kurdî-tirkî), 1985,

10 Hejmar

Ala Yekîtîyê (kurdî-tirkî), 1988, 1 Hej.

Bingeh (kurdî-tirkî), 1987, 5 Hejmar

Dem (kurdî-elmanî), 1985, (6 hej) 1986

(8 hejmar)

Gaziya Welat (kurdî), 1980-83 9 Hej.

Yekîtî (kurdî-tirkî-erebî) 1983, 6 Hejmar

Mizgîn (kurdî-elmanî), 1983-86, 4 Hej.

Qêrîn (kurdî-tirkî), 1981-82, 7 Hejmar

Çi Bikin (kurdî), 1981-82, 5 Hejmar

Stêr (kurdî), ?-1983, 3 Hejmar

Yekîtî-K.Sûriyê (kurdî), ?-1980, 2 Hej.

Demokratê Şoresger (kurdî-tirkî), 1986,

1 Hejmar

Roja Welat (kurdî-tirkî) 1984 (13 hej),

1986, 38 Hejmar

Niştiman (kurdî-tirkî), 1983-85, 12 Hej-

mar., 1986 (1 Hej).

Newroz (kurdî-swêdî), 1986, 1 Hejmar

Nûçename (kurdî), 1984, 6 Hejmar,

Xebat (kurdî-tirkî), 1985, de, 7 Hejmar,

87'an de 12 Hejmar, 88 de 12 hej.

Demokrat (kurdî-tirkî), 1988, 1 Hejmar

Kurdistan (kurdî-erebî), 1983, 1 Hejmar

Pêşeng (tirkî) ji hej. 13, 1983 69 Hejmar

Riya Azadî (tirkî), 123 Hejmar

Yekîtîya Sosyalîst (tirkî), ji hej 6 1984, 15 Hejmar

Serxwebûn (tirkî), 1982, 88 Hejmar,

Rizgarî (tirkî), 1988 1 Hejmar

Berbangê Kurdistan (tirkî), 1984 1 Hej.

Wekhevî (tirkî), 1982, 2 Hejmar

Hewar (tirkî), 1980, 7 Hejmar

Rastiya Kurdistan (tirkî), ? Hej. 4,

1987 - ?

Jîn (kurdî-erebî), 1985, 20 Hejmar

Dêrsim (kurdî), 1988 3 Hejmar

Hevkarî (kurdî), 1987 4 Hejmar

KOVARÊN TÊVEL

1) Kovarên zarokan

Kulîlk, 1980, 35 Hejmar

Hêvî, 1981-84, 15 Hejmar

Hêlîn, 1982, 14 Hejmar

2) Kovarên pêkeninê - mîzahî

Îsot, 1985-87, 9 Hejmar

Mîrkut, 1985-87, 3 Hejmar

Zengil, 1985-86, 8 Hejmar

Kovarên bi zaravayê dimilî

Ayre, 1985, 14 Hejmar

Piya, 1988, 4 Hejmar

3) Kovarên enformasyonê

Rênasî, 1984, 10 Hejmar

Kovarên kurdî yên ku hîn ji derdikevin

Berbang

Armanc

Roja Nû

Rewşen

Hêvî

Kurmancî

Dêrsim

Hevkarî

Kovarên kurdî-tirkî yên ku hîn ji derdikevin

Berhem

Dengê Komkar

Kurdistan Press

Dengê Welat

Dengê Yekîtîyê

Ala Yekîtîyê

Berxwedan

Bingeh

Hêviya Gel

Têkoşer

Demokrat

Kovarên kurdî- erebî yên ku hîn ji derdikevin

Jîn

HIN NIVÎKSARÊN KURD YÊN KU AFIRANDINÊN WAN LI EWRÛPAYÊ HATINE ÇAP KIRIN.

Li Ewropayê, ji dawiya salên 1960-î û bi vir de pirtûkên kurdî tîne weşandin. Di van hema hema 20 salên çûyî de bi qasî 200 pirtûk û pirtûkokên kurdî çap bûne. Di nav van de, di gel afirandinên nivîsevanên me yên navdar, afirandinên nivîsevanên nûgihîştî jî hene. Eva han kurtelîsteyeke wan e.

K. Bedirxan

Destpêka Xwendinê

Rêzana zimanê Me

Azadbûna M.Karataş

Perçeyên Bijarte

Hedîsên Cenabê Pêxember

Tefsîra Quranê
Alfabe

Cegerxwîn
Dîwana Yekan
Sewra Azadî
Ronak
Zend Avista
Şefaq
Hêvî
Aştî
Tarîxa Kurdistan, 2 Berg
Folklorê kurdî
Reşoyê Darê
Helbestên Bijarte
Cîm û Gulperî
Salar û Mîdya

O. Sebrî
Apo
Elîfbêya Tikûz

M. Emîn Bozarslan
Jîn 5 Berg
Alfabe
Meyro
Gurê Bilûrvan
Kêz Xatûn
Mîr Zoro
Serketina Mişkan
Masiyê Bejê
Melayê Meşhûr
Pepûk

Rojen Barnas
Heyv li Esmânê Diyarbekirê

Mahmut Baksî
Zarokên Ihsan
Keça Kurd Zozan
Hêlîn
Gundikê Dono

Bavê Nazê,
Stokholmê te çi diytiye bêje
Hêsir û Baran
Çiyayên bi xwînê avdayî

Mehmet Uzun
Tu
Mirina Kalekî Rind

Ş. B.Soreklî
Wendabûn
Em û Pirsê me
Azadbûna M.Karataş

D. Îzoli
Ferheng, kurdî-tirkî/tirkî-kurdî
Jiyana Li Kurdistan
Lêgerîn Li Kurdistan

Firat Cewerî
Êrtîş Dikin
Mezin Dibim
Dê Şêrîn e
Girtî

Û HERWEHA

Çiraya Azadî, F.Şakelî
Bêbextî, Mêvan
Dengê Roja Dil, D.Şerho
Bakur, H.Reşo
Şîn û Şadî - Dilistan,, S.Botanî
Berevoka Helbestvanên Kurd, A.Balî û
Rohat
Soro, Birînda
Zeviyê Soro, N.Şemdîn
Mişexta Çiya Ji Gotinên Pêşiya,
M.M.Dêrşewî
Zembîlfiroş, Cankurd
Ferhengoka swêdî-kurdî, R. Zilan

WEŞANXANEYÊN KURDÎ

Di van çend salên dawîn de, li Ewropayê, weşanxaneyên kurdî tîndarî mezinandin. Hejmara wan, bi taybetî jî li Swêdê, her ku diçe zêdetir dibe. Li vê jêrê, listeyeke wan û herweha afirandinên ku wan weşandine, tete pêşkêş kirin.

Roja Nû
Zozan, Casimê Celîl
Kilam û Meqamêd Cimeta Kurda, Cemîla Celîl
Dimdim, Ereş Şemo
Tarîxa Edebiyata Kurdî, 2 Berg, Q. Kurdo
Alîko û Baz, Baran
Di Reya Cegerxwîn De, Gundî
Şêxê Sen'an, F.Teyran
Daxwazname, Namî
Desên Zmanê kurdî, Baran
Şervanekî Biçûk ê Vietnamî, N. Than
Dîwan, Melayê Cizîrî
Nûbar, Ehmedî Xanî
Mevlûd, M. Bateyî
Em û Dijmin, S.Keleş
Cegerxwîn 6 pirtûk
Azadî û Jiyana, K. Burkay

Siyabend û Xecê, T. Reşîd

Komkar
Zimanê Kurdî, Q Kurdo
Jiyana Dîmitrov, A.Balî

Weşanxana Çanda Kurdî
Alfons û Cinawir
Keça Şerrût Lotta
Pîppî ya Goredirêj
Belê Lotta Karê Bajo
Ma Tu Tirsonekî Alfons Aberg
Binêre Madîkan, Berf Dibare
Ma Gakûvî Kûçikan Dixwin?
Arhuaco- Sierra Nevada
Şevbaş Alfons Aberg
Emîl Mîha Nivçe
Kino Digot, Li Wê Derê Binêre
Kino Digot, Alîkarî Bikim
Alfonsê Şîr
Gava Rindikê Dixwest Şûmiyan Bike
Kî Alfons Rizgar Dike?
Sampo Lapecan
Pisînga Ku Wenda Bû
Kurdîrê Helez
Bavo, Were Derve
Şûmiya Zîrek ya Hejmar 325
Kela Jînê
Tuan
Reş, Spî û Hemû yên Din

Jîna Nû
Dengê Xêzikan, Mamoste
Ronahî
Roja Nû
Jiyana Reşenbîrî û Siyasî ya Kurdan Celîlê Celîl
Komara Demokratî a Kurdistan,
K.Husamî
Ferhenga Dimilkî-Tirkî, Malmîsanij
Agirê Sînema Amûdê, Namî
Na Xumxum a..., Keyo Berz
Herakleitos, Malmîsanij
Hêsir û Baran,, Bavê Navê
Dîwana Rûhî, Ş.E.Axtepi
Rojnamegeriya kurdî, Malmîsanij û
M.Lewendî
Şairên Klasîk ên Kurd, A.Yusuf

Orfeus
Çirokên kurdî,, R.Lescot
Mirina Kalekî Rind,, M. Uzun
Gundikê Dono, Mahmut Baksî

Dengê Komal
Qolinc, Torî

Tu, M.Uzun

Haykurd

Bihizire, Bigere û bibîne. A. Cantekîn
Pênc Sehkarên Me, A. Cantekîn
Em Hîn Dibin, A. Cantekîn

Weşanên Pale (nemaye)

Sewra Azadî, Cegerxwîn

Ronahî (nemaye)

Şiivanê Kurd, Erebe Şemo
Zewaca Bê Dil, Î.Dûko
Reoyê Darê, Cegerxwîn
Helbestên Bijarte, Cegerxwîn
Tembûr, F. Teyran
Helbestên Kurdî, Ronahî
Mesele û Metelokên Kurdî, O. Celîl û C. Celîl
Manîfêsta Partiya Komunîst, K. Marx û F. Engels

Bahoz (nemaye)

Memê Alan, N.Zaza
Dîwana Yekan, Cegerxwîn

Weşanxana Kurdistan

Aştî, Cegerxwîn
Ziviyên Soro, N.Şemdin
Berban, E.Şemo
Nehc-ul Enam, M. X. Sêrtî

Weşanên Berxwedan

Dengê Şoreşî, Dilsoz

Weşanên Welat

Keça Kapîtan, Pûşkîn
Mirina Karmend, Çêxov

Weşanxana Hawar

Hawar Berg I

Weşanxana Çand

Aladîn û Lampeya bi Efsûn

Weşanên ku bi destê dezgehên dewletê yê swêdê hatine çapkirin:

Ji bilî weşanxaneyên Kurdî, hin dezgehên resmî yê dewleta Swêdê jî hene, ku bi kurdî pirtûk û materyalên enformasyonê diweşînin. Bo nimûne:

Sil-Daira dewletê ya ji bo enformasyonên li ser navgînên xwandinê

Em Bixwînin
Em Binivîsin

Pîrê û Çûk

Lîstikên kurdî

ABC kurdî

Fêrbûna Zimanê kurdî-Tîpên Dengdar

Zeman

Ferhengê Swêdî-kurdî

SIV- Daira Karûbarên Biyanîyan ya Dewletê

Hîn kasê û film û herweha gelek broşur, namîlke û belavokên enformasyonê.

Hewce ye mirov bibêje, ku kwalîta teknîkî ya çapemeniyên kurdî roj bi roj baştir û çêtir dibin. Me hêvî heye, ku ew ji aliyê ziman û naverokê de jî bi gavên fireh ber bi çêtirbûnê herin.

Li aliyekî din de pêşveçûna ziman ne bi tenê bi çapkirin û weşandina kovar û pirtûkan ve girêdayî ye. Heçî pirsê perwedekirinê ye, roleke mezin tê de dilîze. Ji vî aliyê de tiştê şayanî behs ew e, ku di dawîya salên 60-î de li Swêdê reformek bû. Ji vê re reformê zarokên ku zimanê wan ne swêdî ne, keysa xwandina zimanê xwe yê zikmakî bi dest diêxin. Kurdan jî vê reformê cara pêşîn di sala 1975-an de îstîfade kirin ne. Ji xwandina payîza 1975-an û bi vir de zarokên Kurdan jî bûne xwedî maf ku di zimanê xwe yê zikmakî de xwe perwerde bikin. Di gel vê, di sala 1984-an de beşa kurdî li xwendegeha bilind ya mamostetiyê vebû. Ew beş heya îro jî her maye. Ta niha, yê îsal jî tê de, 30 hevalên Kurd yê ji perçeyên cihê cihê yê Kurdistanê, xwandina xwe ya mamostetiyê kurdî lê dawî anîne. Herwekî bazara kar ya Swêdê jî dide diyar kirin, hîn pêwîstiyê mezin jî bo mamosteyên kurdî heye.

Ji bilî van, pêwîst e, bibêjim, ku ta niha li Ewropayê jî 250-î bêtir kasê jî

10-an bêtir sêlik û bi qasî 10 liban jî filmên vîdeoyê hatine derêxistin. Lê bêguman, di vî warê de bi destxistina hejmarên misoger gelekî diyar e.

Ji aliyê weşinekên kurdî yê radyoyê de jî pêdivî ye diyar bikim, ku îro li van bajaran, weşinekên radyoyê hene.

* Sydney (Awûstralya)

* Berlîn (Almanya)

* Dortmund (almanya)

* Fransa

Heye ku li hin devêrn din jî weşinekên kurdî yê radyoyê hebin. Lê min nedikaribû di maweyê hinde kurt de bi ser û berî li vê pirsê bikolim.

Di warê çapemeniyê de, nemaze yê li Amerîkayê û li hin welatên din, zanyariyê me yê heya gelekî kîm in. Ev pirs jî pêwîstî lêkolînê ye.

Di dawiyê de dixwazim bi kurtî bibêjim, ku dibe ku em hîn rastî gelek navên din yê çapemeniyên kurdî, bi zaravayê kurmancî, nebûbin. Ji lewre hêvîdar im, ku hûn vê kîmasiya min bidin binlingan û li min biborin

Gelekî sipas!

TÊBÎNÎ:

Min ev kurtelêkolîna jorîn wek gotarekê di konferansa Stockholmê de pêşkêş kiribû. Mixabin ku ji ber lez û bezî, hingê keysa min tune bû ku ez di demeke welê pir kurt de li vê babetê qenc bikolim. Vê gavê di vî warê de hin agehî û zanyariyên nû ketine destê min. Lê ya rastî min nexwest, ku ez dest bidim goterê, tiştêkî lê kêma yan jî zêde bikim. Min dil heye, ku ez di rojên pêş de vegerim ser vê babetê, bi bêhneke fireh û ji nû ve li wê bi ser û bertir bikolim. Piştî encama wê jî di pirtûkeke piçûk de biweşînim.

RADYOYA KURDÎ LI SPÅNGAYÊ

Ji bo navçeya Stockholm Järva

Rojên Şembi, saet 18.00 - 19.00 li ser pêla FM 91.1 Mhz

Ji bo navçeya Stockholm City dubare dîke.

Rojên duşemî, saet 13.00 - 14.00 li ser pêla FM 88

Ji bo agahdarî û daxwazên we, navnîşana radyoyê:

Komela Kurd li Spångayê

Box: 4118, 163 04 Spånga, tel: 08-761 51 22

AXAWÛKÊ BÊDARÎ

Ebdulreqîb Yusif

Axawûk, helbestvanekî Kurd ê ji bîrkirî ye. Heta niha me navê wî qet tu serkaniyek dîrokî û edebîyatê de nedîtiye. Her wiha helbestên wî jî negihane destê xwendevanan û me nebihîstîye ku hatine weşandin jî. Min jî heta par navê wî sehnekiribû û ji ber vê min di "Dîwana Kurmancî" de (ev kitêb bi navê "Helbestvanên Klasîk ên Kurd" ku ji aliyê Weşanên Jîna Nû ve li Stockholmê hatiye weşandin- Elîşêr) behsa navê wî nekiriye.

Ne tenê Axawûk yekem helbestvanê Kurd ê jibîrbûyî ye, yan jî nehatiye nasîn. Dibe ku helbestvanên din ên wek wî jî hene ku nehatine nasîn an hatine jibîrkirin. Wek Maçîn, Mîna, Sadiq û Sîyapûş ê xwedîyê kitêba Seyfû'l-muluk û Bedr'ul Cemal ên bi zarava Kurdmancî bi helbestên mustewa bilind hatine nivîsandin. Her weha Sûwadi yê xwedîyê Leyl û mecnûn ê bi Kurmancî û Selîm ê xwedîyê Yesuf û Zuleyxa, yê bi kurmancî hatine nivîsandin, heta niha li ser serpehatiyên jiyana van helbestvanan nehatine nasîn û nivîsandin. Belê Axawûkê Bêdarî jî her wek me got yek ji van helbestvanan e. Lê piştî ku karî hinek helbestên wî jî derve dest bixin, wê demê me zanî ku Axawûk ji xelkê gundê

*Sed mixabib vê cewabê ez ji dil nalan kirim
Taqet û quwet nema min belkî ez ez bê can kirim
Leşkerê derdan geha min ji aqlê talan kirim
Min nema qet xew bi carek bê ser û saman kirim
Min du şahî çûne vêkra muhtelayê wan kirim.*

*Wê dema mesmû'ê min bû hucreta cuhtê kuran
Xem li ser piştî me hadir bûne barê giran
Sitrê nabim ez tu car êdî ji vî barê giran
Rîş û reh herdu me şîlbûne ji ava hêstiran
Firqeta wan sorgulan ez bê 'eded giryan kirim*

Bêdarê ye ku dikeve navbera navça Xesxêr (Perwarî) û Miksê yê başûrê Gola Wanê û Bêdar jî gundek mezin û bi nav û deng e.

Helbestvanê me di sedsala 18'an de jiyaye. Hevçaxê Sûwadi bûye û gihîştîye dema Ehmedê Xanî jî. Em vê yekê jî ji helbesta wî ya ku tê de sala 1140'ê koçî (1727-1728'ê zayînî) derbaz dibe, dizanin. Axawûk vê helbestê xwe di meha nîsana wê salê de ji ber mirina du kurên xwe, di rojekê de nivîsandîye. Helbestvanê me wiha dibêje:

*"Herdu rojan heq li ser min ev mûsîbet anîye
Sal hezar û sed û çil çûne ji hucra ûmmîye"*

Her weha mirina herdu kurên Axawûk di rojekê de bi ser hev, bûye sebebê zanîna dîroka jiyana bavê wan.

Helbestvanê me nîsana xwe di helbestên xwe de bi "Xeyn Elif" daniye, yanî "Axawûk" daniye, yanî "Axawûk", lê em nizanin Axawûk navê helbestvanê me ye yan leqebê (nasnavê) wî ye.

Helbestên wî helbestvanî, rewan, sade û xweş in. Her wek ku daxwaza wî ew be ku van helbestan jî bo kesên nexwenda û sade binivîse, bi wî awayî li helbestên Feqîyê Teyra diçin. Ji ber ku ne dîr e ku Axawûkê Bêdarî îstifade ji helbestên Feqîyê Teyra wergirtibe û di rêya hûnandina helbest de ji xwe re kiribe mamoste, ji xwe ew herdu jî ji xelkê yek navçê ne, yanî ji navça Miksê ne.

Ev du perçên ji helbesta Axawûk ku niha em ê li jêr belav bikin, nimûneyek ji helbestên wî ye û ev jî li ser mirina herdu kurên xwe yê ku di rojekê de û di salên xwe yê sêzdeh û panzdehan de mirine, nivîsandîye. Cenazê (termê) wan di yek rojê de bi hev re hatine veşartin. Wek em ji helbestê dizanin ev roja han a reş, roja şemîya (wek helbestvan bi xwe dibêje) meha nîsanê ya sala 1140'ê koçî(hicrî) bûye.

Bê guman mirina wan herdu kurên wî li ser hev, ezîyet û azarê gihandiye helbestvan û ji ber vê heta dibêje "xwezî ew cût kur û cût sorgul li ser min girîyabûna ne ez li ser wan".

Ne dîr e ku mirina wan bi wî awayî "tesîrek" kiriba ser helbestên Axawûk ku ev yeka han bi awakî wisa be ferqek di navbera berê mirina kurên wî û piştî mirina wan hebe.

*Ey Rebbê 'alem tu î derdê li halê min pir e
Min ji xanî çûne vêkra rojekî cûhtê kur e
Ger weled 'ar e welakin ew li nik babê dîr e
Cewherek xelkê biyanî bûn sîrîn sor e (1)
Vê demê din û teles ez hewceyê dêran kirim*

*Herdu rojan heq bi ser min ev musîbet anîye
Sal hezar û sed û çil çûne ji hucra ûmmî ye
Mehê Nîsanê ku roja reş li min bû şembî ye
Lazim e her çî ku heq ket em bûyê bin radî ye
Lêkî wan derd û zeman bê daniş û ez'an kirim*

Herdu rojan wan bi yek ra datye terka cîhan
Yek di sala sêzdehê bû yek di sala panzdehan
Ey xwezî ew herdu bigrîyan li min ne ez li wan
Sitrî nabim ez tu car ji hesreta cûhtê kuran
Hucreta wan sorgulan ez bê 'eded giryan kirim

Qet ji dil nayête der tîra di dil tîra kulab
Min birîna dil di dev da derbûye jê tê 'edab
Sîne ateş danî fro dil di wê da bû kebeb
Lew dinalim bê qiyas û lew dikalim bê hisab
Vê gulanê ez ji seyra sorgul û werdan kirim

Min divê 'îsê bibînim dê ji ku peyda bikim
Min birîna dil xefe 'esseh bizan xweş nabitin

Dê bi-derd û xem bimînim ta qîyamet rabitin
Ger di heşrê da bibînim wan ku dil pê şa bitin
Lê te ta yewmu'l qîyamet muensê derdan kirim

"Xeyn Elif" bes ke ji nal û zarî û aha derûn
Ew qezaya Borî ye ma kes li wî çû kit birûn
Sa'etek te'xîrê nabitin wela yesteqdemûn
Herçî heq kit ew heq e inna êleyhî raci'ûn
Lê ji derd û hesretan ez bê 'eded giryan kirin

(1) Di vê rêza han de kêmasî heye.

Ev jî perçek din ji helbestên Axawûk e

Dê werin dê jê birevin lewra ku mekar e dinê
Nêrgîza me serçivîn bê şerm û bê 'ar e dinê
Em bi xwe pê nakevin elbete ev car e dinê
Hindê dilsozê hev in dilkuj û xedar e dinê
Hûn werin jê derkevin lê ne wejadar e dinê

En dinê merdê vexunê cahil û nadan e ew
Heta dikit dîsa vejîne sufl ew gavan e ew
Ê ku xwe tê da hejîne yê ne daye nan e ew
Ê xwe tê kamil dibîne ew ji dil çolan e ew
Ji ehlê fedla 'aliman lew hind bêzar e dinê

Ê te can dayê di berda ew ji te naradî ye
Dost ew e yê bûbê kuştî lew zemanê madî ye
Ê ku naşerî li nik pir ez dibînim qadî ye
Sed huner ger te hebin a qenc niha xerbazî ye
Bifikrê carek bibîne çendî bedkar e dinê

Ceddê insan Adem e yê ku ji tînê çêkirî
Terkê cînnet da ew ew hate cîhanê vêra girî
Ew nebîyê 'erd û 'asman hem ji bo wî çêkirî
Qencîyek tê de nedî lew çû ji rewde êwirî
Bifikrê carek bibîn pir xol û xeftar e dinê

Kar û barê vê dinê eslen nehin bê derd û xem
Şahîyek kî dî dibîra wî nedîtî sed elem
Tu nezer de Şahê Îranê di iqlîmê 'Ecem
Ibnî bîntê wan di dinyayê bûyin 'ebd û xedem
Hêj li ba me 'amîyan dilsojî xemxwar e dinê

Ey nezerbaz û mumejîz hem ser û hem teb'e zîşt
Eblebê na ehlê nabîna li nik hura bihişt
Ey miwafiq yek di gel bê mirwetî halek nehîşt
Yek bi hesret ma ew ê dîtir bi mehcure dikûşt
Hûn weri terkê bidin lew kevne dîwane dinê

Salê ewwel tu dibîni yek bi mislê şahekî
Salê sanî tu dibîni bûye qol dergaheki
Salê salîs ew bi qîmet qet nehêja gayekî
Salê rabî'i tu dibîni bûye toza raheki
Hindî ku min tecreb kir bê şek xwezî pare dinê

Ey cefakêş û sefaçûn bûne derwêş û geda
Ê li mala xwe nivstî debr û xel'et lê qeda
Ê ji min axa ye îro çadira xwe li hir veda
Ev dinê me'sum e vê 'esrê bi teqdîra Xweda
Lew dikim vê gotinê pir sok û bazar e dinê

Rêz û tertîbê ji xanê çûn ji dunyayê revî
Herduyan ser pêk ve danîn mişweret bûne xefî
Makxwûyî axayê gundan bûne lawê serkeftî
Rihspî bûne şivan lew tenê gundan nîşevî
Ya qenc ew e terk bideyn lewra ku xedar e dinê

Hindî xas û enbîya eslen nemane "Xeyn Elif"
Hetem û Cemşîd û Keyxusro ku cane "Xeyn Elif"
Rustem û 'Enter di gel gêwî xweyane "Xeyn Elif"
Kar û barê vê dinê ya Reb ku san e "Xeyn Elif"
Hêj di gel 'ebdek Xwedê sadiq nebû ya Reb dinê

Ev helbesta han a dawiyê di hejmara 50'an ya Rojî Kur-
distan a sala 1987'an de hatiye weşandin. Lê mixabin em
nizanin perça destpêkê ya ku behsa jiyana Axawûkê Bêdarî
dike û perça helbesta pêşî, ka di kîjan kovarê de hatiye
weşandin.

Ji tîpên erebî wergerandin: Elişêr

KURTEÇÎROK

DILOP

M. ALÎ K.

Dipa! Tarîfî, şev dipa! Li benda aveçûna rojê û tarîtiya şevê bû. Ji bo ku bikaribe derkeve der, bigere û hinek hewa paqij bikşîne cîgerê xwe, aveçûna rojê û tarîtiya şevê pêwîst didît...

Tenê tarîtiya şevê dikaribû ew veşarta, ew ji ber çavan winda bikira; da tu kesî ew nedîta...

Gelek caran li reşkê şevê dikir hawar; da hinekî din şevê dirêj bike, ji bo ku bikaribe xwe bigihêjanda şikefta xwe. Te digo qey carina reşkê şevê dengê wî dibihîst û teşîya xwe hêdî hêdî dirêst û giloka şevê dom dikir, şev dirêj dibû; wê çaxê ew jî, berî rohilat digihîst cihê xwe...

Di şikefta xwe de, li ser cihê xwe dirêjkirî difikirî: Di tarîtiyê de ronahî difikirî, di tenêtiyê de mirov difikirin. Li ser cihê xwe ramedandî dengê dilopên şikeftê dihatinê, şikeftê dilop dikirin... Dilop fikirin. Hinekî wilo domand fikirina dilopan. Li xweşa wî diçû dengê wan. Dilopan ew ji heqîqetê bi dûr dixist, ew paşde vedigerandin; rojên bihûrî, zarotiya wî tanîn bîrê...

Xilmaş bû, serê wî tewiya ser balgiha ku ji pûş çêkirî bû. Ev balgiha ji pûş niha bûbû balgihek ji hiriyê û rûwek hîzar li ser bû, dora wê ji neqîşandî bû. Doşeka wî bostekê ji erdê bilind bû, ew jî ji hiriyê bû; lihêfek ji hiriyê ji bi ser de dakirî bû...

Niha, li ser nivînên xwe ramedandî dengê dilopan dihatê. Dilopan digot: "Niqq.. niq.. niq..." Zivistan bû; belê zivistan bû wexta ku di nava nivînên xwe de ramedandî dengê dilopan dibihîst.

Wê şevê ji erd û ezman baran dibarîya, ji ber vê jî xaniyê wan dilop dikirin. Diya wî firaxê ku di malê de hebûn tev danî bûn bin cihê ku dilop dikirin; tepsik, legan, teşt û beroş... Yek ji leganan jî danibû ber serê wî; ji ber ku wêderê jî dilop dikir...

Li ser piştê vezilandî, li siryaqa xênî dinêrî. Li beştên telo-melo û mirdyaqan meyze dikir. Ji dixana agirê ku di hundirê malê de dibe tev reş bûbûn. Hinekî wisa li siryaqên xênî temaşe dikir. Buhar dihate bîrê, zarokên hevalên xwe bi bîr dihanîn; dema ku tev de diçûne çolê, kereng diçûnin difikirî... Xweşîya buharê difikirî, wexta ku ji çiçekan tacek dirêst û dida serê xwe...

Pîvok dihatine bîrê: "Ew serikê wan yên spî ca çiças xweş bû..." Ji nişkê ve berxikê xwe Kudik bi bîr dihanî. Bi lez dixwest ku vê fikrê ji serê xwe bavêje; lê xilmaş dibû, indî di xew re diçû...

Çaxê buharê bû, genim seridî bûn. Wê rojê dîsa bi çend hevalên xwe re li ber berxikan bû. Berxik li nava zewiyên nêzî xetê diçêrandin. Haya wan ji bayê felekê tunebû. Berxik xwe serî xwe berdabûn û ji xwe re dileystin; bi botika şivanan dileystin. Botik ya wî bû; paçek li ser çavên wî girêdayî, bi virde-wirde dibezîya ku hevalekî xwe bigir e. Dawî hevalekî xwe digirt. Destekî wî hêj bi kincê hevalê wî ve û bi destê din dikir ku paçê ser çavên xwe hilîne, ji nişkê ve qupîna tivingekê ew di cî de mat dihişt. Bi lez paç ji ser çavên xwe hiltanî û tev da li aliyê ku dengê tivingê jê hatibû dinêrîn! Leşkerê ku notirvanê xetê bû, berxikek wa yî ku nêzîkî tîlên sînor bûbû, kuştibû. Bi lez berxikên xwe yên din dicivandin û ji wêderê bi dûr diketin. Wî di tunebûna Kudikê xwe de zû derdixist; Kudikê wî li ser xetê hatibû kuştin, termê wî li wir bû. Kelogirî reya malê digirt, baz dida...

Ji nişkê ve ji xew vediciniqi! Hinekan li deriyê mala wan dida; ji dengê wan fam dikir ku Romî ne. Ji nava nivînên xwe derdiket û diçû hişk bi dawa diya xwe digirt. Bavê wî radibû, diçû derî vedikir. Bi vekirina derî re, sê-çar Romî pevra diketin hundirê malê. Sisîyan ji wan mal saxtî dikirin û yek jî dihat ji bavê wî pîrsa wî dikir, digot: "Ka! Kurê te li kuye?...". Ew hîn bêtir ditirsiya û xwe di nava kirasê diya xwe de vedîşart. Romîyan hundirê malê qul bi qul saxtî dikirin, dawîn yekî ji wan ew di nava kirasê diya wî de deşif dikir û li Romîyên din diqîriya, digot: "Werin! Vaye, min mehkûm zeft kir!..." Romîyên li hundir hemû pevra, fena teyrên mirara ku çawa ji hewa xwe dadin ser laşê heywanek mirî yî li erdê, wilo xwe dadidan ser wî! Yekî ji wan bi çepî wî digirt, ew diqîşand û yê din jî destê xwe bilind dikir sewtak li bin guhê wî dixist...

Gava ku ji xew çemd bû, dît ku dilopek ji bin zikê şikeftê bi ser eniya wî de ketiye... Hinek ji ava dilopê herikî çavê wî, çavê wî fena ku barût ketibûyê, ji ava dilopê jenî...

Çewt nivîsandina navên
hinek rêxistin û weşanên

KURDAN

Piraniya navên partî, rêxistin û weşanên me Kurdên Kurdistanê Bakur bi kurdî ne. Lê hezar mixabin zimanê van rêxistin û weşanên me bi tirkî ye. Lê belê, ez nexwazim li ser zimanê wan yê bi tirkî rawestim; ez dê hinek li ser çewt û rast nivîsandina navên wan hûr bibim û di vê mijarê de çend mînakên berbiçav bidim. Wekî ku em hemû pê dizanin li welêt bi kurdî nivîsandin û xwendin qedexeyê ye. Ji ber vê yekê jî kurdî bi devkî dimîne. Her kes bi devoka herêma xwe daxive. Û herweha bê hejmar devok derdikevin holê. Di hinek devokên herêmî de parekên paş û pêş û daçek di pratîk û axaftina rojane de neyên bikaranîn. An jî çewt tê bikaranîn. Û di hevokên tewanbar de bêjan natewînin. Ya yekemîn dema rêxistin û weşanên me nav li xwe dikin di bin tesîra vê devoka herêmî de dimînin. Ya duyemîn ku ya herî girîng jî ev e, dema nav lêkirinê de bi tirkî difikirin û paşê ew werdigerînin kurdî. Wê çaxê çewtî û şaşî çêdibin. Ya sêyemîn jî di bin tesîra Kurdên Kurdistanê Başur û Rohilat de dimînin û li gor wan nav li xwe û li weşanên xwe dikin. Wê çaxê jî nav dibe niv soranî û niv kurmançî. Ji ber ku bi soranî gelek daçek, paş û pêş parekan bi kar nayênin. Hevokên tewanbar nîne û bêjan natewînin. Lê di kurmançî de pêwîst e, ku di hevokên tewanbar de bêje bîn tewandin. Û dîsa dizaravayê soranî de bêjeyên nêr û mê tunene. Ew jî bo herdu zayendan jî "î" bi kar tînin. Mînak: Mala min bi soranî dibe malî min. Xaniyê min dibe xaniyî min. Kurdistanê me, dibe Kurdistanî me. Partiya Demokratî Kurdî Kurdistanê, dibe Partî Demokratî Kurdistan. û h.d.

Ji ber van çend sedeman piraniya navên partî, rêxistin,

weşanxane û weşanên Kurdistanê Bakur çewt hatine lêkirin û nivîsandin. Ez dê niha di vî warî de çend mînakên berbiçav berpêşê we xwendevanên heja bikim.

Navên çend partî û rêxistin:

Tevgera Rizgariya Kurdistan, Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistan, Partî Demokratî Kurdistan, Partî Karkerî Kurdistan, Tevgera Sosyalîsta Kurdistan, Partiya Rizgariya Kurdistan, Federasyona Komeleyên Kurdistanê li Swêd, Enstîtuya Kurdî ya Parîsê û h. d.

Bi ya min divê mirov weha binivîse:

Tevgera Rizgariya Kurdistanê, Artêşa Rizgariya Gelê Kurdistanê, Partiya Demokratî Kurdistanê, Partiya Karkerên Kurdistanê, Tevgera Sosyalîsta Kurdistanê, Partiya Rizgariya Kurdistanê, Federasyona Komelên Kurd li Swêdê û Înstîtuya Kurd li Parîsê an jî Înstîtuya Kurdî li Parîsê....

"Enstîtu" li gor bilêvkirin û grametîka zimanê Tirkî ye. Tirk, hinek bêjeyên ku bi tîpa "î" dest pê dikin, dema wan ji zimanê biyanî werdigrin; "î" ya destpêkê dikin "e".

Wek:

Enstîtu, emperyalîzm, enflasyon, enformasyon û h. d.

Navên çend kovaran:

Riya Azadî, Dengê Komkar, Dengê Kurdistan, Rêya Şoreş, Dengê Şoreş

Rastnivîsandina wan:

Riya Azadiyê, Dengê Komkarê, Dengê Kurdistanê, Riya Şoreşê, Dengê Şoreşê...

Çend slogan:

Bijî 1 (yek) Gulan!
Bijî Azadiya Kurdistan...

Rastnivîsandina wan:

Bijî 1ê (yekê) Gulanê!
Bijî azadiya Kurdistanê!

Amed Tigrîs

Fîlimeke Kurdî

ASO

Çend meh berî niha Li Swêdê bi navê Aso filimekê kurdî hat çêkirin. Niha jî ev filima ha girtine kaseta videoyê. Dengê kasetê bi kurdî ye, lê textên wê bi swêdî hatine nivîsandin. Senaryo û rejîya filima Aso ji aliyê hunermendê Kurd Salman Kakayî ve hatiye nivîsandin û amadekirin.

Bûyer û mijara (babeta) filimê li Kurdistana Başûr (Kurdistana Îraqê) derbas dibe. Mijara filimê leşkerên rejîma Îraqê çawa li ser gundiyan Kurd zulm, zordestî û êşkencekirinê ye. Senaryovan û rejisorê filimê dixwaze beşekê biçûk ji wê jîyana gundiyan û zulm û zordariya rejîma Îraqê bîne pêş kamara axwe û wê ji bo temaşewanên xwe bike ser perdeya sînemayê.

Dema mirov bi çavekê rexnegirî li filima Aso binêre, gelek tişt û aliyên pozîtîv û negatîv têde dibîne. An jî bi gotinekê din ji her alî ve çakî, serfirazî û çewtî û kêmasî hene. Heger mirov aliyê pozîtîv bigire:

Cara yekem li derê welêt hewldana komkirina filimçêker, artis, kameravan, teknîsyen û hunermendên kurd bi serê xwe karekî gelek çak e û gavekê gelek girîng û pêşkeftî ye. Ya duyemîn mijara filimê yanî jîyana Aso û gundiyan, mijarekê di cih de ye û hêja ye ku mirov wê bike mijara filimek. Ya sêyem li Swêdê çêkirina gundekî Kurdistanê bi rastî karekî hunermendî û pêşeyî ye. Çêkirina gund û jîyana gundiyan di filimê de baş diyar û zelal e. Di filimê de gund û gundî tam li hevdu hatine. Lîstîkvanên Kurd her çiqas amator û nû bin jî, lê dîsa rolên xwe baş dileyzin. Bi kurtî filimekê bihna Kurd û Kurdistanê jê tê.

Lê dibe ku hinek kes bibêjin "ma hîç kêmasî û çewtiyên wê nîne?"

Belê, kêmasî û çewtî hene û hem jî çawa! Wekî temaşevanekî filimê, ew çewtî û kêmasiyên ku min dît û an jî ez li ser hizirîm bi kurtahî weha ne:

Di herêma Kurdan de yek an du serbaz (leşker) bi tenê rê kontrol dikin. Hem jî qerekol nîne. Mirov nizane ku ew serbazên kîjan dewletê ne. Hîç nebûya qereqolekê çêbikira, ala Îraqê lê

Siverek'te bir gece vakti

Bîrewerî

Xorto

Weşanxana Apec-Tryck

Xorto, Nivîskarê wê pirtûkê, bi kurtî di dawîya salên 70'î de, rewş û bûyerên şîyasî ku li bajarê Stweregê qewimîbû û bi sedan kes hatibûn kuştin, dide xuyakirin. Pirtûk bi zimanê tirkî hatiye nivîstîn û 121 rûpel e.

O bir dağ çiçeğiydi...

Bîrewerî

Xorto

Weşanxana Apec-Tryck

Ev pirtûka li ser Necmettin Büyükkaya hatiye nivîstîn. Şoreşger û welatperwerê Kurd Necmettin Büyükkaya, di 23 Çile 1984'an de, di zindana Diyarbakirê de bi îşkencê hate şehîtkirin. Ev pirtûka jî ji aliyê Xorto û bi zimanê tirkî hatiye nivîstin, 123 rûpel e.

Adresa xwestinê ya her du pirtûkan:

Apec-Tryck

Box: 3318

163 03 Spånga/Sweden

Çağdaş Türk Edebiyatında Kürtler

Lêkolîn

Rohat

Weşanxana Vejin

Rohat, di wê lêkolîna xwe de bi çavekî rexnegirî, di edebiyata tirkî de bikamîna temaya Kurd, dide xuyakirin. Kurdnasê Hollandî, Martin van Bruinnessen pêşgotina pirtûkê nivîstîye. Pirtûk 200 rûpel e û bi zimanê tirkî

bida û çend serbaz hebûya. Filim bi zaravayê soranî ye û hem jî soraniyekê giran e!

Gund û jîyana gundiyan piçek ji rastîya îroyîn dîr e. Wek gund û gundiye 40-50 sal berî niha bin. Felsefa xizantî û belengaziyê di filmê de hakim e. Mameste û mela rola xwe ya ronakbîrî û netewî baş bi cih nayin. Di filimê de gundî li ser kevirê êzing dişkine an jî hûr dike. Divîya di şûna kevirê de darek bida bin wê. Aso gelek fidanên datîne, lê fidan hîç hêşîn û mezin nabin. Mêwe nagirin! Her hişk û wek xwe ne. Gund bê organize ye. Têkilî û agahdariya gundiyan bi pêşmergan an bi hêzên şîyasî re hîç nîne. Çalakiya wan a li dij qereqolê jî bi serê xwe ye. Gelo çima? Di tewr û şêla Aso de weha diyar dibe ku ji bo pêşmergeyiyê

hatiye nivîstîn.

Adresa Xwestinê:

Vejin Förlaget

Box: 39122

100 54 Stockholm/Sweden

ARDÛ

Kurteçirokên gelêrî

Nivîsende: Hesenê Metê

Weşanxana Welat

Ev pirtûka ji 42 kurteçirokên gelêrî pêk hatiye. Hesenê Metê ev kurteçirokên gelêrî bi şeweyekî edebî ji nû ve nivîstîne. Pirtûk bi kurmancî û 173 rûpel e.

Adresa Xwestinê:

Weşanên Welat

c/o KFH

Box: 4088

141 04 Huddinge/Sweden

Moments/Methods of Torture

The Militay Prison of Diyarbakir

Karikatur

Zülfikar Tak

Weşanxana Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistan.

Metodên îşkencê yên li girtîxanên Tirkiyê, ji aliyê Zülfikar Tak ku ew hê li girtîxanê ye, wekî karikatur hatine çixzkirin û bi textên almanî di pirtûkê de berhev bûne.

Adresa Xwestinê:

YRWK

MAX STR. 50-52

5300 Bonn 1/BRD

xwendin û perwerde ne pêwîst e. Yê ku naxwînin dibin pêşmerge. Yê ku dixwînin nikarin bibin pêşmerge. Aso dikaribû berî bibûya xwendevanekî çak û zîrek û bi wê re bibûya pêşmegekî qahreman jî. Divê û pêwîst e ku senaryovan, rejîsor û nivîskarên Kurd di berhemên xwe de pêşmergeyên nûjen çêbikin, ne ku yê 40-50 sal berî niha. Gelo civata Kurd ji her aliyê ve îro ne hatiye guhertin? Dijmin bi xwe, xwe nû û nûjen ne kiriye?

Bi kurtahî navê filimê û encama filimê hevdu nagre. Nav Aso (şefa) ye. Yanî ronahî û hêvî ye. Lê mixabin encam tarî ye. Bê rêxistinî ye. Fidan hêşîn û mezin nabe. Di dawî de Aso jî dimire. Ango Aso dibe hingur!

Amed Tigrîs

PPKK, PKK, TKP-ML-TIKKO, TBKP..... :

Rojê Ewroyênî Rojê Îmtihandê Dostey ê

H. DILJEN

Hepisiyê siyasî ê Hepisdê Ceyhanî (Kurd û Tirkî) piya beyanatê day. Hepisiyê ma, yê erciyayey na beyanata xo di dek û dolabê ki şardê Kurdistanî ser o virazênê û biheqbiyayîşê xoverdayenda şardê Kurdistanî anê ziwana û dima zî balê şardê Tirkîyay ancenê meseleda Kurdistanî ser û mesûleteya înan anê ci vîrî.

Hepisiyê Hepisdê Ceyhanî, bolkî raveşiyayîşê xoverdayenda şardê ma û na xoverdayeni vero tedbîrê ki dewleti girewtê û nê tedbîran ra zî zafêrî qerar-nameda sirguney û sansorî ser o vîndenê.

Hepisiyê Ceyhanî, di na beyanata xo ya dergi di, sebeb û mexsedê siyasîyê dewleta Tirkî, a ki şarê Tirkîya û Kurdistanî pê-jewbînan rê kena dişmen eşke-ra kenê û faydeyê orte ra werzanayîşê na dişmeney bi nê cumlandê cêrênana îzah kenê:

"Ki Kurdan ser ra zilm û zorkarey werzo, ki Kurdî qedere xo bi xo tayin bikerê û biresê azadey da xo; do him verniya demokrasîda Tirkîya abo, do him zî Tirkîya krîzê ekonomîkî ra bireyo. Do wexto şarê Tirkîya diha çaretokerde (çareakerde) bo û bi ûmîda bewniyo xo vernî ra. Raya na jewerî zî xoverdayenê da şoreşgerkî ra ravêrena".

Hepisiyê Hepisdê Ceyhanî, faydeyê paştîgirotîşê tevgerda Kurdan, şardê Tirkîyarê bi nê

cumlana domnenê:

"Di kolekerdişê şardê Kurdistanî di, menfatêdo werdî, ê şardê Tirkîya çin yo. Labelê zîrarê ci zaf o. Qandê coy, ê ki vanê ma merdim ê, ê ki vanê ma demokrat ê, gerek paştîya xoverdayîşê şardê Kurdistanî, a ki qandê azadî û qederdê xo tayinkerdişî ya, bigîrê. Na paştîgiroteni, do birayeya mabêndê şardê Tirkîya û Kurdistanî ser o zî tesîrêdo zaf gird bikero".

Hepisi, peynî da beyanata xo ya muştereki di veyndanê şardê Tirkîya û înan ra çîyo ki wazenê wina anê ziwana:

"Ma şoreşgerê Tirkîya û Kurdistanî veyndanê şîma û vanê: Teroro reyaperest (rasîst) û şowen, o ki şardê Kurdistanî ser o bêro bikarardiş ver bivijiyê. Ganî ma îzin nêdê ki şardê Kurdistanî ser o wella merdan bireşnê. Ganî ma nêverde şarê Tirkîya, zilm û zorkareya ki bi şardê Kurdistanî rê bena di bi-bo şîrîg û alet.

"Bêrê ma nêverde wa bi milyarana perey, qirda kedkaran ra bibiriyê û bi ci ya sîlehî bigeriyê û pa şarê Kurdistanî bêro kiştîş.

"Bêrê ma, heme siyasetanê înan, ê ki alehdê Kurdan di yenê bikarardiş pûç vejê û bi no awaya dostneya xo şardê Kurdistanî rê îspat bikerê. Rojê ewroyênî, rojê îmtihan di dostey ê."

Beyanata hepsiyan bi nê cumlandê cêrênana na qedêna:

"Nê wezîfeyê corênî heme to

pawenê. Çi ki, tekoşîno millî û demokratîk ê şardê Kurdistanî, eynî wext di ê şardê Tirkîya yo zî.

Xoverdayîşê Kurdan, qandê tevgerda şoreşgerkî û demokratîkî ê Tirkîya potansiyelêdo muhîm o. No potansiyel, qandê tevgerda Tirkîya îmkananê zaf girdî peyda keno. Tevgera şoreşgerkî û demokratîkî ê Tirkîya do nê zemînî ser o ravey şîro."

Bi namedê hepsiyanê Hepisdê Ceyhanî (Tîpo xisûsî) ya:

TIKB (Tahsîn Alpaşar), PKK (Selim Çürükkaya), DEV-SAVAŞ (Hüseyin Gewher), THKO-TDY-DÎRÎLÎŞ (Hasan Akbaba), TKEP (Nihat Şeker), TBKP (Ekrem Ertik), TKP-ML Hareketi (Hüseyin Çapartaş), TDKP (Ilkar Dilcan), KAWA (Fahri Işiksal), PPKK (Mehmet Cibran), TIKH (M. Şah Yıldırım), TKP-ML-TIKKO (Ramazan Kilavuz)

Belê. Hepisiyê ma wina vanê û bi camerdeya, wina pîya sêneyê xo nanê zilm di dişmenî ver a. Ma, ê ki teber di zî hendikê ma ra yeno, ma qîrenê û pêrê vanê "maceracî", "reformîstî", "sosyal şovenî", "mîlliyetçî" û heta heta ma pê kişenê. Eceb ma kamcînî raşt ê? Eceb lingê ma kamcînan hewara yê û ê kamcînan zî raştêda heyatî (jiyanî) ser o yê? Hadê ma kila-wa xo, xo ver o ronê û bifikiriyê!

Qandê hîkaye û şîrandê Kurdî XELATA BERBANGI

Mecmuaya (kovar) Federasyonda Komelandê Kurdistanî, Berbangi, qandê hîkayey û şîrandê Kurdî, bi heme lehçana musabaqeyê akerda. Em ser ra tepya do qandê hîkayey û şîrandê erciyayan xelati vila kero.

- * Nameyê xelati, XELATA BERBANGI yo.
- * Hem Kurdê ki welat di, hem zî ê ki teberdê welatî di şenê dekwê na misabaqa miyan.
- * Qandê xelatda Berbangi, do heme lehçandê Kurdî miyan ra hîkayey û şîrê jewinî (yewinî) weçîneyê. Qîmetê xelatda jewinî) 5000 kronê Swêdî yo.
- * Hîkayey û şîrê erciyayey êro do ze kitab bêrê çapkerdiş.
- * Embazê ki wazenê tewrdê na musabaqa bibê, ganî (gerek) heta 30.10.1990 hîkaye û şîranê xo biresnê edresdê Berbangi. Ê ki berey (erey) birîşiyê, nêşenê dekwê musabaqa. Qandê tespît kerdîşdê wextî, morê serdê zerfî muteber o.

ŞERTÊ TEWRBIYAYIŞÊ MUSABAQA:

- 1- Azayê (endamê) jûrî nêşenê tewrdê musabaqa bibê.
- 2- Hîkayey û şîrê ki dekwê na musabaqa, gerek heta nika cayê di çap nêbiyayey bê.
- 3- Şair, ya zî nuştoxê hikayan, gerek nameyê xo yo raştênî, hîkaye ya zî şîrandê xo bin di nêûsê. Herûnda namedê xo yê raştênî di, şenê namena xo ya nê. Nimûne; Ki Mehmet Uzun tewrdê musabaqa beno, herûnda namedê xo di şeno "Rûgeş" binuso. Nameyo raştên û edresê nuştoxî yan zî nuştoxî gerek zerfê do girotî miyan di bo û zerfî sero zî nameyo şîfre binûsiyo. Zerfo grote, hikaya ya zî şîr dekwê zerfê do bin û edresedê Berbangi rê bêro giştîş.

Edrese:

Xelata Berbangi

Box: 45205

104 30 Stockholm/SWEDEN

4- Eserî (berhemî) wahêran rê pey di nêrişênê.

5- Hîkayey û şîrê ki qandê musabaqa birê riştîş, gerek ya bi textiloya, ya zî winî bi awayêna birê nûştîş ki kes ci ra fam bikero. Ê ki nîrê femkerdiş, nêşenê dekwê musabaqa.

6- Hîkayeyên vêşî şenê heta 30 ripêrî dergî bê.

7- Her merdîm şeno qandê musabaqa da hikayan jewî, qandê musabaqada şîran zî jewî birîşo.

8- Xelata musabaqa, do roja 26.01.1991'î di, bi şahiyên a bêro vilakerdiş.

Jurî:

- 1- Şêrko Bêkes
- 2- Heme Saîd Hesên
- 3- Cemşîd Heyderî
- 4- Rojan Barnas
- 5- Mehmet Uzun
- 6- Mahfûz Mayî
- 7- Malmîsanij
- 8- Mustafa Düzgün

MINTIQADA UPPSALA DI KOMÎTEYÊ PAŞTÎGIROTENDA KURDAN AME RONAYENI

KOYO BERZ

Mintiqada Uppsala di Komîteyê Paştîgirotenda Kurdan ame ronayeni.

No komîte, 14.5.1990 di, tewrbîyayenda şeş partîyandê Swêdî ya ame ronayeni.

Bi waştêni û alikareyda nê şeş partîyana kongreyê nê Komîtî ame hadrekêrdini û ronayeni.

Kongreyi komîtî dest pey kerd, labrê bol tay Kurdî amey bî nê kongirî.

Destpeykerdeni di serdarê Komelê Kurdistanî ê Uppsala werişt kursî ser û bi namedê Komelî û Kurdandê Uppsala ya spas kerd û dosteya mîleta Kurdan Swêdîyan rê nişan dê.

Serdarê komîtedê paştîgirotişdê heqdê Kurdan, ê merkezî C. H. Herrmanssonî dest bi qisandê xo yê paştîviyyayenda Kurdan kerd û wina va:

"Ma serrê veror dest bi kar û bardê ronayenda nê komîtî kerd. Nika jî çend sūkandê Swêdî di şûbeyê nê komîtî ameyê ronayeni. Do diha çendna sūkandê di jî bîrê ronayeni. Ma do nê kar û barî heme sūkandê Swêdî ra vila kerê û bi zerî ra û bi nefesdo heraya Kurdan rê pastî bivijiyê û hendik ma dest ra bîro, ma do alikareya înan bikerê."

No komîte vîrfardenda jew serda qetlîamê Helebçe di ame ronayeni û dest bi kardê xo ya kerd.

Şima heme zanê ki Sedamê gûnîşimîtibombeyê jahrî Helebçe di bi kar ardî û 5000 însan şehîd kerd û bi hezaran jî seqet vîstî. Bi sehezaran wardê ci ra sirgûn û talan kerdî. Dew û sūkê Kurdan heme kerdî wêran û talan. Hewna jî cihar heme letandê Kurdistanî ser o, no zilim û zordesteya domkena.

Bi taybetî nê demê bahdoyênan di Kurdistanî corên di tehda, zilim, zalimiyê û zordesteya roj bi roj vêşî bena.

Kamcî dewî û sūkê Kurdistanî sere hewadana û hemberdê zalimiyê di vi-

jiyêna, dişmeno bêbext hima bi hezaran esker, cendirme, polîs, tanq, top û tîfingî rişeno û hereketî herûn di fetisneno, pelîxnenno pêser û birnenno.

Roj bi roj dişmeno, qanûn qanûnî ser o vejeno û virneno hemberdê Kurdan di qanûnanê newey û çetinî ronano.

Çihar heme letandê Kurdistanî ra ma yê xeberî gênê û xeberdar benê.

Ma zanê Kurdistanî coren di no serhewadendo bahdoyên di, Tirkan çî hesaba hereket kerd û çî hesaba nê hereketî, serhewadenî fetisnay û pelixnay pêser û çî hesaba zilm, zalimiyê û zordestey kerdî û çî babeta polîtîkayê xo domna û çî zerar da mîleta Kurdan.

No payizo ki ma vernî di, ma do qandê aşanayenî, pêşanayenî, qandê newan çend heyetan birîşê Kurdistan.

Qandê ki wardê înternasyonal di ma bişê çiyê xo dest finê û raşt zixt berê înan ser. Ma nêşê çiyê xo destfinê ma nêşenê înan sūcdar û gunahkar kerê. Ma çiyê xo destnêfinê, ma nêşenê barî berê înan kerê.

No payizo ki ma vernî di ro, do Konferansêdo namnetewî qandê pers û perskerdenda mîleta Kurdan Stockholm di viraziyo. Heta o wext çendna sūkandê Swêdî di jî ma do zey nê komîtedê Uppsala komîtey ronê.

Newera sewîyeyê do berz, raykerdenêda mezbûti û karkerdenê da hera esta û asena. Ki ma pîya karbikerê ma do bişê armancdê xo di nixteyê resê û serkewê..."

Sūkda Uppsala di 2000-an ser ra Kurdî estê.

Ronayeni û Kongredê nê Komîtî di, Komelê Kurdistanî ê Uppsala rolê do gird kaykerd û alikareya nê komîtî kerdî.

Serdarê Komelî Mûrat Guler jî bi nûnerê (aza) nê komîtî, kar û bardê nê Komîtî di cayê xo girot. Lazimo her Kurd çiq kewno ci milî ser bikero û xo

dûrî nêfîno.

Profesorê ziwandê Îranî Bo Utas'î, dûr û derg ziwandê Kurdî ser o vinderya. Bi zerî ra doza kerdî û bi raştey bol çî va, ravist û vist ma ver.

Bo Utas'î, bahsê heme dîyalektandê Kurdî kerd.

Dûr û derg Feqîyê Teyran û Ahmedê Xanî ser o vinderd û bahsê dîwanandê înan kerd. Bi raştey wardê ziwandî di xo rind resnabî, hadre kerd bî û bol çî zanayê. Heta heta mesela MÎT'ê Tirkan o ki lehça da Dimilî û Dimilîyan ser o kaykeno û vano Dimilî Kurdî niyê û mileti mîyan ra kenê villa zî zanayê û bahsê ê meselan jî kerd.

Labrê na persi sifte mi ci ra pers kerd. Min va to çirê bahsê dîyalekdê Dimilî nêkerd? Ey jî eya tepeya dûr û derg bahs kerd.

Bo Utas'î qisey wina domnay:

"Qandê ziwandê Kurdî, Kulturê Kurdî çiq ma dest ra bîro ma do bikerê. Hendik ma bişê ma do biparêzê û bi Kurdana pîya doza ci bikerê û Kurdan rê paştî bivijiyê."

Ey enbazeya xo, dosteya xo û Kurdan kişta ca girotena xo bi şeklêdo akerdeya nişan da û belikerd.

Komîteyê rayberdiştê nê Komîtî mîyan di nê partîyan û nê şaxsan ca girot.

Partîya Komînîsta çepi ra Jakob Johnsson, Partîya Center ra Maj Wangemar, Partîya Miletî ra Rajnar Berglîng, Sosyal Demokratî ra Tone Tîngsgård, Partîya Moderat ra Per Eriksson, partîya Kiho do jî nûnerê xo qandê komîtî birîşo.

Ronayena nê Komîtî kêfweşeyêda girdi vîstî zerî da ma Kurdan mîyan. ma posenê ki no Komîte karê da erciyayê û giran xo ver fino û paştîya mileti Kurdî bigîro. Lazimo ma Kurdî jî nê komîtî mîyan di cayê xo bigirê, alikareya nê komîtî bikerê û tewrdê kar û bardê nê komîtî bê.

C. H. Herrmanssonî wina va:

"Endamê ma bol tayniyê. Ma wazenê no Amor vêşî bo û ma jî bişê rihateya kar û barê xo rayfinê. Heta ewro çihar sey endamê ma estê. Qandê coy lazimo kes endam bo û barê komîti piya hewado xo milî ser û piya bero."

Tayn qandê menfeatdê xo şenê heme çî bikerê. Wexto ki mesela bena mesela Kurdî yan jî Kurdistanî, kes gamê ravey niyerzeno, çiyê nêveno û çiyê nêkeno.

Namedê Kurdey ser o yenê ronîştene xo gênê tepeya Kurd û Kurdistanî xo vîra kenê.

Qandê ma bindestan bol eyb o û bol şerm o ki komîteyêdo wina qandê Kurdan viraziyo, qandê Kurdan bigirweyo, qandê meselandê Kurdan xo bitewno. Qandê ma arêbiyê pêser û kongreyê xo bikerê û pêro hîris kurdî bîrê... Ma no eyb û şerm niyo?

Na amori qandê Kurdandê Uppsala bol û bol tayna.

Lazim bî en kemî 500-600 merdim biyameyê û nê komîti mîyan di cayê xo bigrotê û bigirweyayê. No teniya Uppsala di wina niyo heme cadê Swêdî di, yanê ca yo ki kurdî tey roşenê û estê wina yo.

Hezarana Kurdê welatperweriyê zîndanandi qandê mîleta xo, xoverdanê.

Qeç û qûlê înano jî veşan û teşan, ma yê jî kêf kenê.

Wa nê qiseyê mi zordê kesî nêşirê, ê ki zordê ci şinê wa bîrê qandê mîleta xo bigirweyê.

Nê qisan ezo hemini rê nêvana ê ki girweyênê beliyê û înan rê niyê.

Ma Kurdî 24 milyoni yê û hewna ma yê destan bin di rê û destan bindi nale-

nê.

Jewdê xerîbî rojê mi ra perskerd va şima çend milyoni yê? Wexto ki mi va ma 24 milyoni yê, fekê xo kerd pirê alû û tû kerd ridê mi û wina va:

"Şima 24 milyoni yê û hewna destan bindi rê û destan bin di nalenê, şima rê bol eyb o. Ez herfunda şima di ba şina xo erzana bahr."

Lazim o ma nê qisan goşare kerê û xo goşana kerê. Qandê welatê xo, qandê mîletê xo bigirweyê, destan û doşyan bidê pê û piya raykewê û piya nê barê xo hewadê û berê. Wina nê bo, qethînu bîla ma nêşenê serkewê. Veyndana welatperweran, niştimanperweran, partîzanan, dewij û sûkijan,, esnaf û Tucaran, Karker û memûran, Roşnabîran, zanayan, zengîn û fiqaran, axleran, begleran, ê ki qandê welatê xo, qandê şeref û hesiyetê xo û qandê welatê xo wazenê bigirweyê înan.

Bêrê ma pêro jew bê, jewveng vejê, qandê welatê xo û mîletê xo bigirweyê. Ya welatê xo, mîletê xo biraynê yan jî şîrê şehîdandê welatê xo hetî.

Kesê ki biwazê alikareya nê komîti bikerê, endamê nê komîti bê, nê komîti mîyan di ca bigîrê, kar bikerê û qandê mîleta xo, welatdê xo bigirweyê, wa bîrê eleqe Federasyondê Kurdana, komelan di Federasyonî û Kurdan, serdarandê nê Komîtana ronê. Ê uppsala şenê bîrê Komîtedê Karkerdê Komelada Kurdana ronê. Û şenê raşt bi raşt kontak nê komîti hetî jî ronê û eya piya qandê welatdê xo û mîleta xo bigirweyê. No jî qandê ma Kurdan karê no.

XEZAL

*Erê xezal xezalê
Xezal çay henî kenê
Ewro meste ma çî yemê
Haydê xezal piya şimê*

*Koyê welat to rê serbest o
So xezalam koftî sono so
Na welat mendo bindesto
Mezelê dost û birayê to îta de esto*

*Xezal simeno xoê (ava) Munzirî
Gonya şehîdê Kurdistanî yeno ra vîrî
Dêrsim hata bi Cizîrî
Welat day orte bi adîrî*

*Xezal qîreno dewê û koyê ra
Kirmanc urzenê (wurzenê) xo ser ra
Pêro piya pêro danê dismen ra
Tarix nusnanê dînya ra
Xezal qurban xezalê
Haydê xelam ma çî yemê*

Hemedê Mamekiz
1.4.1990

SEMÎNERI

Roja 26.05.1990, Me'alîm Malmîsanîjî Komelda Kurdistanî a Uppsala di semînerê dê.

Babetê semîneri serda 1919-an ra heta serda 1926'an, tarîxê Kurdan bî.

Malmîsanîjî semîner di bahsê tarîx, edebiyat û namdarandê ê wextî kerd.

Malmînasîjî dûr û derg, meselan û serehewedanan, kitabê ki o wext di çap biyê û ê ki nûsneyayê û çap nêbiyayan, letekerdenda Kurdistanî, zimlim û zordesteyda dişmanî, bêbexteyda Kemalîstan, lete kerdên da Kurdistanî di rolê Îngilîzan û rolê dişmenî ser o

vinderya.

Ma qandê na Semînerî Malmîsanîjî rê bol spas kenê ki nê çiyê erciyayey pêşkeşê ma kerdî û qandê ma xo hadre kerd û heta Uppsala ame.

Koya Berz, 26.05.1990

کوتایي

بيستنی نده غمدي قهري ناولي
جاينخانه يه ک

چند کريکاري کي مانديوي گداوي نيوانان بود...

ماوي نيوانان:

بييني نيگاي

کيولدي تاز گداوي پاشن قوتابخانه توار برونان بود

که بزه رده خدني به مبهدي شهرمي

شهرمي بهار

جواني توين

هيوي زباني

ده ترخاندنار دلمانده ..

ماوي نيوانان:

دراوسي يه ک بود

که له سهر شه ققام له سهر نيگمان

به زوره خدني به کي حورمه تباروه

سنلوي لي ده کردين

- سلام

... سلام ...

ماوي نيوانان:

ناپينا يه ک بود

که متداليک (چدنياي قوتابخانه له ژر هدنگل)

له جاده يه کي ده پهرانده وه ..

... تاه، هاورنک انما

ماوي نيوانان:

باشچه يه ک بود

هدلپروکا

گنتو گزيه ک بود

کوتايي بي هات

کوتايي .. بي .. هات ..

قهراد پيريال

لهي هاورنياني ده به دهرم

چاران نه گره، بويستايه پتانييم

ماوي رنگا بييني تنيا چندره ختيک، چوله گديه ک بود

به لام نيستا

نيوانان هيندي

به د به ختي و لاتي و وي حزن کا، له به کتر دوروه ..

ده بي چندد دوريا و تاسمانان يه کي کين

بژ نه وي بتوانين

که ميک له قاوي

نارچاري به کتر

بخونده ..

چاران نه گره بويستايه پتانييم

ماوي رنگا: سلمه مينده وي

به دهرم تنيا نيوانان يک

تدمنيک

پوليستيک

مدخترک بود

به لام نيستا

نيوانان هيندي

ناروگر دوروي و خدم حزن کا، له به کتر دوروه ..

ده بي چندد دوريا و تاسمانان نه وي کين

بژ نه وي بتوانين

به به کتر بلين

و نيوانان پاشن ..

لهي هاورنياني ده به دهرم و نارو بيم

چاران نه گره، بويستايه به کتر بييني

ماوي نيوانان:

تنيا ترسي

هدلگرتني به پانانامه ک، روژنامه کي نه يني بود

پاشماوهی شیعری «نامزیه لیم»

له کوئی کیلی دینته دهنگ وده لی: من هاوسه نگه رتان
بووم

به هیوای نامانجینکی بهرز له گهلتن بووم
تا دوا هه ناسه، دوا تنزکی خوینی خوم
بؤ گهل، بؤ نیشتمان ژبام
بؤ بهش خوراوه کان ژبام
له وی، به لی تنها له وی
بووکی رازاوهی ژبانم ره چاو ده کم
به دهشتی چوله کی دلم به چاو ده کم

رینچکه ی پینشیل نه کراوی تاریکه شهوان
تارمایی دارو بهرده کان
قاسپه قاسپی کهوی سدر لووتکه بهرزه کان
به فری نساری نه تواوهی چپای گووم بوو له نیو هه ورا
چنوری تازه پشکووتو له ژیر به فرا
هاژی چه می هه نساو له دامینی چپا
گولانی زهردو سووری نیو سهوزه گیا
هه نه وانن به دهشتی من
جی کامه رانی و گهشتی من

- نسانی ۱۹۹۰ -

*نهم شیعرانی له نیو دوو که وانن، له پارچه شیعرنکی «ع. پهن» بهر گه ورا

کورسی زمانی کوردی

به کیتی ماموستایان کورد له سوینده له خوئی دووه می
کورسی زمانی کوردی - کرمانجی خواروودا، بؤ
سوینده کان، به نا هه نگیکی به چورک له گهل به شدازی
کورسه که دار گزتا بیان به خوئی دووه می کورسه که هیتا،
به کیتی ماموستایان له خدمت کردنی زمان و نه ده بی
کوردی و کردنه وهی نهو شیوه کورسانه به ههردو شیوه
دیالکت، ناماده بی خوی به خوشحالیه وه ده رده بهریت،
نهمهش له باش پشوری هاوین آدووناره ده سین ده کاتره،
نه وهی ده یه وی له کورسی داها تودا به شدار بیت
ده توانی په یه تدی بهم ته له قزنه و نه ناماره ی خواره وه
بکات:

Tel. 202569
Greta Englund

و (نه بوون) ی بره ماوه، له بواری شیکردنوه و
لینکدانوهی پیشمی دهردی بی ناکامدا به شتینکی
زیاده ده دایه قه لیم. له مەر ئاقمانیشه وه حیکایه تینکی دیکه
هه ده: به روا هینان به ره چه له کی پایه داری مرژف به هزی
رینکه وت وجودی خویه وه، به زمار ریز ده کات. (واته ده رکی
گفتوگزی له سدر پینو ده دات) و نهمهش له سدره تاوه
ره تکرده وهی نیمکانی نازادی یه.

هاوشانی ره خنه گرتن له مهرانم و بیروا جیاوازه کان،
تینوریکدی دی، واته نه وهی پی ده لنین که سایه تی و
خود، ده رده که وی. تاکه کهس نه خاوه نی روجه
ونه ره چه له کینکی پایه داریشی هه ده. نه وان هه ره که بیان
پینکه اتوو به کی (سانکاران) له هیزه ماددی و
ده روونیه کان (Khandah \ Khandah)، که له
ساته وهو ختینکا تینک ده نالی و پاشان لیک ده ترازوی و
ده بیتنه پینکه اتوو به کی دی (۳۰).

نهم پینکه اتوو بهش، پینکه اتوو به کی بزینو جو له داره.
وه ک گری مومینکی داگیرساو که گوله کهی (*)
له روا له تتدا به کگرتوو نیه، که چی له هه مان کاتیشدا
واده رده که ویت یه که وسدر چاوه به کی گهر میه وه ده دست
ده سووتینیت و مالینکیش ناگرده دات. وه لی له هه ویندا
نهم گوله پایه دار نیه وه ره به کورژانه وهی چی له پاش جی
نامینیت. نهم هیزانه له ره وتی رویارنیک ده کهن،
رویارنیک هه همیشه له چون دایه و هه رویارنیک
دیکه شی تینکه ل بیت، دیسانه وه ده گزپی وه ره گیز
له شینوه یه کدا نایه ته پینش چاو.

(۳۰) - هزکاری نهمهش پینچ شتن: ره گزی
لاشه بی (rupa)، ره گزی هه ستکردن (Vedana)
ره گزی نیسبهت (Sanna)، ره گزی پینکه اتوو
رچی به کان (Samskara)، ره گزی ناگایی (Vinnana).
(*) له زمانی کوردیدا به گری موم و چرا ده گوتری گول
- وه رگیز -
پاشماوهی نهم وتاره له ژماره ی داها تودا به خوینده وه.

له کوئی هه زاران عاشقی به کامی دل نه گه یشتوو قر
کرابی

زنجیری دست به سدریه و ناکری جی پی پدسننی خواننی
بیری گش و مردانی ناراد بیت .

بودا مدهستی نه زمونی نازادان ناو دهنی بیداری و
به (جیهانه) که پیشیان ده بیژنی نیروانا. نه مدش ()
هروه که له پینشدا گوتراوه- ورگیز) له حالتی
مؤمنیکی کوژاوه ده چنت. رهنکه نرکتین و دروستترین
به رامبر (- معادل) ی نه و شده له بیری نیمه دا «
توانه وه» یا خود «توانه وه له هدق» دا بیت. نه مدش
له گهل جهمکی نه بون (- عده م) دا زور جیاوازه و هر
جوره پیناسه کردنیکی بدناچاری گومراکه ره و توانای
که یاندنی نیه.

سنوری نیروانا، دونیابه که که بودایی پدکان (شون)
یاتا) یان پینگوتوه. نه مدش به مانای عده م و بزشایی
وزه مینه ی گشتی (بون) به واته (هیچ) یکی داهینره و
هزی هاتنه کایه ی جیهانی پر شورو خرزشی نیمه یه.
شایانی گوتنه، نیروانا و شونیتا هردو وکیان هیما بز
ناکاری ندریتی (سلبی) ده که ن.

بهم پی یه ، ده کری بودایی یه ت وه ک زانستی دهر
تماشه بکری، هروه که چون پزشکی زانستی نه
خوشی و بیماریه. دهر، سدرچاوه ی دهرده، کزتابی
هاتن به دهر، رنگه ی دواپی هاتنی دهرده. نه مانه نه و
چوار بنه ما سدره کیده شیوازی بیری بودایی یان له
شیوه ی گولینکدا پشوواندوه.

بدلای مرزقه وه، دهر نه زمونیکی نامو نیه. نه وه ی
مرزق نایزانی نه وه یه که نه ک تنیا هر تاکه تاکه ی
مرزقه کان دهرده دارن، به لکو ته واری خهلکی جیهان و
گشت بو یه کی دیکه ش دهر دهران.

هر له م پرویشه وه بودایی یه تیری ره خنه گراندی
خزی له هموو نه و بیرو بروایانه گرت که بیرو که ی
تاکه که سیان پته وو پایه دار کرد بووو که له و دهمه دا
به هیزترینی نه و لایه نانه قوتابخانه کانی نژپانیشیادی
بون. نه مانه بروایان و ابوو، هر تاکینک پرچم وه بوی
(انعکاس) ره چه له کی داهینره، واته ناتمان له قوتابخانه ی
نژپانیشیادی مسله ی هره گرنگ ناسین و وروو
خستنی ناسنامه ی مرزقه کان بوو. ره مزی گموره ی نه مدش
له یه کیتی ناتمان و بره های خواهنندی گموره ی
هیندوکاندا، کورت ده کرایه وه. به لام بودای برواهینان به
بره های نه کرده مرجی رامانی خزی، له همان کاتیشدا
دژی نه وه ستایه وه، به لکو گفتو گزی له باره ی (بون)

نم شیوازه- نسلوب- ی بودایی به نه ندازه به ک بوو
یه کینکی وه ک (ناگار جوتا) که فیله سووفینکی مه زنی
سده ی دووه می زاینی بوو، هزی سدرکه وتنی خزی
له گفتو گز فیکریه کاند، به بی مدرامی خزی دایه
قه لم. کزششی نه وانه ش که ده یانه ویت بودایی یه ت
له چوارچینه ی نایینه کانی خزیاندا سدرقامگیر بکن، تا
رژژگاری نه مرز به ره مینکی نه بووه، واته هر له
نیستاوه پنیوسته نه وه بزاین شتینک به ناوی بودایی یه وه
نیه و نه ده بیباتی بودایشدا زاروا یه کی و امان چنگ:
ناکه ویت تا به مرام ورگیزین، بوداو بودایی یه کان،
قسه له دراماه ده که ن نه ک درامای بودایی. بهم پی
یه ش بیت، له به رامبر که سی هیندو و موسلمان و
مسیحی دا ناتوانین ناوی که سی بودایش به نین. هر
وه کو له م کزمدله سروده ی شه وه دهرده که و، بودا
به پی ی تینکستی نایینه کانی دی قسه له خاندای (.
له مده، له باره ی) به هشت و دوزخ و نه و بابه تانه وه
ده کات بی نه وه ی ریشه ی بیری خزی لی ون بیت.
ویرای نه وانه یه ش، به ناویانگترین گوftar که به ی بودا
حسین کراوه له تینکستی سان یوتانیکا یا دایه.
پیوانک که شتیه ک دروست ده کات بز نه وه ی له
روویاری هستی (- بون، الوجود) به ریتته وه. پاشان
بودا له پیره و وکاره کانی خزی ده پرس: « نیه
له باره ی نه م کابرایه وه چی ده بیژن؟ نایا دوا ی نه وه ی
که شتیه که به که نار ده گیه نی، نه و بچی پیدا به
کولیدا، گه روا یکرد، بزمان هدی به کابرایه کی
هزشمندی نار به رین؟»

پیره و کاران له پرسیف داگوتیان: « نه خیر ، پیوا ی
وا هزشمند نیه.» و بودا به رده و ام بوو: « مگه ر پیوا ی
هوشیار نه و که سه نیه که که شتیه که ی باوینته دهریا وه
له سدر رنگه ی خزی به رده و ام بی، بی نه وه ی بز دوا وه
ناور بداته وه؟ مگه ر دروستی له وه دانیه که هر هزکارینک،
مه به ستینکی هینایه دی ده بی و نل و به ره للاً کری؟»
.. پیره و کاره کانش بشتگیران لینکرد و رایان لی بوو.
پاشان بودا بهم جزوه ناخفت: «هر به و جزوه ش، کاتینک
گه یشتنه که ناری عافیت، پنیوسته که شتی نایین واز لی
به نیریت، چونکه مه به ست هاتوته دی.»

که واته نه و ورده له مرامانه یه ش که له نه نجامی
لینکدانه وه ی ره خنه یی دا دروست ده بن، له دوا قوناغدا
ده بیت توره لدرین. چونکه هر یه ک له وانه هله قدی

رنگای هدق

نووسینی: پره‌زا عدله‌وی

وه‌رگیزانی: رنبوار سیوه‌یلی

به‌شی س‌ی‌ی‌م

رنگی ناوند، نه‌و رنگ‌یه‌یه که ه‌دشت لقه بنه‌چه‌یی یه‌که‌ی لینه‌بیته‌وه . واته جیهان‌بینی دروست، بیرو نه‌ندیشه‌ی دروست، گوفتاری دروست، کرداری دروست، ژبانی دروست، ناگایی دروست، دیق‌ته‌تی دروست. نه‌مه‌یه رنگی ناوند، که بودا تی‌نی گه‌یشت و زانستی به‌ ده‌ست هینا، نه‌و زانسته‌ی که رنگی نارامی و ماریفه‌ت و روشنایی ونیروانایه .

« بنچینه‌ی ره‌س‌نی د‌رد نه‌مه‌یه: له‌دایک بوون د‌رده. پیری د‌رده. نه‌خوشی د‌رده. مهرگ د‌رده. خ‌م و خ‌فه‌ت و ره‌نج و بی‌نومیدی د‌ردن. نزکی له‌وی دل‌ نایه‌وی د‌رده. دوری له‌وی ح‌زی دل‌ د‌رده. ده‌ست نه‌گه‌یشتن به‌ خ‌وازراه‌کان د‌رده. به‌کورتیه‌که‌ی نه‌وی دل‌ پابه‌ندی بیت د‌رده.

« بنچینه‌ی ره‌س‌نی سه‌رچاوه‌ی د‌رد نه‌مه‌یه: ه‌ر تینوتی یه‌ که ده‌بیته‌ ه‌زی له‌دایک‌بوونیک‌ی دی. تینوتی یه‌ک هاوشان له‌گه‌ل ه‌له‌په کردنیک‌ی پر شه‌وت که‌لیزه‌و له‌وی ع‌ودالی له‌زه‌ته. تینوتی ب‌و له‌زه‌ته‌کانی دنیا، تینوتی ب‌و بوون و چوون. ب‌و مهرگ .. ناگای دروست و دیق‌ته‌تی دروست .. »

* * *

به‌شینیه‌که‌ی ساکار، جدوه‌ری بودایی له‌ ه‌وره‌بروسکه‌ ده‌کا. نه‌وانه‌ی له‌بودایی یه‌تدا ره‌دوی مه‌رامینکی تایبه‌تی که‌و توون له‌ نا‌کامدا له‌ کوزره‌ رنگه‌ خ‌ویان دیوه‌ته‌وه . بودا له‌سه‌ر شینوه‌ی زاناو ح‌کیمه‌کانی سه‌رده‌می خ‌وی، که‌وته شیک‌ردنه‌وه‌و لینک‌دانه‌وه‌ی بی‌ری نازادی چاخه‌که‌ی . له‌م رنگی یه‌ شه‌وه ه‌ولنی دا به‌چاونکی ره‌خنه‌ گرانه‌و به‌پینی له‌به‌ر چاو‌گرتنی مه‌رام و نامانجی بزوتنه‌وه‌ فیک‌ریه‌کانی نه‌و سه‌رده‌مه، تینینی یه‌کانی ناراسته‌ بکات و رنگی دروست پیشانی نه‌وانه‌ بدات که‌ ری‌ی چه‌وتیان گرت‌ته‌به‌ر .

بیره‌ینانه‌وه‌ی وه‌رگیز: خونته‌ری خ‌وشه‌ویست، له‌دوو به‌شی پ‌ابورودا، له‌ پروی زمانه‌وانیه‌وه، ناونیشانی نه‌م لیک‌ولینه‌وه‌یه ناسینرا. ه‌روه‌ها ده‌س‌تمشانی جدوه‌ری نه‌و ش‌وشه‌ مه‌زنه‌ کرا که‌نایینی بودایی له‌ می‌زوی نه‌و سای خ‌وره‌لانی دور به‌ری‌ی کرد. نه‌م به‌شه‌ی لیک‌ولینه‌وه‌که‌پش ب‌و لیدوان له‌ سه‌ر نایینی بودایی و پیک‌هاتوه‌ه، نه‌سه‌فی و فیک‌ریه‌کانی ته‌رخان کراوه .. پیوسته‌ نه‌وه‌ بلنم‌ گ‌ر گو‌فاری « به‌ریانگ » ناوا به‌سنگ‌فراوانیه‌وه‌ پیشوازی نه‌م پابه‌ته‌ی نه‌کردبا، نه‌وا ه‌رگیز به‌مج‌زه‌ی نیستا نه‌ده‌هاته‌ به‌ر چاوی تینوه‌ی به‌ری‌ی .

نایینی بودایی:

« بیستومه‌ نه‌و پایه‌ به‌رزه‌ روژنکبان له‌ باخی - ناسک-ی نیسیپاتاما-ی نزیک شاری بنارس مه‌نزلی گرتوه‌و به‌مج‌زه‌ له‌گه‌ل پینچ رنبواری « ع‌ودالی ح‌قیقه‌تدا » ده‌که‌ونته‌ گ‌و: نه‌ی رنبوارینه ، نه‌و که‌سه‌ی مه‌نزلی خ‌وی جی‌ هینشتبی له‌ دوو لاره‌ خ‌وی له‌ زیاده‌ پ‌ویی به‌اریزیت. نه‌م دوو لایه‌نه‌ کامه‌ن؟ دل‌به‌ستن به‌ خ‌وشی و له‌ زه‌ته‌کانی دنیا، که‌نمه‌ کارنکی ه‌له‌یه‌ و چ به‌هار سوودینکی نیه‌ و رنگی ع‌وامه‌. نه‌وی دیک‌ش خوو دانه‌ ریازه‌تی زوره، که‌ نه‌مه‌شیان کارنکی به‌ نازارو بینسووده .

« تتاگاتا -بودا-، خ‌وی له‌م دوو شه‌قاوه‌ پاراست، رنگی ناوندی گرت‌ه‌ به‌رو به‌زانست گه‌یشت. رنگی زانستیش، رنگی یه‌کسانی و نارامی و ماریفه‌ت و روشنایی یه‌. رنگی نیروانایه‌. رنگی ناوند‌چه‌یه‌؟

نامۆیه لی م

به هادین نوری

ئوهی ئهوسا عهدالی بووم و ده مه پهرست
ئوهی وئیل بووم له شوینی بهو کینوانه وه
ئستهش ههر ئهوه یاری من
نه گزراوه دل داری من
ههر ئالوودهی ئه و نازدارم
دیلی ئه و چاره خوماره م
ئستهش ههر وهک جاری جارانه خۆش دهوی
به ههچی تر کهوی دلی من نا سهروی

منی په شینویش وهک (په شینو)
ویستم وولاته دووره کهم
راپهکشمه نیو قوژنیکه ژووره کهم
به لام کاتی (که نامزی
وهک ره شهبا هه لده کات و پینه هشتی ئارام ده بری
که خه م وه کو قه له ره شکه
له بهر ده رگه ی ژووره که مدا

باله کانی ده کاته وه و له نگر ده گری (*)
دل م ده بیته پووشکه بهک
له گه رده لوولی پاییزا ده خولینته وه
ده رواو ده روا به ره و وولاتی دوو ده فری
سوئسکه ی دل م سرکه و قهت ده سته مۆ نه بوو
به م کووچه نه فره تیه ی ده ری
کۆرپه ی دایک مرده ی دل م
مه گه ر به و ووته شیرینه ی که و که ب پلاوینزینته وه:
گه ر نه لقه ی زیرینی قامکینکت بزر بوو
له بازارا، له جامخانه ی زه ره نگره ی
ئه لقه به کی دی ده سه ندری
گه ر کیژی جوانت لی تورا
کیژیکه دی له نیو دلنا جینگای ده گری
به لام نه گه ر خۆشه ویستی بزر به کری
که له بازارا ناپینری
به پوول و پاره ناکرری
گه ر خۆشه ویستی بزر بووت نیشتمان بهی
وولات و کهس و باوان بهی
بلیت هیچ مه ره مه ی هه بهی
که برینی ده روونتی بهی ساریژ کری؟
ده بهی چ بهی بۆ ئاواره و ده ره ده ری
به خه پالیش جهی نیشتمانی خۆگری؟

له کو ی یه که م جار گزی مه کم نرایه ده م
له کو ی قیزی گروگال بووم
له کو ی به سه ر به رزی ده لیم: من لیره خاوه نی میژووم
له کو ی ئینسک و پرووسکی باوک و باهیرم به جهی ماوه
له کو ی گوندی سووتینراوه
له کو ی ده سرازه و داری بێشکه ی ساوایه ک به جهی ما بهی
له کو ی خونی دایک و منالی پینکه وه رۆنرا بهی بۆل:

ده لێن گزیا وولاتیکه رازا وه به
رازه وه به به هه زار په ری بالا به رزی قۆ زه رد
به چاری شینی دلگیر تر له شینی ئاسمانی پاک
به شه مامه ی سدر سنگیکه سپی بهی گه رد
به هه زاران به زمی نایاب و ره نگینی شارستانه که ی
به جریوه ی مه لی نیو دارستانه که ی
به که ناری ده ریای پر له کاکۆل زین
به نازادی، به خۆشی و کامه رانی زین

گریان با رازا وهش بهی
با به هشتی ئه م نا وهش بهی
من ئالووده ی ئام، به هشتی من نیبه
سه رانگای گه شتی من نیبه
من به م به هه شته وه خه ونم نه بینیوه
تووره که ی تزی شووم بۆ ئیره نه دووریوه
ئه م به هه شته نامۆیه لیم، نامۆیه لیم
به هه شتی من ئیره نیبه و ناپینه جیم
بۆ دلی من مه گه ر قه فه زی زیرین بهی
یه ک به ندیخانه ی به رین بهی
نه پرچی زه رد، نه مه مکی خه نه چاوی شین
ئارام ناده ن به ده روونی کلپه گرتوی پر له ناخه م
ناگه نه نیو په ره ی دل م
سۆزی ناخه نه نیو ناخه م
ناچنه جهی نازه نینی به جهی ماووم
دل داری من ههر ها له وی
له کو ی نه گریجه ی خاوی رهش
برۆو برژانگ و چاوی رهش
بۆ یه که م جار دلی منیان هینایه جۆش!

من عاشقم
ئه و عاشقم ده ردی جودایی ده چیژی
فرمیسکی دووری ده ریژی
ئه و عاشقم که سۆزی دووری دل دارم
پتر سۆی ده خاته دلی به ریندارم
من مه م، زینی خۆم ده وی
بهی زین ئۆقره م نه بووه نابهی
ته نها به زین دل ده سه روی

ئوهی ئهوسا خۆشم ده ویست

له پیناوی ژبانی نازادی ، بز نیمه وهه موو مرؤقه کانی
 گه له کهمان بهخت کرد، تکاتان لی ده کم، له مودوا
 بلین پیاره شهیده که .. چونکه گیانی خزی کرده
 قوریانی، بزیه نهو شهیده و نامری، هه میشه له گدل
 ژبانی نیمه وگه له کهمان ده ژی..

-باشه دایکه بز تنیا نهه بالندهیه! پهرو باله کانی
 رهنگاو رهنگن!

- جگه ره گۆشه کانم، نه مهش چه شنیکه له بولبول، هه
 بزیهش ناری نراوه رهنگاله، هه وهک چۆن ،
 به کاکه سووری خۆمان ده لیبین سووره ..

(شنه) و (نازاد) و دایکیان، به دهه نهو قسانه وه
 بوون، لهو تاوه دا، تهقه تهقی ده رگای هه وشه ، وریای
 کرده وه، هه ره دوو منداله که پینکه وه، بز بهر ده رگا
 غاریان دا، هه رکه ده رگایان کرده وه، به کسه ره باوکیان و
 کاکه سوور، باوهشیان پیندا کردن .


(نازاد) و (شنه) تا درهنگی شهو ، له گدل خۆشی
 گه رانه وهی باوکیان، به دهه چاره دیری رهنگاله که خهویان

لی نه ده کهوت .

بز بهیانی که دایکیان خه بهری کرده وه، سهر
 له نوی پینکه وه، چونه سهر دانی رهنگاله که، دایکی
 نازاد، لاقه برینداره که ی کرده وه، سهره تا هه ره له سهر
 دهستان بهر له لای کرد، رهنگاله که به هه ندی له نگینه وه
 کهوته باله فرکی، دویای هه لفری به سهر لیواری ده رگای
 ژوره وه یان، وهک نه وهی سوپاسیان بکات، چند
 جارنیک باله کانی به یهک دادان ..

نینجا باوکی نازاد، هه ستایه سه ریپیان، ده رگای له
 رهنگاله که کرده وه، رهنگاله که بز خزی، کهوته فرین،
 به ره وه هاور یه کانی له شهقی بالی دا... منداله کانیش
 له خۆشیان کهوتنه هه لپه رین ..

* رته له لایه نه ره ربه ندی مندال نه ره ده لان سه عدلی.



رەنگالە

کاکەباس

چۆلەکەکان خۆش راها تیوون، بەدلتیایی چەپلەیان بۆ لێدەدان.. لەپەر چریکە یەکی باریک و سۆزای، سەرئەنجی راکیشان، هەردوک پینکەو، تەماشای بەرتارمەدی خانووەکیان کرد، دیتیان بالندە یەکی رەنگاو رەنگ، بەشەلە شەل، بەرەو ژووری مالهەکیان خۆی دەکوژی .. هەر دووکیان یەک برکی، غاریان دایە خواری، لە خوارووە راستەو خۆ، روو بەرووی دایکیان بونەو، کە بالندە شەلەکەدی، لەسەر لەپە دەستینکی راگرتبوو، بەوردی تەزی دەروانی، تک تک خۆن بە قاچینکی دا دەهاتە خوارووە ..

یەکیکیان بە دلتەنگی لە دایکی پرسی:

- ئای دایکە! چۆلەکە یەکی چەند جوانە! هەر پەرهی رەنگینکە! یەکەم جارە چۆلەکە یەکی لەم جۆرە ببینم، چۆن دلیان هات زامداری بکەن.

- رۆلەکانم ئەمە چۆلەکە نی، ناوی رەنگالە یە .. رەنگالە، وا دیارە قاچینکی لەرانیدووە شکاو، ئیستا چەوری دەکەم، دواپی بە پوشکە ی باریک: بۆی هەلنە بەستەمەو، تاکو ئەم شەو، پشوی دیتەو بەر، بەیانی بەرەللای دەکەینەو، تا بتوانی بۆ لای بێچووەکانی بفریتەو .

- دایکە خۆ ئەو شەو وەکو پیاوێ قاج شکاو کە نامری؟!

- دایکە مالی» (عنترا) و (فەرەج) نایەنە سەرمان؟! - نەخیر رۆلەکانم، مەترسن ئەو وەک مرۆف یاساغ نییە، بالندە یە و پەییوێدی بە جیھانی مرۆفەو نییە، ئەوانەش جیھانی خۆیان هەبە، تەنیا ئەو یە هەندێ مرۆفی لاسار، شەریان پێ دەفرۆشن.

- بەلێ! دایکە پیاوێ بریندار کراوە کەش، بە دەم هەنسک دانەو، ئەمەدی لەسەر لاپەرە کە نووسی، کە هەرگیز لە بیرم ناچیتەو ..

- ئیئە مرۆفمان خۆش دەوی، ولانە کە شمان خۆش دەوی، بۆ مرۆفایدتی و نازادی دەمرین، لە پیناوی ژبان و بەختەوێ مرۆف، گیانی خۆمان بەخت دەکەین، بەلام هەندێ مرۆف هەن، تەنیا ناویان مرۆفە، ئەوانە شەر بە هەموو شتێک دەفرۆشن، لەسەر خاک و لەناو مالی خۆمان، دەریبە دەرمان دەکەن، مالهەکانمان دەسوتینن، بۆیە ناچارین بە خۆنی خۆمان بەرانگاریان ببینەو ..

- ئای رۆلەکانم، تکاتان لێ دەکەم، ئەو پیاوێ شەهید بوو، لەخۆیەو نەمرد، بەلکو گیانی پاک،


ئەو کۆمەلە دار چنارە بەرزانی، کەوتیوونە کە ناری گەرە کەو، بە هۆی چریکە و جیوێ جیوی چۆلەکان، هەر لە ئاوازی بلوێری شوانینکی نە دیتراو دەچوو، مندالەکانی گەرە کە کە هەموویان پێ دار لاستیک بوون، تەنیا (عنترا) و (فەرەج) نەبێ، رۆژانە هەریبەکیان لە پە نا دارنیکەو سەنگەری راوێ چۆلەکیان دەگرت .

(عنترا) و (فەرەج) دوو مندالی شەپانی گەرە کە کە بوون، هەموو رۆژی چەندین بالندە ی رەنگاو رەنگیان راو دەکرد ..

(نازاد) و (شەنە) ش، خوشک و برا بوون، هەموو رۆژی بە دەم ئەو دیمەنەو، هەناسە یەکی ساردیان هەلنە کیشا، بەتایبەت (شەنە) دلی بەو بالندانە دەسوتا، کەبە برینداری و بال شکاوی دەکەوتنە چنگی (عنترا) و (فەرەج)، ئەوانیش دلی رەقانە، سەریان هەلنە کیشان، دەیان خستە جورکی بەر دەستیان، بەلام نازاد لە دلەو هەزی لەم بەزە بوو، کەچی هەم لەبەر ئەو ی، لە مالهەو رینگایان پێ نەدەدا، هەمیش بۆ ئەو ی (شەنە)ی خوشک و هاوێ ی، چۆلەکە و بولبولی زۆر خۆش دەویست، هیچ جۆرە دار لاستیکینکی نەبوو .

لەو گەرە کە هەز کە ئیوارە دادەهات، لە گشت سوچینکەو، چۆلەکە و بولبول و تینکرای بالندەکان، بەرەو هیلانەکانیان هەلنەفرین، دانەویلەو خۆراکیان بۆ بێچووەکانیان دەبردەو .. هەرکە شەویش دەستی پێ دەکرد، ئاواز و جریکە ی بالندەکان نەدەما، ئەو ناوێ تینکرا لەناو درێژایی شەو، دەکەوتە خەوینکی قۆلەو ..

رۆژنیکان دەمەو ئیوارە، کاتی ئەو هاتبوو، بالندەکان بەرەو هیلانەکانیان لەشەقە ی بال بەن، بەتاک تاک و جوتە لەسەر دارەکان دەنیشتنەو .. (نازاد) و (شەنە) لەسەر بانەو، بەم سەما کردنە ی



مندالاندا بده دست هیناوه ، چونکه نهوه ده بیت به هوی نهوهی که نهو مندالانده ده بن به موتیشیک بز نهوهی مندالانی تریش چاویان لی بکهن و ههروها خیزانه کانیش له ناو نهم دهره ده ریه دا زیاتر یه کتر ده ناسن و زیاتر به یه کتر دلشاد ده بن . هیوادارم که براده رانی فیدراسیون زور زیاتر له وهی که بز مندالانی کورد کردوویانه تاکو نیستا ههول بدن زیاتر خه باتی بز بکهن هیوادارم نهم قسانه ی من وه کو ره خه نیکی روخینه ر نهیته پیش چار له گه ل هیوای سهرکه وتتم له بز هریانگ و فیدراسیون . سوپاس .

بزهی خوین چاپکراوی نوی

کۆمه له شیعرنکه له نووسینی : هیرش .

بلاوکراوهی کتیبخانهی سارا - ستزکهلزم

نهوهی شایانی باس بیت، زوری بهی نهوشیعرانه

له شاخدا نووسراون. بزهی خوین له «سارا» وله

نادرنسی خواره وه ده دست ده که ون:


M.Kurapas

Mariboplan 12

824 00 Hudiksvall

هیرش

بزهی



ژانی بتهوقن

نووسینی: رۆمەن رۆلان.

وه رگیز له فارسیه وه: ناسری ره زازی

له بلاوکراوه کانی کتیبخانهی سارا -

ستزکهلزم

هنگومان نه وکتیبه که له نیکی

که وره پرده کاته له کتیبخانهی

هونه ری کوردی، که به داخه وه تاکو

نیستا به ده گه ن کتیبی وا کراوه ته

کوردی.



ناسری ره زازی

له فارسیه وه: ناسری ره زازی

* هەر دوو کتەن ئەندامان لە بەک یانەدا ؟
- سەحەر : بەلێ.

- سەیران : سەری راوەشاند بە واتە -
بەلێ -.

* هەفتەى چەند جارەن دەچنە مەشق
کردن ؟

- سەحەر : لە هەفتەى کەدا چوار جار و
هەر چارەیش چوار هەزار مەتر مەلە دەکەین.

- سەیران : منیش هەفتەى چوار جار
دەچم، بەلام هەزار و پینچ سەد مەتر مەلە
دەکەم .

* چەند جۆرە مەلە دەزانن ؟ لە کامیانان
زۆریاشن ؟

- سەحەر : پشتمە مەلە، باسکە مەلە،
سینە مەلە ، پەپۆلە مەلە و تەقربیا لە
هەموویانان وەکو بەک باشم .

- سەیران : هەمان جۆرە کانی سەحەرى
خۆشکەم.

* لەو یانەیدو یانەکانى تردا زۆر کەس
هەن کە ئەندامان و وەکو ئێوە هەموو جارێک

دین بۆ مەشق کردن .. بەلام کە کاتى
یانە کەتان دەکەوێتە پینشیرکى لە گەل

یانەکانى تردا، ئا لەو کاتەدا مامۆستا کەتان
چۆن هەلئان دەبۆزى بۆ ئەو پینشیرکى یە ؟

- سەحەر : لە هەر جارێکى مەشق کردن
دا، مامۆستا کەمان بە کاتۆمیرنکى تاپیەتى

کاتى مەلە کردنى هەر بەکینکمان دەپنویت و
لەلای خۆى تۆمارى دەکات .. چەند جارێک

ئەم کارە دووبارە دەکاتەو و تینبى
خۆیمان پى رادەگەنیت سەبارەت هەلگامانان.

ئیتیر کاتى کە بۆ هەلئۆاردنى پینشیرکى دەچین
ئەو بۆ خۆى هەلمان دەپۆزیت.

- سەیران : بە نینۆکەکانى یارى دەکرد ..
دیار بوو ئەویش هەمان وەلامى هەبوو ..

* کاتى کە دەچنە لێواری حەوزە کەو،
لە کاتى پینشیرکى دا هەست بەو دەکەن کە

دەبینەو ؟
- سەحەر : مەشکۆم لەوێ کە

دەبێهەمو، بەلام بێگومان بە نیازی پەردنەو
مەلە دەکەم.

- سەیران : هەمیشە هەست دەکەم کە
دەبێهەمو، تەنھا جارێک نەبیت کە لەناو

ئاو کەدا بووم، بێنیم زۆر لە دواوێ ئەوانى
ترەو هەموو ماوم ئیتیر بەکسەر باوکم و «

لاسى» م بێرکەو تەو وەللا خێرام کردەو و
هەموویانم پاشى خۆمدا، و ئەوجارەیان

خەلاتى - زىر - م وەرگرت ..

* بەکینتى لاوانى کورد لە سوێد، هەموو
سالىک پینشیرکى یەکى وەرزشى سازدە کات،

بۆچى هەولنى بەشدارى کردن ئاتەن ئەداو،
یاخود پارمەتى دانیان لە جى بەجى کردنى

کارە قانونیەکان .. ؟
- سەحەر : هیچ ناگادارنیکم لەو

بارەیدو نەبە ! کەس شتى وای
پى رانەگەیاندوین ، من دلشاد دەبم

بە پارمەتى دانیان و سەبارەت بە بەشدارى
پنم خۆشە لە «راکردن» دا بەشدارى بەکەم،

چونکە پینشیرکى بەشدارى پینشیرکى ی راکردنم
کردو لە ۳۰۰ و ۱۰۰۰ مەتریدا و لە

دەهەزار مەتردا خەلاتى دوو مینم وەرگرت .
- سەیران : من پنم خۆشە لە - فوت پال

- دا بەشدارى ئەو پینشیرکى وەرزشیەى
بەکینتى لاوانى کورد بێم .

* وەکو پڕۆژەى پاشە رۆژە دەکەن
بەنە چى ؟

- سەحەر : مامۆستای وەرزش، جا هەر
کام بەشى وەرزش بیت فەرق ناکات .

- سەیران : نازانم ..
* پینچگە لە وەرزش خولبای تەرتان چى ؟

- سەحەر : حەزم لە مۆسیقایە، بەلام
بەداخەو ناتوانم هیچ نامزینک بۆنم. و زۆرم

حەز لە دەنگى - فلوت - هەبە .
- سەیران : حەزم لە ماتماتیکە . < ئەى

باشە : چوار کەرەت چۆر دەکاتە چەند ؟ >
< سەیران سەرى داگرت چونکە دەرحال

نەیتوانى وەلام بەداتەو و چاوەرەى پرسىارى
ئا بەم جۆرەى نەدەکرد .. پاش چەند

چرکەنیک سەرى بلنډ کردو و بەشانا زى یەو
گوتى : دەکاتە شانزەدە >

* ناوى بەکەم - مە لەوانچى جیهان
چى وەخەلکى کوى یە ؟

- سەحەر : ناوى - ئانډش - و
خەلکى سوێدە .

- سەیران : من نەمەزانى ..
* دەنگى کام لە گۆزانى پێو کوردە کانت

پى خۆشە ؟
- سەحەر : ناسرى رەزازى .

- سەیران : ناسرى رەزازى و دادە
مەرزبە .

* ئەگەر فیدراسیۆن پان بەکینتى لاوان،
کۆرسینکى فینبۆونى - مەلە - بەکاتەو، تۆ

دەتوانى وەگومامۆستا بەک پارمەتى بەدەیت
؟

- سەحەر : بەلێ، بەخۆشیدو .

- سەیران : م .. م .. م .. نازانم ...
* لە ئێران دا مەلە تان دەکرد ؟

- سەحەر : نەخیر ..
- سەیران : من ئێرانم نە بینو .

* چەند خەلاتەن وەرگرتووە و بێرەتین لە
چى ؟

- سەحەر : لەمە لە وانى دا، دوو خەلاتم
وەرگرتووە، بەکینکمان « زىر » و ئەوى تریان

« نوقرە » یە . و لە راکردنیشدا دوو خەلاتم
وەرگرتووە کە هەر دووکیان « نوقرە » ن .

- سەیران : حەوت خەلاتم وەرگرتووە
کە هەمووى لە مە لەوانى دا بوون. چوار دانە

« زىر »، دوو دانە « برونز » و بەک دانە
« نوقرە » .

(لە پاشى ئەوى کە هیواى سەرکەوتن و
بەردەوامى لە سەرکەوتنمان بۆ هەردوو

ئەستیرە گەشەکەى کاک عدلى زەمانى
خواست و کۆتایى مان بەچاوپینکەوتنە کە هینا

. کاک عدلى باوکیان داوای کرد کە چەند
پینشیرکى بە فیدراسیۆن رابگەینن :

جاری پینش ئەوى قسەبەکەم، دەمەوى
سویاسى گەرمى - بەرمانگ - ی فیدراسیۆن

بەکەم کە با بەخیا ن بەمتدالاتى منى - کورد -
داو و ئەم چاوپینکەوتنە تان لە گەلیانە ساز

کرد ..
سەبارەت بە « سەیران » حەز دەکەم ئەم

روونکردنەو یە بەکەم کە چونکە حەوت
خەلاتى وەرگرتووە جا بۆیە بوو بە بەکینک لە

ئەستیرەکانى مەلە لە باشوور و ناوەندى
سوێد، جا لە مەلەى (پەپۆلە) - جۆرنیکە لە

مەلە، یە کە مینى ئەم جۆرە مەلە یە سوێدی یەو
بەبێست و سى چرکە ماوێ بیست و پینچ

مەترى بریو .. بەلام ئینستا کە سەیران ئەم
بیست و پینچ مەترە بە بەبێست و دوو چرکە

دەبریت . هەر چى مەسەلەى پینشیرکە کانی شە
.. من وای بۆ دەچم چونکە وام بینووە و

وايشم بیستۆتەو کە فیدراسیۆن لە بەر جى
بە جى کردنى کاروبارى - گەورەکان - و

چارە سەر کردنى کینشەى نینوانیان،
مەسەلەى - مندالان - ی لە بێرکردو، بۆ

نمونه : ئەگەر بێتووە لە ناھەنگى تەووزدا کە
تزیکی شەش هەزار کورد وەکو مینوان دین

بۆ تەماشای کردنى پڕۆگرامە کە ، چەند باش
دەبوو ئەگەر وەکو بەشینک لە پڕۆگرامى

ناھەنگە کە ، خەلات بەدراپە بەو مندالە
کوردانەى کە پەلە « یەکەم و دوووم و سى

یەم » یان لە بەشینک لە بە شەکانى چالاکى

دوو کچی کورد و میدالیای زیر

ناماده کردنی: هیواز هندی



له ژێر ئەم ناسمانە هەمیشە خەماوی
پەڕی ئەم ولاتە نامۆبێمان، سەڵەکانی
تەمەنی دەربە دەریمان، گوزەری تەنگە
